Di dîrokê da piranîya terîqetan bi taybet di erdnîgarîya Kurdan, Xorosan û Anatolyayê da hebûne. Lêkolîner derbareyê vê mijarê da wiha dibêjin: Rêvebirên “Ereban di serdema Emewîyan da dest bi ber bi cîhanê va beralibûnê kirine, bi tevger û rewiştên nijadperestîye tevgerîyane. Gelên ne “Ereb li hemberî rewiştên “Ereban ên nijadperestî û derveyî İslâmî, nerazîbûn nîşan dane û ber bi jîyana manevî va beralibûne. Ekolên tesewîfî, raman û nêrînên heterodoks ên tesewîfî, bi taybet di erdnîgarîya Kurdan û Xorosanê berbelav bûne. Her wiha mitesewif û sofiyên ku ji van her du herêman gihîştine ji bo ragihandina ramanên xwe yên tesewîfî çûne Anatolîya, Maweraunehîr û Bexdayê. Şêx û derwêşen ku ji van herêman rabûne hewl dane ku hemberî kirin û rewiştên ku aramî û hizûra gel ji holê radikin, aramî û hizûrê di nav civakê da peyda bikin. Di nav van ekolan da yên herî navdar Melamî û Qelenderî ne ku Melamî nemaze di nav sofiyên Tirkmenan da Qelenderî jî di nav sofiyên Kurdan da derketine, ku ev her du ekolên tesewîfî ekolên heterodoks in. Şêweya jîyana evdalên ku İslâmîyet belavê rojava û herêmên din kirine, li ser bingeha derwêşen Kurd sazbûye. Belam evdalên Kurd ji evdalên Tirkmenan ra jî rîberî kirine (Kerim, 2011: 270-277). Yek ji wan qelenderan Baba Tahir e ku ji helbest û agahîyen derbareyê wî dîyar dibe ku ew rahişîye ji civakê ra bibe awêne, rîberîya civakê bike û rîya wan ronî bike. Wî li hemberê dijwarîyan hêza tabkirinê nîşan daye. Ew ji bo bigihîye armanca xwe dest ji her tişî şûştiye, erdê ji xwe ra kiriye cî û nivîn, kevir jî ji xwe ra kiriye belgî û xwe serdanpê spartîye Xwedê. Yekem car di dîrokê da wek helbestvanek Baba Tahir ji xwe ra “qelender” gotiye û wî hal û jîyana qelenderîtya xwe di helbesta xwe da wiha anîye ziman:

Mû an rindûm ke namim bî qelender
Ne xan dîrum ne man dîrum ne lenger
Çû roz aye begerdem girdê koyet
Çû şew aye be xiştan wanehem ser

Ez ew rind im ku navê min qelender
Ne xan û malên min hene ne lenger

Dema dibe roj li dora mala te digerim
Dema dibe şev kevir datînim bin ser (Yıldırım, 2013: 136).

3. Qewmîyeta Baba Tahir

Di van salên dawî da her ku li ser Baba Tahir lêkolîn zêde bûn, ew bêtir hate nasîn û navdar bû. Dubeytîyên wî yên ku ji hêla hunerê va serkevtî ne û kev in, di qada edebiyatê da Baba Tahir derxistin pêş. Dubeytîyên wî yên resen, hê jî bi dest neketine. Dubeytîyên wî ji devê kesan û ji destnivîsan hatin berhevkirin û çapkirin. Niha di çapêن cuda yên dubeytîyan da tê dîtin ku heman dubeytî di çapêن cuda da ji alîyê bêjeyan va ji hev cihê ne. Dîyar dibe ku gelên Îranê li gorî ziman û zaravayê xwe dubeytîyan vegotine, herwiha her nivîskarek jî bi teşeya xwe ya edebî û bi çêja zimanê xwe dubeytîyên Baba Tahir nivîsiye. Bi vî awayî dubeytî ji resenê xwe dûr ketine. Ji ber ku resenê dubeytîyan ne li ber dest in, zimanê helbesta wî jî wek pirsgirêkek derdikeve pêş. Lewra zimanê helbesta wî li gorî dubeytîyên ku ji hêla ziman va guherîn derbaz kirine tê kifşkirin. Bi vê kifşkirina zimanê dubeytîyan, qewmîyeta Baba Tahir jî tê dîyarkirin ku ji ber ku resenê dubeytîyan ne li holê ne, ev rîbaz bi xwe ra şâşyek derdixe holê û rîbazeke ne rast e. Di encama lêkolînên li ser zimanê dubeytîyan da em dikarin bêjin Baba Tahir helbestên xwe ne bi zimanê serdest yê wê serdemê yê Îranê ango zimanê edebiyata Îranê ku ew zimanê Farisî ye, nivîsandiye, ew bi zimanê xwe yê zîkmakî dubeytîyên xwe nivîsiye û ev zimanê wî zimanê qewmê wî ye. Wê gavê qewmîyeta Baba Tahir were kifşkirin, zimanê helbesta wî ya resen jî dê dîyar be.

201

Heta sedsala 20'an ji alîye Farisan va Kurdbûna Baba Tahir hatiye pejirandin. Lê piştî vê sedsalê ev rews guherî. Di sedsala 21'an da hin kes derbareyê qewmîyeta Baba Tahir da angaştek anîne holê û dibêjin ku ew Faris e. Bi vê gotinê pirsa, neteweya Baba Tahir kîjan e? hate rojevê. Piştra, pirsa gelo divê Baba Tahir bi berhemên xwe di nav dîroka kîjan edebiyatê da cih bigire? dê were pirsîn. Helbet ji bo bersiva vê pirsê zimanê helbestên wî girîngîya xwe derdixe pêş. Lê ev xebeta me raste rast ne li ser zimanê helbestên wî ye. Ev angaşa ku Baba Tahir Faris e ji bo ku Kurdbûna Baba Tahir birîzîne, helbet hewcîyê belge û dîyardeyan e. Herwiha bi vê angaşte jî êdî ji Kurdbûna Baba Tahir tiştek tê xwestinê ku ew jî xwe ispat bike. Ji ber ku derbareyê wî agahî gelek kêm in, resenên berhemên wî tüne ne û ji alîyê hin lêkolînerên Kurdî va hêvî ji dîtina resenên berhemên wî hatine birîn, vê ispatkirinê dijwartir dike. Dikare were gotinê ku hewcîyê ispatê tune, jixwe ew berê berda Kurd e, ji alîyê piranîya gelê Îranê va wek Kurd hatîye zanîn, ev têra her tiştî ye. Lê ev gotin qada zanistê têr nake. Tê dîtin ku êdî ji herdu alîyan va jî hewcîyê ispatê derdikeve holê. Dema ku em vê angaşa ku ji alîyê hin Farisan va hatiye rojevê dînihîrin, dibînin ku li nav Farisan hemû kes vê angaşte nakin, gelek lêkolîner û

mamosteyên zanîngehêن Îranê dibêjin; em baş nizanin ew ji kîjan neteweyê ye, an jî hinek ji wan Kurdbûna Baba Tahir dipejirînin. Nivîskar û lêkolînerên ku li ser Baba Tahir xebîne yên mîna Perwîz Natîl Xanlerî, Mêhrdad Behar, Ebdulhuseynê Zerrînkûb, Perwîz Azkaii, Wehîd Destgirdî, Reşîd Yasmî zimanê dubeytîyên Baba Tahir wek Farisî û qewmîyeta Baba Tahir jî wek Faris nîshan nedane. Nivîskarêن Kurd û gelê Kurd yekpare dibêjin, ku bê guman Baba Tahir Kurd e, esl û resenê helbestêن wî Kurdi ye (Yavuzer, 2016). Dema ku em berê xwe didin lêkolînerên Tirkîyê yek ji wan Fuad Köprülü (1890-1966) ye ku Baba Tahir wek helbestvanekî ku bi lehçeya deverî nivîsandiye daye zanîn (Köprülü, 1980: 186). Lê wî dîyar nekiriye ku ev lehçe/zarava ya kîjan zimanî ye. Qismek lêkolînerên Tirkîyê yên ku behsa Baba Tahir kirine û yên ku helbestêن wî bi Tirkî va wergerandine, Baba Tahir wek Faris berhemêن wî jî wek berhemêن edebiyata Farisî nîshan dane. Bo mînak: Ahmet Faruk Çelik dibêje; helbestêن Baba Tahir wek neynûkeke birqok ya edebiyata Farisî ye (2015: 247). Lêkolînerên rojavayî yên ku bi awayekî zanistî û bêhinfirehî li ser Baba Tahir xebitîne yên mîna; Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elizabeth Curtis û Vladimir Minorsky Baba Tahir wek Faris yan jî zimanê berhemêن wî wek Farisî nîshan nedane. Ew zêdetir li ser zimanê berhemêن wî rawestiyane û zimanê helbestêن wî wek zimanê deverî ya devera Baba Tahir dane zanîn. Hinekîn ji wan têkilî zimanê berhemêن wî bi Kurdîyê va danîne, hinek gotine zimanê berhemêن wî Lûrî ye, hinek ji wan jî gotine zimanê dubeytîyan bi zimanê zaravayê rojavayê Îranê va têkil in (Yavuzer, 2016: 143-bnr). Li Îranê, di ferhenga Dêhxweda¹⁰ da hatiye nivîsandin ku zimanê Baba Tahir dişibe zimanê Lûrî (دەخدا، 1373: ذىل باباطاھر).

Lêkolîner, zimanê helbestêن wî yên ku ne resen in dişibîne Lûrî, lê ew yekrû ne Lûrî ne. Di Meceleya Armaxanê (مجله آرمغان) ya xebata Wehîd Destgirdî ya ku li ser Baba Tahir hatiye amadekirin da tê ziman ku niha jî di navbera Hemedan û Xoremebadê da zimanê deverî gelek zêde ne ku têkilîya zimanê helbestêن Baba Tahir bi hîc awayî bi yek ji wan zimanên deverî va nehatiye danîn ku dibe ku bi hemûyê wan zimanên deverî va tevlihev e (Destgirdî, 1928: 578).

Baba Tahir yek ji helbestvanê destpêka edebiyata nivîskî ya Îranê ye. Helbesta wî bi huner e û pêşketî ye. Hêjabûna hunera wî balê dikişîne li ser xwe. Ew bi berhemêن xwe aîdê kîjan edebiyata neteweyekê be, ew edebiyat xurtir û rengîntir dibe. Ji ber vê, qewmîyeta Baba Tahir bi pirsgirêk dibe. Dubeytîyê helbestêن Baba Tahir yên ku berdest in, yên çapêن nû ku ji alîyê Farisan va hatine kirin, ku resenê dubeytîyan jî li holê tune ne û hêj nehatine dîtin, piştgirî dide angaşa Farisibûna Baba Tahir. Wisa xuya dibe ku dubeytîyê wî yên ku bi awayekî devkî va hatine veguhastin bi awayekî sirûşti guherîn xwarine û yên ku hatine çapkîrin jî her cara ku dubeytî hatine çapkîrin ber bi zimanê Farisî va guherîn li ser dubeytîyan da qewimîne û di çapên dawîyê da dubeytî êdî nêzikî zimanê Farisiyê bûne. Ev nêzikbûn piştgirî dide angaşa ku Baba Tahir Faris e.

¹⁰ Dêhxweda: Navê ferhengeke girîng ya Farisiyê ye.

Lê divê neye ji bîr kirin ku zimanê helbestên Baba Tahir yên ku di pirtûka destnivîsî ya Bahaudînê Qumî ya ku di sedsala 15'an da hatiye nivîsîn, ji zimanê helbestên wî yên çapêن dawîyê cudatir e, lewra zimanê wan helbestan ji Farisîyê û ji çapêن dawîyê dûr in. Herwiha dema ku em dêna xwe didin dubeytîyênu ku berdest in, di nav dubeytîyan da komek peyv hene û di Farisîyê da tune ne, ku Faris ji wan peyvan fêm nakin, herwiha ew peyv peyvîn zarava û devokên Kurdî ne. Di dubeytîyan da komek peyv jî hene ku peyvîn hevpar ên zimanê Kurdî û Farisî ne. Ev herdu koma peyvan jî astengî ji bo angaşta ku zimanê dubeytîyê wî Farisî ne nexwe ew jî Faris e, derdidixin holê. Mijareke din li ser "nasnava Baba Tahir ya ku Lûr e yan jî "Lûristanî (Destgirdî, 1929: 577)" ye, rûpelekê ji bo vê niqaşîyê zêde dike. Vê carê ji bo qewmîyet û zimanê Baba Tahir, Lûr û Lûristan dibe mijareke girîng. Li Îranê bayeke nerm ya pişavtin/asîmîlasyonê li ser herêma Lor/Lûr û Lekan heye ku yên vê angaşte dînin ziman dibêjin Lûr ne Kurd in, ew şaxeke Farisan e. Xuyê vê angaşte dibêjin zimanê ku Baba Tahir di helbestê da pêk anîye heke Lûrî be, dibêjin Lûrî jî beşek an jî zaravayeke Farisîyê ye û bi vê helwestê, binê angaşta xwe dadigirin. Bi vê awayî, him Lûr him Baba Tahir dibin Faris.

Niha di cîhanê da di qada edebîyatê da bi piranî ya ku tê pejirandin ev e, ku nivîskarek yan jî helbestnûsek bi kîjan zimanî nivîsandibe ew dibe ji wê neteweyê. Lê ev rewş ji bo serdema klasîk hinek diguhere. Derbareyê Mewlana da ev nîqaşî di navbera Tirk û Farisan da heye ku her du alî jî Mewlana ji xwe û yet ji helbestvanekî ji edebîyata xwe dizanin. Lê rewşa Mewlana ne mîna ya Baba Tahir e ku zimanê berhemên Mewlana yekrû Farisî ye. Em wisa têdigihîjin ku hin lêkolîner kakil û qalikê berhemê ji hev qediqetînin. Hinêwan jî li gorî ruhê serdemê tevdigerin. Bo mînak Gürsel Aytaç wiha dibêje; di dîroka edebîyata me (Tirkî) da şopandina edebîyatêneteweyen cuda her tim heye. Edebîyata Tirkî ji ber pirneteweyîbûna dewlata Osmanî, derî ji zimanên din ra jî vekiriye. Bo mînak, wan berhemnivîsandina bi zimanê Farisî, ku di wê serdemê zimanekî xweşik û kurwate bû da tu arîşe nedîtine. İro, ev rîgeza ku dîyarkirina edebîyata neteweyî, bi zimanê berhemê va dîyar dibe, di rabirdûyê da bi awayekî cuda hatiye pêkanîn. Ji ber vê çîma ku Mewlana Mesnewîya xwe bi zimanê Farisî nivîsandiye, gelek zanyarên edebîyata rojavayî rahiştine ku Mewlana di nav edebîyata Farisî da nîşan bidin, ev jî dibe sedemên gelek şaşitîyan (2019: 33-34). Tê dîtin ku Aytaç di warê edebîyatê da serdema netewe-dewletê û ya împaratoriyê ji hev qediqetîne û rîgaza niha ya ku nivîskar bi kîjan zimanê nivîsandibe bi berhemên xwe dibe malê wê edebîyatê, ji bo serdema klasîkê napejirîne. Yanê ew, di serdema berîya netewe-dewletê da zimanê berhemê na, qewmîyeta nivîskar/helbestvan derdixe pêş. Wê gavê helbestnûsekî/ê berîya serdema netewe-dewletê bi zimanê berhemâ xwe na, bi aîdfyeta/nasnameya netewetîya xwe di nav edebîyata neteweya xwe da cih digire. Ev ramana Aytaç e ku rexne li rîgezekê dike. Nîqaşîya ku em derbareyê

qewmîyeta Baba Tahir dikin ew eslê xwe ji kîjan neteweyê ye û zimanê wî yê resen kîjan e. Zimanê berhemên wî yên destnivîsa kevn vê angaşta ku zimanê helbestêن Baba Tahir Farisî ye pûç dike ku zimanê wan helbestan ji yên çapêن nû cudatir in ku ew îspateke guherînxwarina dubeytîyêن wî ye. Helbestêن wî yên ku gihîşîne roja me, yên herî kevn di sedsala 15'an da ji aliyê Bahaudînê Qûmî va hatine nivîsîn ku (Bahaudînê Qûmî, Pirtûka Destnivîsî, Mevlana (Etnografya) Müzesi İhtisas Kütüphanesi, h. 848), ew du bend û heşt çarîn in. Divê were gotin ku Qûmîyê ku ew Faris e, wan dubeytîyan ji ku wergirtîye û li ser van helbestêن Baba Tahir li gorî çêja xwe ya edebî guherîn pêk anîye yan na, nayê zanîn. Dema ku em van helbestan diniherin, em dibînin ku ev helbest ji Farisîyê dur in, ji alîyê ziman va ji helbestêن wê serdemê yên ku bi Farisî hatine nivîsîn jî cudatir in, yanê zimanê wan helbestan ne Farisî ne. Zêdetir nêzikî zarava û devokêن rojavayê Îranê ne.

Nikitin (1885-1960) derbareyê edebîyata nivîskî da, di edebîyata klasîk ya Kurdi bi taybet helbesta lîrîk da, li Bakûr wek bingeh Elî Herîrî û li rojhilatê başûr jî Baba Tahir dibîne. Nikitin dîne ziman ku helbesta lîrîk ya Baba Tahir di hawîrdora başûrê rojhilata Kurdistanê di nav gelên wir bi awayekî berfireh berbelav bûye. Ev helbest li Îranê, ji alîyê zimanê modern ya Îranê bi temamî nehatîye helandin û mihandin. Helbestêن Baba Tahir ji alîyê herêmekî hê jî tê pejirandin, gelek nêzikî rîzîkîn axaftinên Kurdîyê ye û hinek taybetîyên diyalektêن Kurdîyê diparêzin (2013: 473-475). Chaliand, di pirtûka xwe ya “Helbesta Tirkî û Kurdî” da tîne ziman ku edebîyata kurdî ya klasîk di nav çanda İslâmî da xwedî cihekî girîng e û ji bo vê jî wek mînak Baba Tahir dide nîşan (Ji Chaliand neql: Gökpinar-Geliş, 2016: 59). Piştî van agahîyan, em berê xwe bidin hinek dîyarde û belgeyêن ku derbareyê qewmîyeta Baba Tahir in.

‘Elî Şerî’etî (1933-1977) di pirtûka xwe ya “Hubut der Kevir”da dibêje: “*Baba Tahirê Uryan ku ew yekî Kurd bû. Çû kete binê avê û serî ji binê avê derxist, bû arif. Arîfek him jî çi arîfek, di hundir da bi qasî cîhanan ronahî, bi qasê asoyan merîfet, zerya bi zarya zanîn, hestîyarî ji derûniya wî derbû û kelya*”(Shariati, 2009: 180). Bi vê gotina xwe ‘Elî Şerî’etî, Baba Tahir wekî arif, xwedî merîfet, ehlê nûr û ronahîyê û bi qasî zeryayan zana dibîne. Her wiha dîyar dike ku Baba Tahir ji rastîya hebûnê fêm kiriye û têgihîştiye. Ew, derbareyê qewmîyeta Baba Tahir da agahî dide û dibêje ev arîfê zana Kurd e.

Îbrahim Ehmed Şîwan secereya Baba Tahir wiha diajo: “Baba Tahir birayê Baba Yusif e. Baba Yusif bavê Baba ‘Elî ye. Baba ‘Elî jî bavê Şêx Îsa û Musayê Berzincî ye. Seyidîn Berzincî jî ji nevîyên Şêx Îsa ne û ew jî Kurdêñ sûnî ne” (2012: 23).

Gotina Baba Tahir ya ku “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” (Ez ketim xewê Kurd bum û sibehê hişyar bûm “Ereb im) li hawîrdora ku lê jîyaye gelek navdar e. Lê derbareyê vê gotinê da angaştek din heye ku ev gotin ya Ebû'l-Wefayê Kurd (1026-1107) e (Cuneydê Şîrazi, 1328: 510-516). Ji bo vê

angaştê wekî dîyarde û belge jî pêşgotina mesnewîya Mewlana nîşan dane. Lê divê were zanîn Mewlana di mesnewîya xwe da navê Ebû'l-Wefayê Kurd neanîye ziman. Mewlana (kd. 1273) di pêşgotina mesnewîya xwe da pesnê Hesen Husemeddin Çelebî dide û dibêje:

Hesenê kurê Muhammedê kurê Hesen, Beyazîdê wextê û Cuneydê demê, Siddîqê kurê Siddîqê kurê Siddîq e, Xwedê ji wî û ji wan xwes/razî be. Ew eslê xwe ji bajarê Urmîyeyê ye û ew ji nesla şêxê rêzdar ê xwedîyê gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen e. Xwedê rihê wî û yên xelefên wî pîroz bike. Ci serborîyek delal û bav û bapîr û ci delafîyeke xelef û kur! Xwedîyê nijada ku ji alîye tavê va qeftan (cil û berg) li wan hatiye kîrin e. Ji esleke ku tîrêjînsterkan li cem wan xuya nakin e (Mevlâna Celâleddin Rûmî, 2004: 36).

Bi vê gotinê Mewlana him pesnê Çelebî dide û him jî pesnê nesl û eslê wî dide. Hesen Husemeddin Çelebî Kurd e û ew li cem Mewlana mirovekî gelekî qenc e. Li gorî hin nivîskaran quesda Mewlana ya ku Çelebî ji nesla wî ye Ebû'l-Wefayê Kurd e. Lê di pêşgotina Mesnewîya xwe da Mewlana ne navê Ebû'l-Wefayê Kurd (1026-1107) û ne jî navê yekî din ji bo xwedîyê vê gotinê anîye ziman. Divê neyê ji bîr kîrin ku ew nivîskarê ku ji mesnewîyê derketiyê rê û gotiye gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” dibe ku ya Ebû'l-Wefa ye (Cuneydê Şîrazî, 1328: 510-516), dibe ku nizane gotin ji mêjva ne ji alîyê Îranîyan va tê zanîn ku ya Baba Tahir e (Şiwan, 2012: 23).

Pirtûka “Dîwanî Kamil Baba Tahir Hemedanî” ya ku ji neşriyata Meceleya Armaxanê (محله آرمغان) ye ku ew behsa Baba Tahir dike dibêje ew, ji bo xwendinê dikeve hewza qeşemgirtî û di sibehtirê nûrek ji ezmana tê dikeve devê wî û ew dibêje “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” (Baba Tahirê Hemedanî, 1932: ۴۷). Destgirdî di kovara Armaxanê da ku derbareyê Baba Tahir da agahî daye û dubeytîyên wî weşandiye, dibêje Heron Allen û Zukuskî vê gotina navborî wek gotina Baba Tahir dane nîşan (Destgirdî, 1929: 586).

205

Di pirtûka Cuneydê Şîrazî (kd. 801/1399?) ya bi navê Şeddu'l-'Izar (شَادِلَازَار فِي حَطَّ الْأَوْزَار عَنْ زُوار / Seddu'l-'Izar fî hattî'l-evzar 'an zuvvarfî'l-mezar / المزار ê da ku wî vê berhemâ xwe di sala hicrî şemsî 791 / mîladî 1389'an da qedandiye (Bilgin, 1993: 125), li ser gotina “Emseytu Kurdîyyen ve esbehtu “Erebîyyen” hatiye rawestan. Dema ku em pirtûkê dînihîrîn, em dibînin ku di pirtûkê da li ser gotin ya kê ye tê rawestan û navên kesenî mîna Îbn Yezdanyar, Ebu Ebdullahê Babûyî, Tacûlarifîn Ebû'l-Wefa û Baba Tahir derbaz dibin. Di pirtûkê da têkilîya Hesen Husemettin Çelebî bi hin kesan va tê danîn û li ser Kurdbûna Hesen Husemettin Çelebî û wan kesan tê rawestan. Di dawîyê da derbareyê Tirkbûn û Kurdbûna Çelebî da tê gotin ku Çelebî ji Ürmîyeyê (Wîrmîye) ye, ew di serdema Mewlana da li Konyayê jîyayeye, li wê serdemê li Konyayê her kes wî wekî Kurd zanîye, Mewlana jî wî wekî Kurd daye nişandan. Nivîskar dibêje, ji ber vê jî ew bi awayekî Eşkere Kurd e. Di pirtûka Şeddu'l-'Izar'ê da, Nivîskar gotina navborî wekî ya Baba Tahir jî nîşan dide, lê li ser

Kurdbûn an jî Kurdnebûna Baba Tahir ranaweste. Di vir da balkêşiyek derdikeve der ku wekî mînak nivîskar çira derbareyê Kurdbûn yan jî Tirkbûna Çelebî nîqaşî dike û dema ku mijar tê li ser Baba Tahir li ser qewmîyeta wî vê nîqaşîyê nave. Raterast têkilîya gotinê bi Baba Tahir va dadîne. Wisa tê dîtinê ku nivîskar di Kurdbûna Baba Tahir da tu guman nabîne ku li ser qewmîyeta wî ranaweste. Nivîskar dema ku li ser vê gotinê nîqaşî dike dikaribû bigota ji ber ku Baba Tahir ne Kurd e, ev gotin ne ya wî ye. Lê di encama nîqaşîya vê gotinê da nivîskar vê negotiye, nexwe dikare were gotin ku nivîskar bê guman Baba Tahir wekî Kurd dizane. Mewlanayê Romî di mesnewîya xwe da nîşan bi vê gotinê kiriye û bi şêweyeke biraz, şîroveya vê gotinê kiriye (Muînuddîn Îbnu'l Qasim Cuneydê Şîrazî, h. 1328: 510-516):

راز صبحنا عربیا بخوان

سرامسینا لکرديا بدان

(Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Gelenek, 2004: 428)

Raza ku min şevê wekî Kurd derbaz kir bizane.

Raza ku em wekî ‘Ereb derketine berbangê bixwîne.

(Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Yeni Şafak, 2004: 149).

206

Mewlana di Mesnewîya xwe da li ser gotina: “Ez ketim xewê Kurd bum û sibehê hişyar bûm “Ereb im” helbesta jor nivîsandiye. Ev gotin, di mesnewîya Mewlana da di nav rîzên helbestên wî da derbaz dibe ku em di nav wan rîzan da şîroveya bûyera Baba Tahir ya bi xwendakarê medreseyê û hewza qeşemgirtî bi ramanên tesewifî va dibînin. Mewlana derbareyê razê û ilma veşartî da agahî dide û bendêni li jor wiha didomîne: “Ew, ilma ku bêpirtûk, bêmamoste û bêhînker di dil da peyda dibe vedibêje. Ev ilma nepen a biraz a ku di Baba Tahir da peyda bûye, ku Mewlana dîyar kiriye, ilma pêxemberan e” (Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, Yeni Şafak, 2004: 148-149).

Derbareyê vê mijarê da Ansiklopediya Îslâmî wiha dibêje: Çawa derbareyê kerametên helbestvanê sofî ên mîna Attar, Celaledîn Rumî û Hafizê Şîrazî gotinên balkêş hene, bi heman awayî derbareyê jîyan û kerametên Baba Tahir da jî gelek gotinên balkêş hene. Li gorî gotinan, jî rojan rojekê Baba Tahir, jî feqîyên medreseya Hemedanê pirsa; “jî bo bidestxitina zanînê divê çi bê kirin” dipirse. Feqî henekên xwe bi wî dîkin û jî wî ra dibêjin, divê tu şeveke zivistanê di nav ava hewza qeşemgirtî da bimînî. Baba Tahir, şîreta wan pêk tîne û di nav ava qeşemgirtî da heta sibehê dimîne. Berbangê ronahîyek tê dikeve devê wî, qêrîn jê diçe û wiha dibêje: “Emseytu Kurdiyyen ve esbehuu ‘Erebîyyen” (Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm “Ereb’im). Bi vî awayî ew bi ronîya zanînê ronî dibe. Tê gotin ku jî wê rojê pê da êdî hemû rîyê zanînê li ber Baba Tahirê Uryan vedibin û pêdivîyê ziman an jî pêk tê. Li piştî vê bûyerê, ew dibe xwedîyê ilmeke bilind û bi xwendekarê medreseyê ra

axaftinêñ felsefî û tesewifî dike (Minorsky, 1997: 171). Em di vê buyera Baba Tahir da hîn dîbin ku ew xwedîyê ilmekî biraz e ku vê ilmê ji mamoste û pirtûkan negirtiye. Di vê bûyerê da xuya dibe ku ilm di Baba Tahir da bê vîna wî peyda bûye ku ev cure ilm, ilma biraz e. Dema ku em bûyerâ Baba Tahir û gotinêñ Mewlana yên helbesta wî didin berhev, dibînin ku di navbera bûyerâ Baba Tahir û gotinêñ Mewlana da têkilîyeke xurt heye ku helwest bûyer, gotina Baba Tahir û gotinêñ Mewlana hev û du temam dikin. Di vê têkilîyê da eşkere dibe ku helbesta Mewlana ya jor derbareyê gotina Baba Tahir û bûyerâ wî agahî dide. Mewlana him behsa ilma biraz dike û him ji Kurdbûna xwedîyê gotinê tîne ziman.

Di vê gotina, “Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm “Ereb’im” da tê dîtin ku di derûnîya Baba Tahir da guherînek qewimîye. Herwiha di pirtûka Ömer Uluçay ya “Ehl-i Hak Baba Tahir Uryan Zerdûşt” da tê gotin ku ji ber ku di serdema Baba Tahir da êrîşen “Ereban li ser erdê Kurdan va qewimîne û ji ber zext û zor û desthilatîya “Ereban ya li ser Kurd û erdê Kurdan pêk hatîye, Baba Tahir vê gotinê anîye ziman (Uluçay, 2010: bnr). Herwiha li ser vê gotinê, şîroveyeke wiha jî heye; dibe ku di vê gotinê da Kurdbûn mirovekî ji rêzê, nezan û cahil temsîl dike, “Erebbûn jî meşayiqê seyr û silûkê, qewmê bi edeb, fezîlet û zanebûn û misilmanîyê sembolize dike be (Cuneydê Şîrazi, 1328: 516). Tê dîtin ku gotina Baba Tahir ya navborî di van her du nêrînê da jî hatiye nirxandin. Lî em van herdû şîroveyan jî napejirînin. Lewra dema ku em Baba Tahir ji berhemên wî yên helbest û Kelîmatu”l Qisar ya ji gotin û aforîzmên tesewifî nasdikin, ji fîkr û ramana wî, felsefeya hebûna wî, eşqa wî ya Xwedayî û nirxnedayîna wî ya mal û milken cîhanî têdigihîjin, Baba Tahir ne ew kes e ku ji ber êrîşen tirsnak yên ‘Ereban guherîna xwe ya ji Kurdi bi ‘Erebî bîne ziman, herwiha ew ne ew kes e ku navê qewmî Kurdan bi cahilî û nezanîyê teşbhî û sembolîze bike. Em li ser wê bawerîyê ne ku guherîna ku Baba Tahir di gotina xwe da anîye ziman, guherîneke têgîhiştinî ye û ev guherîn di hiş û derûnîya wî da qewimîye. Heron Allen ew kes e di mîjûya 1900’an da li ser Baba Tahir lêkolîn kiriye û ew tîne ziman ku “Emseytu Kurdiyyen ve esbehtu “Erebîyyen” li bajarê Hemedanê wekî gotina Baba Tahir bi nav û deng e (Allen-Brenton, 1902: 16-20). Xêncî van, lêkolîner Jûkûskî dibêje ku min li bajarê Tehranê bihîstiye ku ev gotin ya Baba Tahir e (Şiwan, 2012: 24). Tê dîtin ku Ansîklopedîya Îslâmê û lêkolînerên ku me bi çavkanîyên wan nîşan dane têkilîya vê gotina navborî bi Baba Tahir dadînin yan jî wek ya Baba Tahir didin nîşandan û bi vê nîşandanê qewmîyeta wî jî dîyar dikin.

Me’rûf Xeznedar dibêje: Em dikarin Baba Tahir heta cihekî wekî Goran hesab bikin. Her ci qas zaravayê wî yê devera Hemedanê be jî ew Goranî dizane û heta niha dergevanê gora wî bi zaravayê Goranî diaxivin (2004: 28). Izady dîyar dike ku Baba Tahir helbestvanê xwezayê ye û xwedîyê zimanê Lekî/Goranî ye. Ji ber ku Baba Tahir di nav xwezayê de jiyaye û hakimê zimanê Lekî/Goranî û

Farisîyê ye, ji bo mirovên her du neteweyan (Kurd û Faris) xwediyyê nirxekî bilind e. Kêşa taybet ya helbestên wî ji kevneşopîya helbesta Kurda ya berîya Îslamê ya ku di başûr û navîna Kurdistanê belav bû da tê. Îlahiyêن pîroz ên pirtûka Cîlve ya Şêx Adî ku ew rîberê Êzdiyan e, bi Şêweyê helbestên Baba Tahir hatine nivîsîn (Izady, 2011: 311). Zaravayê Goranî zimanê helbestên irfanî û mezhebî yêndi Kurdan e. Di heman demê da ev zarava di erdnîgarîya Kurdan da bûye zimanê wêjeyê. Helbestvan û arifîn Kurdan bi zaravayê Goranî berhemên xwe nivîsandine. Helbestvanên mîna; Sha Xoşîn, Baba Bozorg, Fatime Lore, Molla Perîşan, Xan Elmas, Torke Mîr ku ew di herêma Lekan da jîyane, Xolam Rêza Erkevazî, Şake, Xan Mensûr, Seyyêd Yeqûbê Mahîdeştî û Seyyêd Salêhê Mahîdeştî ku ew jî bi zaravayê Kelhorî û Feylî axivîne, bi zaravayê Goranî helbest nivîsandine. Têkilîya Baba Tahir jî bi devok û zaravayê Kurdî yêndi din ra heye ku ew di dubeytîyeke xwe da dibêje ez Lek im. Di dubeytîyê Baba Tahir da peyvîn ku di Kurdîya Goranî û Lekî da tên bikaranîn hene (Abbarîkî, h. 1392: 29).

Baba Tahir di helbesteke xwe da xwe wekî “Lek” dide nasîn ku Lek jî ji hozake / êleke Kurdan in. Baba Tahir berîya Hemedanê, heyamek li Girînê jîyaye ku niha zêdetirîn mirovên Girînê bi zaravayê Lekî diaxîfin (Abbarîkî, h. 1392: 30). Baba Tahir wiha dibêje:

208

Mu derwêş im Lek im îcaz dîrim
Mu dosê çu Xoşîn hewraz dîrim
Mu maşûqê bi namî Fatime Lor
Sînew ber qametê pir naz dîrim (Şiwan, 2012: 28).

“EZ derwêş im, Lek im, xwedî îcaz im
Dostê çu Xoşîn, xwedîyê razê hevpar im
EZ maşûqê ya bi navê Fatime Lor
Xwedîyê sîneya ber qameta pir naz im”

Baba Tahir di dubeytîyeke xwe da xwe wekî niştecihê çiyayê Girînê dide nîşan:

مە طاهر ساکن پاى گرینم مە درویش مسلک و آگر درینم

(Abbarîkî, h. 1392: 25)

“EZ Tahir im niştecihê Girîn im
Karê min derwêşî û hundir agirîn im”

Girîn (گرین), navê çiyayê Nûrabadê yê Loristanê ye. Li gorî vê helbestê Baba Tahir li wir jîyaye. Li gorî ravekirina Hemzê Êsfehanî û Şîrvîyê Bin Şehirdar, ev

her du cih jî (Girîn û Elwend) herêmên zimanê Pehlewî ne (Abbarîkî, h. 1392: 25), ku Çiyayê Elwend li Hemedanê ye û xelwetgeha Baba Tahir e. Dema ku em nivîsên lêkolînerên Lek yên derbareyê Baba Tahir dinihîrin têdigihîjin ku Baba Tahir ji herêma Lekan, wekî Lek û zaravayê wî jî wekî Lekî dipejirînin û helbestên wî jî bi Lekî û Lûrî tevlihev dibinîn. Di pirtûka “Salnamê Bihar” ya ‘Elî Muhemmed Sakî da hatiye nivîsandin ku “ji ber ku Baba Tahir li Hemedanê jîyaye divê em wî wekî Hemedanî bizanin.” Di serdema Baba Tahir da Hemedan ji hewzeya Hekeranî (على شكر / حكرانی) bû ku ev hewze ji Kirmanşah, nivê Kurdistan û Lûristanê pêk dihat. Zaravayê Lekî bi tevî Lûrî ji zaravayê rojavayê Îranê ne û zaravayê Kurdfîne. Di çavkanîyeke Lekan da tê gotin ku di destnivîseke ku ji destê Îمامخان Rostemî va tê destxistin ku ew ji herêma Celalevend ya ostanê Kirmanşahê bû û mezinê Ehlê Heq (Yarsan) ê wê herêmê bû, di wê destnivîsê da nameyek derbareyê Baba Tahir hebû û di wir da agahîyeke wiha hebû: Baba Tahir ji derwêşen Ehlê Heq yê herêma Delfan (دلفان) ya Lûristanê ye. Di gundê Zengîvend (زنگیوند) ya Delfana Nurabadê (نورآباد دلفان) jîyaye. Bi navê Mehmûd kurekî wî hebûye û ew xwedî mektebxane bûye û bi tedrîsê ra mijûl bûye. Di havînan gûndê navborî a damenê çiyayê Girînê û zivistana jî li Xoramabadê bûye ku niha navê taxekî Xoramabadê Baba Tahir e û tirbeke wî jî li wir e. Di heman deme da li Xoramabadê xaneqaheke wî hebûye (<https://lakistan.persianblog.ir>). Di helbesteke wî da navê Delfan (دلفان) wiha derbas dibe:

209

ز شهر بیو فایان میگریزم

مه ازدامان هبران میگریزم

بزون تا خاک دلفان میگریزم

ازای ماتم سرا با پای عربان

(<https://lakistan.persianblog.ir>).

Erdnîgarîya ku Kurdên Lek lê rûdinin û ji wir ra Lekîstan hatiye gotin, di nav erdnîgarîya dewleta Kurd Kasît (bz. 1680-1160) da bû (Ji Minorsky Neql: Gökpınar-Geliş, 2016: 22). Axa Lekîstanê di heman demê da di dilê dewlata Kurd ya Med/Mad (bz. 727-549) an da bû (Izady, 2013: 32). Herwiha Lekîstan û hawîrdora wê Kermanşah, Dînawar û Hemadan ji alîyê Selçûkîyan va wek Kurdistan hatiye navandin (Ji Zekî û Le Strange neql: Gökpınar-Geliş, 2016: 23). Li Lekîstanê zêdetir zaravayê ku wek binbeşike Kurdiya Goranîyê ye tê axaftin ku ev herêm navenda bawerîya Yarsan e. Bi rêjeyeke kêm Kurdên kelhor li vir hene. Ev herêm di bin bayê nerm yê asîmîlasyona Farisî, Lûrîyê da ye (Ji Chevalier neql: Gökpınar-Geliş, 2016: 23).

Baba Tahir di nav pirtûkên derbareyê ewlîya û şêxên wê deme da cihê xwe negirtibû ku sedemê vê yekê jî ji alîye Zerînkûb va hatiye dîyarkirin ku ji cudabûna koma wî ye, lê di pirtûka ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî (kd. 1131) ya bi navê “Nameyan” (h. 520-525) da navê wî wekî Tahir derbaz dibe lê bernava wî ya Baba derbaz nabe ku di pirtûkê da Bereke û Fethe wekî murîdên Tahir hatine nasandin ku bi tevî amaje û dîyardeyan xuya dibe ku ev Tahirê ku tê behs kirin, Baba Tahir e (Zerrînkûb, h. 1376: 192-193). Murîdên wî Bereke û Fethe li ser bawerîya Yarsan in. Yarsan jî bawerîyeke Kurdan e. Baba Tahir di bawerîya Yarsan da ferîşteyeye ku heyama wî ya Şa Xoşîn heman e û ev heyam di bawerîya Yarsan da wiha ye: Heyama Xoşîn, Baba Bozorg, Baba Faqih, B. Hesen, **Baba Tahir**. Di Helbestêن Baba Tahir da navê Şa Xoşîn derbaz dibe ku Baba Tahir ji bo wî ra girîngî, nirx û hezkirineke berz nişan dide, di serpêhatî û helbestêن Şa Xoşîn û Yarsanan da navê Baba Tahir bi awayekî rîzdar derbaz dibe. Di vê bawerîyê da Baba Tahir ferîşteyekî Yarsan e û puxteya Xwedê di wî da tecelî kiriye. Di helbesteke pêgirtiyêن Yarsan yê bi navê Farix da Behsa Baba Tahir û Elî Qelender hatiye kirin. Wî di helbesteke xwe da navê ‘Elî Qelender û Tahir Qelender anîye ziman ku her dû mezinê bawerîya Yarsan in. Her wiha di helbestê de tê dîtin ku ji alîyê manewî va rihê Baba Tahir û ‘Elî Qelender heman in, yanê yek in. Ev mezinê Yarsanê yê bi navê ‘Elî Qelender behsa Şa Xoşîn dike û dibêje ku Şa Xoşîn bi nehsed kesî ve çûye Hemedanê serdana Baba Tahir. Li ser vê mîvandarîya Şa Xoşîn bi çûyîna wî ya bi Hemedanê, bi mîvandarîya wî ya ‘Elî Qelender ev helbest hatiye nivîsîn: (Xeznedar, 2001:188).

210

Şam bî ve mîhman, şam bî ve mîhman
 Alî nan Alî şam bî ve mîhman
 Çenî nohsed baş qelenderan
 Baba Tahir bîm, mîrdî Hemedan (Xeznedar, 2001:189).

“Şa bûye mîvan, Şa bûye mîvan
 Ez im ku mirovê mezin Şa bûye mîvan
 Nehsed kes ji qelenderan bûne mîvan
 Ez Baba Tahir im xelkê Hemedan”

Piştî mirina Baba Tahir (1010), Selçûkî radihêjin ku li ser erdnîgarîya Îranê bibin desthilat. Rojhilata Îranê bi dest dixin ber bi navîn û rojavayê Îranê ber alî dîbin. Çav dikûtin bajarêن kurdan ku yek ji wan bajaran Hemedan e. Di wê serdemê da Kurd li Hemedanê xurt bûn û esas şenîyê Hemedanê Kurd in. Îbn Fadlullah el-Ömeri û dîrokñûsên din, Hemedanê wek navendeke girîng ya Kurdan dinavînin û dibêjin Hemedan (Ekbatana) navenda dewleta Kurdan ya Medyayê bûye¹¹ (Ji Kazvînî, el-Ömeri, Diagu, Doski neql: Demircan-Akbaş,

¹¹ Ev agahî ji alîyê edîtorê pirtûkê Mehmet Akbaş va, ji Fevziye Yûnus Fettah, ji zimanê ‘Erebî bi tirkî va hatiye wergerandin.

2015: 132). Sultan Sencerê (1118-1157) Selçûkî navê Kurdistanê li cî warê Kurdan dike, êdî Hemedana ku Baba Tahir dibêje ez xelkê wir im, ji herêma ku wek Lûristan dihate navandin, di serdema Sûltan Sencer dibe yek ji navendeke eyaleta Kurdistanê (Blau, 2012: 9). Navenda vê eyaletê jî kela Bahar e ku ev kel dikeve bakûrê rojhilata Hemedanê (Nikitin, 2013: 56).

Xeznedar tîne ziman ku li ser hevdîtina Baba Tahir û Şa Xoşen lêkolînek ji alîyê lêkolerê Rûs ê bi navê V. Îvanov hatiye kirin. Di wê lêkilînê da axaftinek di navbera Baba Tahir, Şa Xoşen û Fatmelere da heye. Bi vê axaftina xweşik mirov dihele. Bi taybet ev jin xwediyê baweriyeke pak û pîroz e û li gel Baba Tahir e (Xeznedar, 2001: 189). Navê Fateme Lor di helbesteke Baba Tahir da wekî “Mu maşûqê bi namî Fatime Lor” derbaz dibe ku Fateme herwekî ku tê zanîn Kurd e û xwedî helbestên zaravayê Goranî ne ku me li jor dabû zanîn. Di heman demê da helbestên Baba Tahir di kêlekên rûpelên pirtûka Yarsan a Serancamê da nivîsar in (Zerrînkûb, h. 1376: 194). Tê dîtin ku têkilîyên Baba Tahir bi Lekan ra heye herwiha têkilîyên wî bi Yarsanan ra jî xurt in ku wisa dîyar e ku Baba Tahir bi wan ra bi heman zimanê va axivîye ku ew ziman, zimanê qedîm û kevnar yê rojhilata navîn yê Mezopotamya û Îranê ye.

Zimanê Kurdî zimanekî dewlemend e, xwedîyê zarava û devokan e. Abbarîkî tîne ziman ku, “Reşîd Yasmî zimanê Kurdî bi çar zaravayan va dabeş kiriye: Goranî, Kurmancî, Lûrî û Kelhorî. Moradê Üreng jî wekî Soranî, Hewramî, Badînanî, Lûrî û Bextîyarî dabeş kiriye” (Abbarîkî, h. 1392: 28). Lûr, wekî civakeke Kurd ji Lûlû, Kaşî û Gutîyan pêk hatine. Lûr, navê xwe ji navê herêmeke newala Lûr girtine. Newala Lûr li gundê Kurd û li bajarê Mîyanrûdê ye (Yıldırım, 2013). Tewfiq Wehbî di sala 1951'an da nexşeya dabeşkirina dîyalektên zimanê Kurdî weşandiye ku ev nexşeya zimanê kurdî hemû herêmên Kurdan dihundirîne. Wi zaravayên Kurdî wiha dabeş kiriye: Kurmancî, Lorî, Goranî, Zazakî. Lûrî/Lorî jî wiha dabeş kiriye: Bextîyarî, Lekî, Feylî, Kelhorî, Mamesanî (Qanadê Kurdê, 2013: 25).

211

Bernava Baba Tahir ya “lûr” ku ev carinan jî wek “lûristanî” tê gotin jî derbarêyê qewmîyeta wî da nîşaneyek din e. Xeznedar tîne ziman; rojhilatnasê bi navê Mînorsky anîye ziman ku, Baba Tahir ji alîyê Lûrî va Kurd e (2001: 191). Herçiqas Lek, Baba Tahir wekî Lek dizanîn, Lûr jî wî wekî Lûr û zaravayê wî jî wekî Lûrî dipejirînin. Baba Tahir ji alîye giştîyê lêkolîneran va him ji ber bernava wî ya Lûrî, him ji ber zimanê helbestên wî yên nêzikî Lûrî û him jî herêma ku lê jîyaye Hemedan û Lûristan in, wî wekî Lûr dipejirînin. Di heman demê da Lekî hin caran wekî zaravayê Lûrî hin caran jî wekî zaravayê Goranî hatiye dabeşkirin. Dîsa jî em dikarin bêjin ku Lûrbûna wî ji ber jîyana wî ya Hemedanê tê û ji alîyê kesên din va ji wî ra Baba Tahirê Lûrî hatiye gotin, lê wî Lekbûna xwe di dubeytîyeke xwe da bixwe anîye ziman. Herwekî tê zanîn di Kurdbûna Lekan da tu arîse tune lê Sağniç dibêje; Kurdbûna Lûrîyan heta

dawîya çarîka yekem a sedsala bîstan ajotiye. Heta sedsala bîstan hemû Farisan kurdbûna Lûrîyan pejirandine. Di vê sedsala me da, ji bo neyê gotin ku wêjeya Îranê ya pêşîn ji alîyê yekî Kurd va (ku Baba Tahir e) hatiye nivîsandin; besêk ji Farisan înkara kurdbûna Lûrîyan dikin. Lê belê Lûr Kurd in û berî navê Kurdistanê navê erdê wan hebû û ew Lûristan bû (Sağrıç, 2002: 69). Di pirtûkên girîng yên dîrokî û yên serdemên cuda da derbareyê Lûran agahî wiha ne:

Erdnîgarnas û geryarê Îslamî, Îbn Hawkal ku ew berîya sala 320/932'an hatiye dinê (Şeşen, 1999: 34-35) dîne ziman ku "el-Lûr cihekî xwedî axake bi bereket e û li vê bajarê hewaya çiyayî bi bandor e. Ev der berê girêdayê Hûzîstanê bû û niha bi Cîbalê va hatiye girêdan. Li vir Kurd zêdetir in. Îbn Hawkal behsa erdnîgarîya cîbalê dike û dibêje ev der bi taybet başûrê Kurdistanê û rojavayê Îranê digire di nav xwe, herwiha ev bajar bi Kurdêñ Hezbanîye, Larîye, Humeydîye, Şehrezûr û Suhreverd va binecîh in (Ji Îbn Hawkal neql: Çetin, 2013: 25-26).

Yâkût el-Hamevî (575/1179-626/1229) dine ziman, ku Lûr eşîreke Kurdan e ku di navbera Esbehan û Huzîstanê li çiyayan dijîn. Ev herêm bi wan va tê zanîn. Ji vê herêmê ra el-Lûrr an jî Lûristan tê gotin (Ji Yâkût neql: Çetin, 2013: 25).

Ebu'l-Fîda (701/1301-774/1373) derbareyê Huzîstanê wek mijareke girîng cih dide Lûr û çiyayê Lûristanê, ew dine ziman ku li çiyayê Lûrîstanê civakêñ mezin yên Kurdan dijîn ku hukûmdarê Lûran ji nav wan yên bijarte ne (Ji Ebu'l-Fîda neql: Çetin, 2013: 37).

Şerefxanê Bedlîsî (kd. 1603) di pirtûka xwe ya "Şerefname"yê da êl û eşîrîn Kurdan ên sereke wiha dabeş kiriye: Kurmanc (Kirmanc), Lûr, Kelhor, Goran (2014: 63).

Nivîskarê Osmanî yên navdar Şemseddîn Samî (1850-1904)di pirtûka xwe ya bi navê "Kamûsu'l-A'lam"ê da derbareyê Kurdan, Lûristan û Lûran da agahî dide û dibêje; Lûr li rojavayê Îranê rûdinin û milekî Kurdan in, Ji ber navê wan, ji vê herêmê ra Lûristan hatiye gotin (1316/1898: 4011-4012).

Ziya Gökalp (1875-1924) yên ku damezirînerê Tirkperestîya modern e, di navbera salêñ 1900-1910'an lêkolînen civaknasîyê dike û pirtûkek bi navê "Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler" dinivîse. Ew di bin sernivîsa "Kürtlerin Sınıflandırılması" da Kurdan wiha dabeş dike: "Kurmanc, Zaza, Goran, Lur û Soran". Gokalp bahsa van beşen Kurdan û zimanê Kurdi dike, herwiha behsa zarava û devokêñ wan beşan dike û dibêje ev hemû ji Kurdiya qedîm ya kevn derketine. Ew dîne ziman ku Kurdêñ Lûr li Îranê ne û Baba Tahirê Uryan bi Lurî nivîsandiye (2013: 5, 30-32).

Di demajoya dîrokê da tê dîtin ku Lûr milekî Kurdan in û axa Lûrsitanê jî axa gelê Kurdan e. Baba Tahir li axa Lûristanê navdar bûye ku jê ra Baba Tahirê Lûrî yan jî Baba Tahirê Lûrîstanî hatiye gotin. Lê Baba Tahir di dubeytîyêñ xwe da vê nasnava xwe bi kar neanîye. Lûrî yan jî Lûristanî wek nasnavek, li wî

kirine. Her çiqas di serdema me ya îroyîn da derbareyê Lûran da yên ku dibêjin Lûr Faris in, yan jî Lûr qewmeke cuda ye hebin jî, ev gotin mijara me tevlihev nake ku, em mecbur in qewmîyeta Baba Tahir di serdema wî da biggerin û nîşan bikin. Dibe ku di roja me ya îroyîn da ji ber mezheba Şîftîyê yan jî bi sedemên cûda Lûr xwe wek Faris bihesibînin, yan jî Faris ji ber hin sedeman wan ji xwe bihesibînin. Dîsa dibe ku ji ber sedemên civaknasî û polîfîk, Lûr ji Kurdan dûrçûbin, herwiha ji alîyê çand û ziman va ji Kurdan cudadîyên kifş nîşan dabin û xwe wekî neteweyek cûda hîs bikin jî. Lê li gorî belgeyên dîrokî û bîra dîrokî, Lûr wek milekî Kurdan derdikevin pêş û Lûristan wek navendeke girîng ya gelê Kûrdan xwe nîşan dide. Bi vî awayî Baba Tahir di serdema xwe da ji alîyê nasnava xwe ya Lûrî/Lûristanî va wek helbestvanekî Kurd derdikeve pêş.

Derbareyê zimanê wî nîşaneyek din ev e ku Baba Tahir di dubeytîyeke xwe da xwe wekî ustادê zimanê Pehlewî navandiye û wiha gotiye:

EZ ustâdê zimanê pehlewî me
Ji kitêba evînê re mester im
Ey Xweda eşqa Tahir bênişan e
Ku ji eşqa seneman bê pî û ser im (Sağrıç, 2002: 70-71).

Sağrıç tîne ziman ku: Zimanê pehlewî maka zimanê Kurdî ye û jê ra Kurdiya Kevn jî tê gotin. Zimanê Pehlewî ku zimanê serdema Part û Sasanîyan bûye dişibe zimanê Kurdî ku nêziktirîn ku zaravayên Kurdî dişibin zimanê Pehlewî zaravayê Goranî û Lûrî ne. Gîw Mukriyanî gotiye ku “Kevintîrîn pirtûka Kurdî ya bi navê “Dînkerd” bi zimanê Pehlewî hatiye nivîsîn ku dişibe zaravayê Kurdî yên wekî Lûrî û Kelhorî. Mamoste Merdux jî anîye ziman ku “Pehlewî yek ji zaravayê Kurdî ye.” İhsan Nûrî Paşa di pirtûka “Mêjûya bi navê Binc û regeza Kurd” da anîye ziman ku: “Zimanê Pehlewî ku di nav part û Sasaniyan da navdar e, her ew şêwe û zarava ye ku di nav Goranîyan da bi nav û deng e û niha jî jê ra Goranî dibêjin (Sağrıç, 2002: 32-33, 71).

213

Abbarîkî dîyar dike ku hin nivîskarêñ berê, bajarêñ Farisîziman ji bajarêñ Pehlewîziman veqetandine. Wekî mînak; Hemzê Èsfehanî (mîladî 883?-971?) anîye ziman ku pênc heb zimanê Îranîyan hene: Pehlewî, Derî, Farisî, Xuzî û Suryanî (التنبيه على حدوث التصحيف). Padîşah serdemên kevn yên Îranê di qesr û civînan da bi zimanê Pehlewî axaftine. Ew dibêje di nivîsîn nivîskarêñ berê ên mîna: Hemzê Èsfehanî, Şîrvîyê bîn Şehrdar û Îbn Mûqî'e da dîyar dibe ku zimanê Pehlewî li rojavayê Îranê hatiye axaftin, ku niştecihêñ wir jî Kurd in. Abbarîkî dibeje, iro jî ez dibînim ku gelek peyvîn Pehlewî di zaravayê cuda yên Kurdî da têñ bikaranîn (Abbarîkî, h. 1392: 25).

Şemsê Qeys dibêje “ji ber taybetîyêñ dubeytîyêñ ku wek yên Baba Tahir hatine nîşandan dikare were gotinê ku ew di eslîn xwe da ne Farisiya Derî ne, belku ew Fehlevî bin (<https://wikifeqh.ir/>). Firdewsîyê ku di serdema Baba Tahir da

jiyaye, ji bo ku berhema xweya “Şehnameyê” binivîse wekî çavkanî hewcedarî bi berhemên zimanê Pehlewî dîtiye û ji bo ji wan berheman sûd wergire, piştra zimanê Pehlewî hîn bûye. Ji xwe çavkanîyên zimanê Pehlewî ji bo nivîsîna Şehnameyê ji çavkanîyên bingehîn in (Lugal, 2009: 22-25). Baba Tahir û Firdewsî hemdem in. Baba Tahir tîne ziman dibêje, ez ustadê zimanê Pehlewî me, Fidewisîyê Faris jî ji bo ji çavkanîyên zimanê Pehlewî sûd wergire piştra zimanê Pehlewî ji rahîbê Zerdûştîyan hîn dibe (Firdevsi, 2009: 15-16). Ev jî ji alîyê ziman va cudabûna Baba Tahir ji helbestvanê Farisan yên serdema wî nişan dide.

Azkaîi tîne ziman ku ji zimanê Pehlewî ra Farisiya naverast jî tê gotin. Lê dewsa vê gotinê ji zimanê Pehlewî ra zimanê “Medîya Naverast” bê gotin rastir e (tê dîtin ku senifandina zimanê Farisî ya ku Pehlewîyê ji xwe ra dike bingeh nayê pejirandin). Olz Hewzin Îrannasekî Almanî ye ku yekem car wî gotiye ku ziman û nivîsîna Pehlewî dewama zimanê Medî ya kevnare ye. Diakonoff dibêje ku peyva “part û pars” navê Medî ne. Peyva ‘pars’ di zimanê Medî da têne wateya cînarîyê. Her du jî cînar in (Azkaîi, 1995: 167-171). Di vir da dîyar dibe ku Medan nav li wan kirine. Zimanê ku li ser axa Îranê hatiye axaftin nabe ku hemû wekî Farisiya kevn, ya naverast û ya nû bê dabeşkirin û ne rast e ku zimanê Kurdî yan di nav vê dabeşê da bê hesibandin û yan jî tune were hesibandin, ku ev helwest dûrî rewişt û zanistê ye. Lewra Kurd xwedîyê zimanê qedîm yê cîhanê ne û li ser axa Îranê bi Farisan ra cînar in. “Di dîrokê da Kurd wek “arî” hatine navandin ku bêjeya “îran”ê ji bêjeya “arî/arîyan”ê tê. Kurd jî “arî” ne ku Firdewsî di Şehnameya xwe da Kurdan wek “arî” dide nasîn (Aydinlu, 2012: 15). Kurd parçayeyeke girîng ya axa Îranê ne û wek qewm ji şaristanîyê kevn yê cîhanê ne. Elî Şerîfatî Kurdan ji alîyê şaristanîyê va ji Yewnanan kevtir nişan dide ku ew Kurdan wek çavkanîya medenîyet û çandê dide zanîn (1998: 71).

Baba Tahir di dubeytîya jor da zimanê xwe wekî Pehlewî navandiye. Izady dîne ziman ku zimanê zîmkâkî yê Kurdan ji du besen bingehîn pêk têne. Ya yekem Kurmancî (Bahdînanî-Soranî) ye, ya duyem Pehlewanî (Dimîlî/Zazakî-Goranî) ye. Bahdînanî, Soranî, Dimîlî û Goranî xwedîyê gelek devokan in. Di helbesten Baba Tahir da gelek peyvîn Goranî hene. Her wiha gelek berhemên wêjeyî yên nivîsî yên ji 1000 salî jortir hene. Peyva Pehlewî ji peyva “Pahla”yê tê ku ew jî ji peyva “Pahlawand”ê derketiye. Pahla bi ihtîmaleke mezin herêma ku ziman ji wir derketiye holê, ji Kurdistana Başûr û bakûrê Lûristanê pêk hatiye. Peyva Pahla bi awayekî xirab bûye, bi peyva Feylî va guherîye û Feylî niha navê êleke / eşireke Kurdan e, ku ev êl niha li başûrê Kurdistanê di herêma Pahlayê dijîn (Izady, 2011: 299). Zimanê Pehlewî di serdema şahê Sasanîyan de fermî bûye. Farisiya naverast, Farisiya nû û bi giştî zimanên Îranî ketine bin bandora Pehlewîyê (Xeznedar, 2001: 184-203). Di encama vê bandorîyê peyvîn Pehlewî di nav zimanên Îranî da cih girtine û ev peyvan ji bo tevî zimanên Îranî bûne peyvîn hevpar. Ev peyvîn hevpar ên ku di dubeytîyan Baba Tahir da hene, zimanê dubeytîyan nake zimanê Farisî û ji alîyê qewmîyetê va Baba Tahir jî

nake Faris. Dema ku li dubeytîyên wî, agahî û çavkanîyên girîng yên derbareyê wî tê nêrîn derbareyê Farisî û Farisbûna wî tu agahî bi dest neketine.

3- Encam

Dîroka edebîyata Kurdî û ya Farisî bi qasî xwe dewlemend in. Her du edebîyat jî xwedîyê gelek berhemên giranbûha ne. Hevparîyên Kurd û Farisan ji alîyê erdnîgarî, ziman, dîrok û edebîyatê va gelek in û ev her du qewm/netewe nêziktirînê hev in. Di vê xebatê da me li ser qewmîyeta Baba Tahirê Îranî yê ku bi jîyan û berhemên xwe ji bo Kurd û Farisan xwedî nirxeke bilind e, lêkolînek pêk anî. Herwiha me di vê xebatê da rahişt ku li ser qewmîyeta wî bi belge û şîroveyan bigihîjin encamekê.

Ji bo sofiyekî mîna Baba Tahir çawa ku ‘Elî Şerî’etî anîye ziman yê ku di hundirê wî da bi qasî cîhanan ronahî, xwedî merîfet û bi qasî zeryayan xwedî zanîn û ji rastîya hebûnê têgihîstiye ra netewetî ne girîng be jî, lê çawa ku Xwedê mirovan qewm bi qewm afirandiye û her qewmek xwedî zimanekî ye, di heman demê da ji bo mirovekî mîna Baba Tahir qewmîyet girîng e jî. Ji ber vê Şerî’etî li kêleka taybetîyên wî, ji alîyê qewmîyetê jî wî daye nasîn û gotiye ew Kurd e (Shariati, 2009: 180) ku nasnameya wî temam kiriye û wî daye nasîn. Lewra her helbestvan, wêjevan û zanyar ji neteweyekî ye û li ser çand û rastîya wê neteweyê teşe digire û digihîje. Herwiha bi berhemên xwe bandor li ser neteweya xwe pêk tîne û teşe dide wê. Ew, bi hebûna xwe di nav neteweya xwe da û bi berhemên xwe di nav dîroka edebîyata neteweyekî da cih digire.

215

Angaşta Farisibûna Baba Tahir wiha hatiye palpiştkirin: “Baba Tahir Faris e, ji ber ku di nav helbestên wî da peyvîn Farisî pir in” yan jî “zimanê berhemên Baba Tahir Lûrî ye ku Lûrî zaravayeke Farisî ye, yan jî Lûrî, Farisiya kevn e û hwd.” Lê dema ku angaştek were kirin divê bi awayekî zanistî were ravekirin. Ji lêkolînan dîyar dibe, ji ber ku resenên helbestên Baba Tahir negihîştine roja îro û helbestên wî bi rîya devkî hatîye veguhaztin, di van veguhaztinan da helbest guherîn xwarine û peyvîn Farisî ketine nav helbestan, bi domara demê ra kesên ku helbestên wî xwendine yan jî nivîsîne li gorî çêja huner û zimanê xwe, helbestan nêzikî zimanê Farisî kirine, ku çapên dawîyê yên helbestên wî gelek nêzikî zimanê Farisî bûne. Lê helbestên çapên cuda û helbestên Baba Tahir yên di pirtûka destnivîsî ya Qumî (sedsala XV) da hene vê guherînê û guhartinê radixe li ber çavan. Herwiha derbareyê guhertina zimanê helbestên wî lêkolînerên ku li ser helbestên wî xebat kirine, bi giştî lihevkirine.

Gotina Baba Tahir “Emseytu Kurdîyyen va esbehtu “Erebîyyen” (Ez ketim xewê Kurd bûm û sibehê hişyar bûm “Ereb im) wek gotineke Baba Tahir hatiye tomarkirin, ku ev gotin ji mêj va di nav gelên herêma Baba Tahir û hawirdora wê herêmê da wek gotina Baba Tahir hatiye pejirandin. Di dîwana Baba Tahir ya ku ji alîyê Wehîd Destgirdî hatiye amadekirin, ew dîwana ku herî muteber tê

dîtin da ev gotin wek ya Baba Tahir hatiye tomarkirin. Ji alîyê lêkolînerên rojavayî wek gotina Baba Tahir hatiye nasandin. Ev gotin di pirtûka Şeddu'l-'Izarê da bi çend kesan va hatiye nîsbetkirin ku du kesen girîng ji wan Baba Tahir û Ebul Wefayê Kurd in. Yanê gotin li ser du kesen Kurd hatiye nîqaşkirin. Encama nîqaşê ji alîyê qewmîyetê va Kurdbûna Baba Tahir nîşan dide.

Baba Tahir di helbesteke xwe da dibêje: "Ez derwêş im, Lek im, xwedî îcاز im". Ev derbareyê nasnameya wî da dîyardeyeke din e, ku Lek Kurd in. Baba Tahir ji vê herêmê ye, piştî demekê ji vê herêmê diçê Hemedanê, lê ew li Hemedanê navdar dibe. Bernavê xwe yên Lûrî/Lûristanî û Hemedanî li wir digire.

Ew zimanê pehlewî baş dizane û di helebesteke xwe da dibêje: "Ez ustâdê zimanê Pehlewî me". Helbestnûsên serdema wî bo mînak Firdewsî, ji bo mesnewîya xwe binivîse û ji çavkanîyêne pehlewî sûd werbigire Pehlewîyê piştra hîndibe. Lê Baba Tahir xwe wek pisporê vê zimanê dide nîşandan. Cihê zimanê Pehlewîyê rojavayê Îranê ye ku Kurd li wir ji mêj va ne nişîn in. Dîsa zimanê helbestên wî ji zimanê helbestnûsên Faris yên serdema wî cudatir e ku ev jî cudatîya wî bi helbestnûsên Farisan nîşan dide.

Bernava wî ya Lûrî jî nîşaneyek ji nasnameya wî ye. Lûristan parçeyeke erdnîgarîya Kurdan e û berfireh e. Di dîrokê da her tim Lûr wek zaravayeke sereke ya zimanê Kurdi hatiye tomarkirin ku ew kesen tomar kirine me bi çavkanîyêne dîrokî û yên serdemê cuda di xebata xwe da anî ziman. Lê niha pêleke nerm ya asîmîlasyonê li ser wê herêmê heye. Hin kes angaşt dikin ku Lûrî zimanêne serbixwe ye ku yên ku berevajîyê vê radibin jî hene. Ev nîqaşî him li ber bayê pişavtinê, him jî bi çavêne iro yê zimanasîyê pêk tê. Lê di dîrokê da di serdema Baba Tahir da Lûr Kurd in û Lûrî zaravayeke Kurdiyê ye.

Helbestvan di helbesteke xwe da dibêje "Ez Tahir im niştecihê Girîn im" ku Giran di serdema wî da herêmeke Kurdan e. Di serdema Baba Tahir da navendeke Kurdan e. Herêma ku helbestvan hatiye dinê ji bo nasnameya wî girîng e û nîşaneyeyeke nasnemaya wî ye.

Têkilîyêne Baba Tahir yên ku bi Kurdên Yarsanan ra hene jî derbareyê ziman û nasnameya wî da dîyarde ne. Baba Tahir di vê bawerîyê da ferîsteyek e. Kurdên Yarsan wî yek ji xwe û wek ferîsteyekî bawerîya xwe pejirandine.

Giştiyê lêkolînerên rojavayî û yên Faris yên ku li ser Baba Tahir bi rîbaza zanistî xebitîne, derbareyê qewmîyeta wî da yan bi guman û ihtiyyat nêzîkî vê mijarê bûne, yan jî gotine ew Kurd e. Lê Farisbûna wî neanîne ziman. Ji alîyê zimanê helbestên wî yan gotine zimanê helbesta wî Lûrî ye, yan jî gotine Lûrî ye û Lûrî zaravayeke Kurdi ye, herwiha yan jî gotine helbestên wî bi zimanê devera wî ye (deverî ye) û bi peyvîn zaravayên Kurdiyê va tevlihev in.

Wekî gotina dawî, ji agahiyêne dîrokî û lêkolînan dîyar dibe ku zimanê resen yê helbestên wî bi zimanê ku li rojavayê Îranê hatiye axaftin ra pêwendîyeke xurt

dihewîne ku ev ziman zêdetir bi zarava û devokên Kurdî va, yên Lûrî/Lekî/Goranî va, têkil e. Herwiha dîyar dibe ku Baba Tahir ji aliyê qewmîyetê va Kurd, ji aliyê milên Kurdan va Lûr û Lek, ji aliyê herêma ku navdar bûye ve Hemedanî/Lûrîstanî derdikeve pêş.

Çavkanî

- Abbarîkî, S. A. H. (H. 1392). “Nêgahî Tazê Be-Zebanê Şê‘Rê Baba Tahêre Hemedanî”, *Kêtabê Mah Edebîyat*, j. 80, Azermah.
- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, İstanbul: Nûbihar.
- Aydinlu, S. (2012). *Firdevsi’nin Şehnâmesi’nde Kürtler*, Çeviri: Erkan Çardakçı, İstanbul: Avesta.
- Aytaç, G. (2019). *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, 2. Baskı, Ankara: Doğubatı.
- Azamat, N. (2001). “Kalenderiyye”, *Dia*, XXI, İstanbul: Tdv Yayınları.
- Azkaii, P. (1995). *Baba Tahir-Name*, Tehran: Tus.
- Baba Tahirê Hemedanî (1932), *Dîwanî Kamil Baba Tahir*, ç. 2, Tehran: Neşriyata Meceleya Armaghan.
- Bahaudînê Qûmî (848 /1469), *Pirtûka Destnîvisî*, Konya: Mevlana (Etnografa) Müzesi İhtisas Kütüphanesi.
- Bilgin, O. (1993). “Cüneyd-i Şîrâzî”, *İslam Ansiklopedisi*, Cilt 8. İstanbul: Tdv.
- Blau, J. (2012). *La Littérature Kurde*, Fondation-Înstitut Kurde De Paris 106, Paris: Rue La Fayette.
- Cebecioğlu, E. (2004). *Tasavvuf Terimleri Ve Deyimleri Sözluğu*, 2. Baskı, İstanbul: Anka Yayınları.
- Çelik, A. F. (2015). “Bâbâ Tâhir-Î Hemedânî Divanının Mehdî-Î Hamîdî Nûshasında Geçen Dobeytîleri Ve Türkçe Tercümesi”, *Doğu Esintileri*, (3), 247-293.
- Çetin, S. (2013). *Yâkût El-Hamevî’nin Mu‘Cemü ’l-Buîldân Adlı Eserinde Kürtler*, Teza Lîsansa Bilind, Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır.
- Demircan, A.-Akbaş. M. (2015). *Kürtler (Tarih)*, Ç. 2, İstanbul: Nida.
- Destgirdî, W. (1929). “Baba Tahirê Uryan”, *Mecelle Armaghan* (مجله آرمغان), s. 9, اسفندماه 1307, j. 10.
- Firdevsi (2009). *Şahnâme*, Wer. Necati Lugal, İstanbul: Kabalcı Yaynevi.
- Gökpınar, M.; Geliş, A. C. (2016). *Lek Küretleri Çukurova Lekvanikleri, Haymana Lek Şahbazanları, Bingöl Bermeki Lekleri*, İstanbul: Do.
- Gökçalp, Z. (2013). *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, 2. Baskı, İstanbul: Toker.
- Heron-Allen, E.-Brenton, E. C. (1902). *The Lament Of Babatahir Being The Rubaiyat Of Baba Tahir Hemedani (Uryan)*, London: Gilbert And Rivington Ltd.

- Izady, M. R. (2011). *Kürtler Bir El Kitabı*, Ç. 4, (Wer.: Cemal Atilla), İstanbul: Doz.
- Kara, S. (2012). *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, Ç. 3, Stenbol: Nûbihar.
- Kemikli, B. (2013). *Türk İslâm Edebiyatı*, “Din ve Edebiyat” Editör: Hasan Aksoy, Eskeşehr: Anadolu Üniversitesi Yayıni.
- Kerim, A. H. (2011). *Balkan Yarımadasında Kürtler*, İstanbul: Evrensel Yayınları.
- Köprülü, M. F. (1980). *Türk Edebiyatı Tarihi*, Amadekar: Orhan F. Köprülü-Nermin Pekin, İstanbul: Ötüken Yayınları.
- Mevlâna Celâleddin Rûmî (2004). *Mesnevî*, (Amd.: Adnan Karaismailoğlu), c. I, İstanbul: Yeni Şafak Yayınları.
- _____, (2004). *Mesnevî-İ Şerif Şerhî*, (Çeviri ve Yorum: Ahmed Avni Konuk), İstanbul: Gelenek Yayınları.
- Minorsky, V. (1997). “Baba Tâhir ‘Uryan”, *İslâm Ansiklopedisi*, Ç. 5, I-XII, Eskeşehr: M. E. B. Yayınları.
- Muînuddîn Îbnu’l Qasim Cuneydê Şîrazî (Şemsî 1328). *Şeddu’l-‘Izar Fî Hattî’l-Evzar ‘An Zuvvarî’l-Mezar*, B. 3, Tehran: Mohles.
- Modarrezzadeh, A. (1392/2013). “Mergê Endîşêhayê Baba Tahir”, *Feslnamê ‘Irfanîyat Der Edebê Fairsî (Edeb Ve ‘Irfan Edebistan)*, Serdem 4, J. 15, 95-108.
- Nikitin, B. (2013). *Kürtler Sosyolojik Ve Tarihi İnceleme*, 6. Baskı, İstanbul: Deng.
- Ocak, A. Y. (2004), *Türk Sufiliğine Bakışlar*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Öztürk, M. (2014). “Divan Şairinin Nimet Ve İktidar Ekseninde Ulusları Ötekileştirmesi”, *A. Ü. Türkîyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi [Taed]*, s. 51, 63-88, Erzurum.
- Rawendî, (Muhammed Bîn ‘Elî Bîn Soleyman) (H. 473). *Rahetu’s-Sudûr We Ayetu’s-Surûr Der Tarîxê Alê Selçûq*, Têhran: Asatîr.
- Rawlinson, G. (2006). *Medya Krallığı*, İstanbul: Doz.
- Sağrıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdi*, Stenbol, Weşanê Enstîtuya Kurdi Ya Stenbolê.
- Sâmî, Ş. (1316/1898). *Kâmûsu ’l-A ‘Lâm*, c. VI, , İstanbul: Mihran Matbaası.
- Secadî, ‘E. (1391). *Méjûy Edebî Kurdi*, Weş. Sine: Bilavkirdnewey Kurdistan.
- Sefa, Z. (1369/1990). *Tarîxê Edebîyat Der Íran*, b. 2, ç.10, Tehran.
- Şerefhanê Bedlîsî (2014). *Şerefname (Dîroka Kurdistanê)*, (Wer.: Ziya Avcı), Mersin: Azad.
- Şeriati, A. (2009). *Hubut Der Kevîr*, <http://Shariati.Nimeharf.Com/>.
- (1998). *Medeniyet Ve Modernizm*, Ç. 5, (Wer.: Ahmet Yüksek), İstanbul: Birleşik Yayınları.
- Şeşen, R. (1999). “İbn Hawkal (ابن حوقل)”, *Tdv İslâm Ansiklopedisi*, c. XX, 1999.
- Şiwan, Î. E. (2012). *Edebê Kownî Kurdi*, Hewlêr: Zankoy Selehedîn.

- Temo, S. (2013). *Kürt Şiiri Antolojisi. II*, İstanbul: Agora Kitaplığı Yayınları.
- Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf Ve Tarîkatlar*, İstanbul: Weş. Nûbihar.
- Uluçay, Ö. (2010). *Ehl-İ Hak Baba Tahir Uryan Zerdüst*, Adana: Gözde.
- Xeznedar, M. (2001). *Mêjûy Edebî Kurdi*, Weş. Aras.
- _____ (2004). *Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Gotarê Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn Û Pirçandiyê*, 4-6 Sermawez 2003, Stenbol: Weş. Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê.
- Xodayî, Î. (1397/2013). Baba Tahirê Hemedanî Ve Ş'irî Amixtê Farisî-Lorî, <http://Loor.Ir>: / باباطاهر-همدانی-و-شعر-آمیخته-فارسی-لری/ Gihîn: 01/06/2020.
- Qanatê Kurdo (2010). *Rêzimana Kurdi Kurmancî-Soranî*, Ji Kurdiya Soranî Zulküf Ergün, İstanbul: Nûbihar.
- Yavuzer, M. N. (2016). *Baba Tahir Di Wêjeya Kurdi De*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Enstîtuya Zimanê Zindî, Van.
- Yazıcı, T. (2012). “Baba Tâhir-Î Uryân”, Dia, IV, İstanbul: Tdv. Yayınları,
- Yıldırım, K. (2013). *Baba Tahirê Uryan Hayati Görüşleri Dîwani*, Stenbol: Avesta.
- Yıldırım, N. (2015). Rûdekî-Yi Semerkandî (Ö. 329/940). *Doğu Esintileri* , (3), 133-194.
- Zerrînkûb, ‘E. (H. 1376). *Custucû Der Tesewifê Îran*, Ç. 5, Weş. Tehran: Muesese-Ê İntisarat Emîrkebir.
- <https://Lakistan.Persianblog.Ir>, يا همدانی“ باباطاهر عریان لک؟
- “Dêhxweda” [http://Parsi.Wiki/Dehkhodasearchresult-Fa.Htm], Gihîn: 15/02/2020.
- <https://Ku.Wiktionary.Org>, Gihîn: 15/06/2020.
- <https://Wikifeqh.Ir/>, Gihîn: 10/05/2020.

<https://doi.org/10.35859/jms.2020.732530>

SİSTEMA DİYARKIRINA ZAYENDA NAVDÊRAN DI KURDÎYA KURMANCÎ DE*

Mehmet YONAT¹

PUXTE

Zayend di gelek qadêن jîyana însanan de hêmaneke dîyarker e. Ziman jî ji wan qadan e ku zayend xwe di nav de nîşan dide. Xebatêن zayenda di zimanan de li ser du mijaran kûr dibin; sîstemên rîkkeftina zayenda navdêran û sîstemên diyarkirina zayenda navdêran. Di vê xebatê de sîstema diyarkirina zayenda navdêran di Kurdîya Kurmancî de bi awayekê sîstematîk hatîye analîzkirin. Xebatên li ser sîstema diyarkirina zayenda navdêran di Kurdîya Kurmancî de gelek kêm in û yên heyî jî yan tatmînkar nînin an jî tenê li ser diyarkirina zayenda navdêren jîndaran sekinîne. Kêmasiya xebateke sîstematîk ya di vê qadê de bû sebebê vê gotarê. Di xebatên li ser zayendê de, nêrînên Corbett (1991) bingeh in ku di vê gotarê de jî ew nêrîn hatine şopandin. Di wê xebatê de hin pîvan hatine diyarkirin bo diyarkirina zayenda navdêran û di vê xebatê de jî ew pîvan ji bo Kurdîya Kurmancî hatine tetbiqkirin. Di encamê de, sîstemeke rîk û pêk ya sîstema diyarkirina zayenda navdêran hatîye bidestxistin ku bi wê ve zayenda hemû navdêren Kurmancî li ser mantiqekê dikare were danîn. Dîsa, di devokeke Kurmancî ya Qefqasyayê de navdêren bi awayekî pirjimar kêşandî maruzê senifandineke cuda dibin ku li ser însanbûn û neînsanbûnê ava bûye. Ev senifandin jî di vê gotarê de hatîye analîzkirin.

Peyvîn Sereke: Kurmancî, Sîstema Diyarkirina Zayenda Navdêran, Navdêren Nêr, Navdêren Mê, Navdêren Cotzayend, Navdêren Jîndaran, Navdêren Nejîndaran.

* Bu çalışma yazanın Türkçe yazılan "Kurmancı Kürtçesi Ağızları Hakkında Sosyolinguistik bir İnceleme" adlı doktora tezinden alınıp genişletilerek Kürtçe yazılmıştır.

¹ Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı

E-mail: mehmetyonat49@mail.com

ORCID: 0000-0001-8576-7486

Article Type/Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 05.05.2020 - Accepted / Makale Kabul Tarihi: 29.08.2020

Kurmancî Kürtçesi’nde Cinsiyet Belirleme Sistemi

ÖZ

Cinsiyet insan hayatının birçok alanında belirleyici bir unsur olarak karşımıza çıkmaktadır. Dil de bahsedilen bu alanlardan birisidir. Dilde cinsiyet çalışmalarları, cinsiyet uyum sistemleri ve cinsiyet belirleme sistemleri şeklinde iki alan üzerine yoğunlaşmaktadır. Bu çalışmada Kurmancı Kürtçesi’nin cinsiyet belirleme sistemi sistematik bir şekilde incelenmiştir. Kurmancı Kürtçesi’nde cinsiyet belirleme sistemi üzerine çalışmaların sayısı çok azdır. Var olan çalışmalar da ya tatmin edici boyutlarda değildir ya da yalnızca canlı isimlerin cinsiyetinin belirlenme sistemi üzerine yoğunlaşmıştır. Bu alandaki sistematik bir çalışmanın eksikliği bu makalenin oluşmasına sebep olmuştur. Corbett’in (1991) bu alandaki çalışmalarında temel alınan bakış açısı dildeki cinsiyet üzerine yapılan bu çalışmada da temel ölçüt olarak alınmıştır. İsimlerin cinsiyetinin belirlenme sistemine dair bahsi geçen çalışmada bazı kriterler belirlenmiş ve bu kriterler Kurmancı Kürtçesi’ne uygulanmıştır. Çalışmanın sonunda Kurmancı Kürtçesi’nin tüm isimlerinin cinsiyetlerini bir mantığa oturtan derli toplu bir cinsiyet belirleme sistemi elde edilmiştir. İsimler çoğul çeliplendiğinde insan olma – insan olmama kriteri üzerine dayanan bir isim sınıflandırma sistemi Kurmancı Kürtçesinin Kafkas bölgesinde konuşulan bir alttongusunda keşfedilmiştir. Bu sınıflandırma da elinizdeki makalede analiz edilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Kurmancı, İsimlerin Cinsiyet Belirleme Sistemi, Eril İsimler, Dişil İsimler, Çift-Cinsiyetli İsimler, Canlı Varlık İsimleri, Cansız Varlık İsimleri.

Gender Assignment System in Northern Kurdish

ABSTRACT

Gender is a characteristic element in a range of areas of human life. Language is one of these areas in which gender appears. Gender studies specify on two topics; gender agreement systems, and gender assignment systems. In this article, gender assignment system in Northern Kurdish has been analysed systematically. Studies on gender assignment system in Northern Kurdish are limited and they are either far from satisfaction of the topic or they just focus on animate nouns assignment system. Deficiency of a systematical study on the topic leads to this study. The approach of Corbett’s (1991) key source of gender studies has been followed in this article. In the Corbett’s (1991) study, some criteria have been identified to assign nouns gender. In this study, these criteria have been applied to Northern Kurdish. What is acquired in the end of this article is a clear-cut gender assignment system which could rationalize all nouns of Northern Kurdish in terms of gender assignment. Last but not least, in a Caucasian sub-dialect of Noththern Kurdish, It has been realised a different kind of noun’s classification which is based on human-nonhuman criteria when a noun is inflected plurally. In this study, the mentioned clasification has been analysed too.

Keywords: Northern Kurdish, Gender Assignment System, Male Nouns, Female Nouns, Double-Gender Nouns, Animate Nouns, Inanimate Nouns.

Destpêk

Têgeha zayendê di hemû civatên dinyayê de wek têgeheke girîng dertê pêsiya me. Lewra di hemû zimanêni dinya de, peyamên bi zayendê re eleqedar bi rîyêni cuda ve têne dayîn. Lê herçiqas bikaranîna zayendê di hin zimanêni dinyayê de gelek berfireh be jî di hin zimanêni din de gelek teng e. Hin ziman peyamên bi zayendê ve eleqedar, tenê di qada leksikî de didin. Lê hin zimanêni din yên dunyayê jî ev peyam hem di qada leksikî de hem jî di qada rîzmanî de didin. Ev ziman navdêran li gor zayendêni wan disenifînin. Cureyên bêjeyan wek rengdêr, lêker, cînavk û hwd. dibe ku li gor zayenda navdêrê bi navdêrê re bikevin nav rîkkeftinê (agreement) (Haig, 2000: 2). Hebûna zayendê di zimanekî de ji bo axêverên wî zimanî hêsanîyan çê dike. Mesela, zayend wê îmkanê dide ziman ku navdêrêni wek hev têni nivîsin lê me'na wan cuda ne, ji hev cuda bibin (Akin, 2005: 2). Mesela di Kurmancî de peyva “mal”ê eger di mena “cihê ku lê tê jîyîn” were bikaranîni wek *mê* tê nîşankirin (mala min), lê eger di mena “tiştêni ku kesek xwedî ye” de were bikaranîni wê demê jî –*nêr* tê îşaretkirin (malê dunyayê).

Xebatêni li ser zayenda rîzmanî hatîne kirin, li bin du serenavan têne senifandin; (1) xebatêni ku li ser rîkkeftina zayendî ya navdêran bi beşen axaftinê re disekine (2) xebatêni li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran disekinin. Di vê xebatê de em ê li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêran ya di Kurmancî de bisekinin.

223

Di zimanekî xwedîzayend de bikaranîna zayendê pêvajoyeke otomatîk e. Lewra, wextê axêverekî zimanê zikmakî, zimanê xwe yê xwedîzayend diaxive, ji bo zayenda navdêran bîne bîra xwe tu hewlan nîşan nade. Yanê zayenda navdêran bi awayekî otomatîk tê bîra wî axêverî. Disa di xebatêni li ser zayenda navdêran hatine kirin de pirseke din ev e ka gelo di dîyarkirina zayenda navdêran de tu zagon hene an na? Xebatêni li ser zayendê yên ewil wek Bloomfield (1993: 280) îddîa kirine ku tu zagonêni zayenda navdêran dîyar bike tunene. Lê xebatêni pey wê bersivêner erênitir dane vê pirsê. Li gor van xebatêni nûtir-hin delîl hene ku nîşan didin zayenda navdêran li gor hin zagonan dîyar dibe. Delîl ev in; (1) Axêverên zimanekî yên zikmakî wextê zimanê xwe diaxivin tu xeletîyê di bikaranîna zayendê de nakin, (2) wextê ji zimanekî bîyanî bêje têne querzkirin, ev querzkirin li gor hin zagonan pêk têni, (3) wextê bêjeyeke nû di zimanê xwedîzayenda rîzmanî de tê afirandin, hemû axêverên vî zimanî vê bêjeya nû bi heman kategoriya zayendê ve disenifînin. Nexwe dikare were gotin ku axêverên zikmakî yên zimanekî xwedî zayend senifandina navdêran li gor hin krîteran dîkin. Ji bo vê sîstêmê jî “sîstema dîyarkirina zayendê” tê gotin (Corbett, 1991: 7).

Ji bo fêmkirina sîstema dîyarkirina zayendê di zimanekî de, divê nêrîn û fêmkirina jîyanê ya wê civatê were zanîn. Mesela, berîya ku xebatêni bi hurgilî li

ser zimanê Anindilyakwa hatine kirin, dihate gotin ku sîstema dîyarkirina zayendê di vî zimanî de tesaduffî ye. Lê pey xebatên Worsley (1953-54) û Leeding (1989: 221-87) hate fêmkirin ku sîstema dîyarkirina navdêran di wî zimanî de li gor nêrîna jîyanê ya wê civatê şikil girfîye (Corbett, 1991: 29).

Zimanên xwedî zayenda rêzimanî dikare navdêran têxe nav herî kêm du û herî zede bîst senifan. Yanê hin ziman navdêran dixine nava du sinifan, mesela di Kurmancî de nêr û mî, û hinekêن din jî navdêran dikarin ji dudu heta bi bîst awayî biseniffînin. Di gelek zimanên dunyayê de bi taybetî zimanên Hind-Ewrûpî de, navdêr li gor zayenda xwe ya bîyolojîk têne senifandin, loma ji bo senifandina navdêran bêjeya “zayend” (gender) hatîye bikaranîn. Lîbelê, senifandina navdêran tenê li gor zayenda navdêran ya bîyolojîk nayê kirin. Ji bilî krîtera zayenda bîyolojîk hin krîterên din jî hene ku hin zimanên dunyayê qismeke kêm ya van krîteran bi kar tînin û hinêن din qismeke zêde ya van krîteran bikar tînin. De La Grasserie (1898: 614-15) di xebata xwe ya berfireh de, krîterên senifandina navdêran li bin heft serenavan dabeş kirîye;

Jîndar - Nejîndar (animate/inanimete)

Bimantiq - Bêmantiq (rational/non-rational)

Însan - Neînsan (human/non-human)

Însanê Nêr – Yê Din (male human/other)

Biquwet – Lawaz (strong/weak)

Mezinkirî - Piçûkkirî (augmentative/diminutive)

Nêr – Yê Din (male/other)

Nêr – Mê - Bêzayend (masculine/feminine/non-sexed)

Corbett (1991) du krîterên din jî li van krîteran zêde kirine; (1) krîter li jorê hatî behskirin, di hin zimanan de dibe ku bi hev re werin bikaranîn û krîterên nû derxine meydanê. Mesela, di hin zimanan de hem senifandina însan – neînsan heye û hem jî senifandina “nêr – yê din” heye. Di encama yekbûna van herdu krîteran de krîtera Însanê Nêr – Yê Din derdikeve meydanê. Krîtera duyem (2) jî ew e ku herçiqas di gelek zimanên dunyayê de *nêrtî* wek krîtereke dîyarker derkeve pêşberî me jî di hin zimanan de *mêtî* jî wek krîtereke dîyarker xwe nîşan dide (Corbet, 1991: 30). Krîterên li jorê hatî behskirin, krîterên me’neyî ne ku ji bilî van krîteran krîterên şiklî jî hene. Yanê dibe ku hin gireyên li bêjeyan zêde dîbin zayenda navdêran dîyar bikin. Wek gireya biçûkkirînê (diminutive) ku di gelek zimanan de navdêran dike mê (Corbett, 1991).

Beriya ku dest bi mijarê bête kirin bi awayeke kurtasî behskirina hebûna zayendê di Kurmancî de wê kîr bê. Di Kurmancî de navdêr li bin du zayendan têن senifandin; yê *nêr* û *yê mî*. Eger navdêr di rewşa tewandî yan jî rewşa bangkirinê de, yan jî di nav îzafeyê de wek yekjimar neyêne bikaranîn, di derbarê zayenda navdêren kurmancî de tu agahî dest nakeve (Haig, 2000: 4).

Yanê, navdêr bi serê xwe û di rewşa rasterast de tu agahî di derbarê zayenda xwe de nadin. Dîsa cînav û rengdêrên zayend-dîyarker jî ji wan bêjeyan in ku derbarê zayendê de agahî didin. Eger em bikaranîna paşgirê zayendê yên kurmancî di nav tabloyekê de bidin wê wiha be (Tan, 2015; Bedîr Han û Lescot, 2004; Taş, 2013; Ekîncî, 2007; Adak, Aydin û yên din, 2016; Samûr, 2012; Komxebata Kurmancîye, 2016):

Tablo 1: Di Kurmancî de Paşgirê Zayendê²

	Rewşa Tewandî		Rewşa Bangkirinê	Îzafe	
	Dîyar	Nedîyar		Dîyar	Nedîyar
Nêr	-î	-î	-o	-ê	-î
Mê	-ê	-ê	-ê	-a	-e/-a

Ji bilî paşgirê zayendê cînav û regdêrên zayend-dîyarker jî di Kurmancî de derbarê zayenda navdêra refere lê tê kirin de agahî didin. Ev jî bi vî awayî ne:

225

Tablo 2: Cînav û Rengdêrên Zayend-Dîyarker

Zayend	Cînav û rengdêrên zayend-dîyarker
Nêr	vî / wî
Mê	wî / wê

Di vê xebatê de di serî de wê li ser çend taybetîyên bingehîn yên sîstema dîyarkirina zayenda navdêran bê sekinin. Ev taybetî, (1) bermayîyên me'neyî (Semantic Residue) û (2) serhevduvebûn (overlapping) in. Dû re, wê li ser sîstema dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî bê sekinin. Di vê beşe de, pêşî wê sîstema dîyarkirina navdêran di bin du kategorîyan de bê senifandin; sîstema dîyarkirina navdêran ya me'neyî, sîstema dîyarkirina navdêran ya şiklî û ev ê bi rêzê ji bo dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî werine bikaranîn. Paşê jî, wek dawî wê li ser rîkkeftina zayendî ya navdêrên pirjimar hatî kişandin were sekinin.

² Her çiqas di Kurmancî de paşgira nedîyarîyê pasgira “-ek(-)” jî be lewra ev paşgir tu bandora xwe li ser zayendê tune û dîsa lewra ne ji paşgirê zayendê ne li vê derê de nehatine dayin.

1. Çend Taybetiyêن Bingehîn yên Sîstema Dîyarkirina Navdêran

Sîstema dîyarkirina navdêran di hin zimanan de pêvajoyeke komplex e û di hinekên din de nîsabeten kêmter komplex e. Beriya ku dest bi terîfa sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de were kirin, hin taybetiyêن vê sîstemê yên ku di gelek zimanên dinyayê de têne dîtin, were kirin wê ev mijar rihettir zelal be. Ev taybetî (1) bermayîyen me’neyî (Semantic Residue) û (2) serhevdubebûn (Overlapping) in.

1.1. Bermayîyen Me’neyî (Semantic Residue)

Zagona “bermayîyen me’neyî” (Semantic Residue) ew tişt e ku navdêren ku bi zagonêن pozitîf ve têne senifandin, dikevine nav wê senifa zayendê ku bi zagonêن pozitîf ve têne dîyarkirin û navdêren ku bi zagineke pozitîf ve nayêne senifandin jî dikevine nav wê senifa zayendê ku di wî zimanî de ji bo vê senifê senifek heye. Mesela, Bedir Han û Lescot (2005: 67-68) derbarê sîstema dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de wiha dibêje; di Kurmancî de, navdêren ku tiştên şenber yên tûj, bilind nîşan didin zayenda *nér* distînin û navdêren şenber yên kûr, qul an jî rast nîşan didin jî zayenda *mê* distînin. Ev herdu zagon zagonêن pozitîf in. Yanê, zaginek heye ku senifa zayendê nîşan dide. Lê hin navdêr hene ku bi tu zagineke pozitîf ve nikarin di nav senifeke zayendê de werin bicihkirin. Ev navdêr di nav gruba “bermayîyen me’neyî” (Semantic Residue) de cih digirin. Di Kurmancî de navdêren bermayîyen me’neyî wek mê têne işaretkirin. Ji bo vê Bedir Han û Lescot (2005: 60) dibêje, eger navderekê bi riyeket mantiqî (bi te’rîfa me bi zagineke pozitîf ve) ve nikaribe were terîfekirin ew navdêr mê tê qebûlkirin.

1.2. Serêkvebûn (Overlapping)

Zagona serêkvebûn ew tişt e wextê navderekê ji krîtereke pozitîf zêdetir bi krîteran ve bê dîyarkirin, yanê wextê ev krîteren pozitîf bavêjin ser hevdu, ji van krîteren pozitîf ew krîtera pozitîf tê hilbijartin ya ku ji hêla wê civakê ve bihêztir tê dîtin. Mesela, di Kurmancî de endamê laşê însanan dikevine nav senifa zayendê ya *nér*. Ev krîtereke pozitîf e. Di vê rewşê de divê her endama laşê însanan *nér* be. Dîsa, krîtereke pozitîf ya din jî ev e ku di Kurmancî de tiştên bêhêz û bêparastin *mê* ne. Bêjeya “pişt” ew bêje ye ku di nêrîna jîyanê ya Kurmancan de bi van herdu krîteren pozitîf ve dikare were senifandin. Yanê eger em bi krîtera pozitîf ya ewil vê bêjeya “pişt” binixînin, divê ev bêje *nér* be lê eger em bi krîtera pozitîf ya duyem ve vê bêjeyê binixînin, divê ev bêje bibe *mê*. Di vê derê de ev herdu krîter ser yek ve bûne (Overlapping). Di encama vê serêkvebûnê de, di nêrîna jîyanâ Kurmancan de krîtera duyem zêdetir giran hatiye û ev bêje wek mê hatiye hesibandin. Divê ev jî bê gotin ku ev krîter cudahîyê zayenda navdêran ya di navbera devokan de heyî dikare heta radeyekê te’rîf bike. Yanê hin devok dikarin di encama serêkvebûnê de krîterekê

hilbijêrin û devokeke din jî krîtera din ya pozîtîf hilbijêre. Mesela, di hin devokêن Kurmancî de “mû” wek *nér* û di hinan de jî wek “*mê*” tê bikaranîn.

2. Sîstema Dîyarkirina Navdêran di Kurmancî de

Zayenda navdêran di zimanan de bi du awayî dîyar dibin; bi agahiyên me’neyî (Semantic) yên navdêran û bi agahiyên şiklî (form) yên navdêran. Agahiyên şiklî yên navdêran di nav xwe de dibin du beş; agahiyên derbarê morfolojiya dariştinî ya navdêran û agahiyên derbarê fonolojiya navdêran (Corbett, 191: 7-8). Yanê, sîstema dîyarkirina navdêran bi agahiyên me’neyî yên navdêran û bi agahiyên şiklî yên navdêran ve tê bidestxistin.

2.1. Sîstema Me’neyî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di zimanên xwedîzayend de me’na navdêrekê di dîyarkirina zayenda navdêrê de roleke gelek mezin hildigire. Ev rewş di hin zimanan de gelek bandordar e lê di hinekan de zêde bandordar nîne. Di dîyarkirina zayenda navdêrekê de bandortirîn taybetiya me’neyî ya navdêrekê ew zayenda bîyolojîk e ku bi wê navdêrê ve tê qestkirin. Lê aşîkar e ku piranîya navdêrên di zimanekî de nejîndar in û navdêrên nejîndar xwedî zayenda bîyolojîk nînin. Yanê navdêrên hebûnên nejîndar nikarin bibin nêr an jî mî. Loma ji bo dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndar hin krîterên din hene. Yanê, gelo çîma di Almanî de “Gabel” (çetel) mî ye, “Messer” (kêr) notr e û “Löffel” (kevçî) nêr e? Dîyarkirina van navdêrên nejîndar pêvajoyeke komplekstir e (Haig, 2000: 3-4).

227

Di Kurmancî de sîstema dîyarkirina zayenda navdêran bi piranî bi krîterên me’neyî ve derdikevin meydanê. Ji bilî krîterên me’neyî hin krîterên şiklî yên bi morfolojiyê ve eleqedar jî di dîyarkirina zayenda navdêrên Kurmancî de bandordar in. Ji bo dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de divê pêşî navdêr di nav xwe de wek yêr jîndar û yêr nejîndar werin senifandin. Paşê jî ev navdêr di nav xwe de wê werine senifandin.

1.1.1. Sîstema Me’neyî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêrên Jînadaran

Navdêrên jîndar navdêrên însan û heywanan in. Di dîyarkirina van herdu grubêñ navdêran de sê hêman bandorê li ser dîyarkirina zayenda navdêran dikin. (1) Dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke leksîkî, (2) dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke referansî û (3) benda cudabûyîna zayendê.

a. Sîstema Leksîkî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Dîyarkirina zayenda navdêran bi awayeke leksîkî ew tişt e ku zayenda navdêrên jîndar ji bêjeyan xwe têne fêmkirin. Mesela, ji me’neya bêjeyên wek *bav*, *bira*, *ap*, *xal*, *zava*, *pismam*, *hevling*, *kal*, ... hwd. zayenda wan a rîzmanî tê fêmkirin. Lewra ev navdêr jîndarêñ însan yêr ji hêla bîyolojîk ve nêr nîşan didin û loma navdêrên nêr in. Heman tişt ji bo navdêrên însan yêr ji hêla bîyolojîk ve mî jî

derbasdar e. Wek, dê, xwîşk, jinap, jinxal, bûk, dotmam, jintî, dapîr, hwd. Ev rewş di navdêrên heywanan nîşan didin de jî heye. Mesela, navdêrên wek *conege, dîk, beran, hesp, nêrî, kopek, nêrekew, nérker*, ... hwd. hem ji hêla bîyolojîk ve, hem ji hêla gramatîk ve û hem jî ji hêla leksîkal ve nêr in. Ji aliyê din ve, navdêrên wek *çelek, mirîşk, mî, mehîn, bizin, dêlik, mîkew, manker*, ... hwd. jî dîsa wek navdêrên berîyê hatî dayîn ji hêla bîyolojîk, gramatîk û leksîklî ve mî ne.

Di derbarê navdêrên jorê yên ji hêla leksîklî ve zayenda wan dîyar de du husus hene ku divê bêne zanîn. (1) Navdêrên însanan yên ji hêla leksîklî ve zayenda wan tê zanîn hema bêje bi temamî di navenda xwe de navdêrên nêr digirin. Yanê navdêrên nêr yên mervantîyê nîşan didin yên *wek ap, xal, bira*, ... hwd. ji bo formen van yên mî bingeh in. Weku, navdêra mî ya “jinap” ji navdêra nêr ya “ap”, disa, “jinxal” ji “xal”, “jinbira” ji “bira” tê çêkirin. Di Kurmancî de eksê vê rewşê mumkun nîne (Haig û Öpengan, 2014: 6). Yanê ji navdêra mî ya “met”ê navdêreke nêr wek “mîrmet”* nikare were çêkirin.

Hususa duyem (2) jî derbarê navdêrên heywanan de ye yên ku ji hêla leksîklî ve zayenda wan tê zanîn. Hin ji van navdêran ji bo nîşandana cureyeke heywanan tê bikaranîn wek, gur, ker, kewhwd. Ev wextê bi vê awayî têne bikaranîn zayandan wan yan di nav çarçoveya cotzayendî de tê nirxandin û bi awayeke referansî zayenda wan tê dîyarkirin³ yan jî bi hin pêşgir, paşgir an jî bêjeyan ve zayenda wan bi awayeke leksîklî tê dîyarkirin. Mesela, navdêra “kew” bi pêşgirên {mî-} û {nêr-} ve dibe “mîkew” û “nêrekew” û zayenda wê bi awayeke leksîklî dîyar dibe. Heman tişt ji bo bêjeya “ker”ê jî dikare were gotin ku ew jî dibe “manker” û “nêreker”.

b. Sîstema Referansî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di Kurmancî de hin navdêr hem ji bo jîndarên nêr hem jî yên mî bêni bikaranîn. Mesela, *heval, xwendekar, mamos, doxtor, xwarzî, birazî, ker, kew, şer, piling, mişk*, hwd. ji van navdêran in. Ev navdêr her wekî tê dîtin hem navdêrên însanan hem jî yên heywanan in. Dîsa regdîr wextê wek navdêran têne bikaranîn ew jî ji bo du zayandan têne bikaranîn, wek, “delal”, “xwesik”, “çeleng”, “kurmi”, “beredayî”, ... hwd. Mesela, yek dikare ji yekê re hem bêje “delala min” û hem jî “delalê min”. Di ya ewil de kesa delal keseke jin e û ya duyem de kesê delal kesekî mîr e û bi vî awayî mînakîn din jî dikarin werin bikaranîn.

Berîya behsa hurgîlîyên vê beşê bê kirin, divê çarçova teorîk ya van navdêran bê danîn ku bi awayeke referansî zayenda wan dîyar dibe. Bedir Han û Lescot (2005: 69) navdêrên referansî wek navdêrên nêr qebûl kirine û ji bo bikaranîna van navdêran ya bi awayeke mî jî iddfâ kirine ku ev bikaranîna mî tenê ji hêla rîkkeftinê ve pêk tê. Lê Haig û Öpengan (2014) û Haig (2000) ev navdêr wek

³ Li jêrê wê behsa dîyarkirina zayenda navdêran ya bi awayeke referansî û cotzayendîyê were kirin.

cotzayend⁴ terîf kirine. Yanê ev navdêr ne navdêrên nêr in ne jî yên mê ne. Li gor zayenda bîyolojîk ya jîndara ku nîşan didin, zayenda wan navdêran diguhere. Ji bo vê îddiyâjî Haig (2000: 9) du defilêxwe hene: (1) navdêreke zimanekî eger di nav grubeke zayendê de hatibe senifandin mecbûr e rîkkeftinê bi wê zayendê ve bike. Yanê eger mesela bêjeya “heval” nêr be mecbûr e tenê rîkkeftina nêr nîşan bide. Lê “heval” hem rîkkeftina nêr wek “hevalê min” hem jî rîkkeftina mê wek “hevala min” nîşan dide. Argumenta duyem (2) ya Haig û Öpentin (2014: 7) jî kîmîn nîşanên morfolojik an jî fonolojik yên ku zayenda navdêrên referansî nîşan didin. Yanê tu işareteke morfolojik an jî fonolojik tune ku nîşan bide ka gelo “heval” navdêreke nêr e an mê ye. Lê mesela di Zazakî de ev işaret hene. Bêjeya “heval” an jî “embaz” ji bo hevalên nêr û bêjeya “hevale” an jî “embaze” jî ji bo hevalên mê tê bikaranîn (Malmîsanij, 2015: 67; Gruba Xebate ya Vateyî, 2013: 23; Bîngol, 2020). Dîsa Kerîmî (2019: 7) jî wek terîfa Haig (2000) û Haig û Öpentin (2014) terîfekê ji bo navdêrên cotzayend bikar anîye. Lê ew bêjeya *navdêrên mobil* li navdêrên cotzayend kirîye.

Navdêrên cotzayend yan jî yên referansî her wekî me li jor got, divê pêşî li bin du gruban werin senfiandin; (1) Navdêrên însanan û (2) Navdêrên heywanan. (1) Navdêrên însan, her wekî behsa wê hatibû kirin disa li bin du gruban dikare were senifandin: (a) yên navdêr û (b) rengdêrên wek navdêr têne bikaranîn. (a) Yên navdêr bi piranî ji bo navê pîşeyan têne bikaranîn wek, *doxtor, xwendekar, mameste, karmend* hwd. ev navdêr jî di nav xwe de dibin du grub;

229

(I) navdêrên ku bi giranî refereyê zayendekê nakin

(II) navdêrên ku bi giranî refereyê zayendekê dikin.

Ji bo gruba (I); mesela, navdêra “heval” bi giranî refereyê zayendekê nake loma jî li gor navdêra refere dike zayenda xwe hildide. Wextê kesê refere lê tê kirin jin be wek “hevala min” û wextê kesê refere lê tê kirin mîr be wek “hevalê min” tê kişandin. Wextê zayenda refere lê tê kirin nedîyar be wê çaxê di nav çarçoveya nértîya gelenper (generic masculines)⁵ de wek nîr tê kişandin. Ji bo gruba (II) jî navdêrên “hemşîre” û “seyda” dikare wek mînak were dayîn. Her çiqas mîr jî bikaribin bibin “hemşîre” û jin jî bikaribin bibin “seyda” lê wextê ev navdêr têne bikaranîn bi piranî li gor wê zayenda bîyolojîk têne kişandin ku ew zayend vê pîşeyê bi giranî dike. Derbarê vê de McConnell, Cinet (2011: 11) dibêje, pîşeyen ku bi giranî jî hêla mîran ve dihatine kirin lê niha jî hêla jinan ve

⁴ Bêjeya cotzayend di bêrehemên behsa wan hatî kirin de wek “common gender” (zayenda gelenper), “double gender” (cotzayend), “multiple gender” (pir zayend) hatine dayîn. Em ê di vê xebatê de ji bo van bêjeyan “cotzayend” bikar bîniin.

⁵ Nîrtîya Gelenper (generic masculines) ew tişt e ku wextê navdêreke cotzayend an jî cînavkeke rîkkeftina zayendî li ser tê xwîyanê (wî, wê, vî, vê) navdêrek nîşan bide ku zayenda wê nayê zanîn, wê çaxê ev navdêra cotzayend an jî cînavk wek nîr tê kişandin. Wek; “Zaroka kurd, kurd e. Diya wî kurd e, bapîrê wî kurd e (Haig, Öpentin, 2014a: 9).

jî têne kirin, dibine sebebê tevlihevîyê di zayenda kesa/ê referebûyî de. Dîsa Haig û Öpentin (2014) ji bo nav navdêrên bi zayendeke bîyolojîk ve zeliqîne bêjeya “termên yekzayendî” (gender exclusive terms) bikar anîne. Mînakeke ji bo van navdêran di kilama Şakiro ya bi navê “Sînem” de derbas dibe ku wuha ye;

Lewra tu şêxê min î ez mirîdê te me,
Tu seydayê min î ez suxtayê te me (Şakiro, Sînem Heyran)

Li vê derê kesê kilam dibêje mîr e û xîtabê jinekê dike û ji jinikê re dibêje “tu şêxê min î” û “tu seydayê min î”. Her çiqas di van hevokan de bêjeyen “şêx” û “seyda” refereyê jinekê bikin û divê rîkkeftineke mî nîşan bidin jî, lê rîkkeftin bi awayekî nîr e. Ji ber ku pîşeyen şêxtî û seydatiyê ji hêla mîran ve bi giranî têne kirin, loma jî her çiqas kesê refere lê hatî kirin jin be jî rîkkeftina nîr hatiye bikaranîn.

Gruba duyem ya navdêrên însanan yên refereyê du zayendant dikin jî ew navdêr in ku eslê wan rengdêr in. Mesela, delala/ê min, şerê/a min, kevoka/ê minhwd. Zayenda van navdêran jî li gor sîstemekê dîyar dibe. Kesa/ê ku refere lê tê kirin eger were zanîn jixwe li gor wê tê kişandin. Mesela;

Nenas û xerîbê welatan ez im
Pepûkê serê koh û latan ez im (Tîrêj, 2015: 31)

230

Her wekî di vê rîzika Seydayê Tîrêj de tê xwîyanê, bêjeya “pepûk” hem dikare refereyê navdêreke nîr hem jî navdêreke mî bike. Lî di vê derê de Seydayê Tîrêj bi vê bêjeyê ve xwe nîşan daye. Loma jî rîkkeftina nîr pêk hatîye.

Lê eger kesê refere lê tê kirin neyê zanîn wê gavê yan li gor nîrtîya gelempar tê kişandin, yan jî li gor taybetiya rengdêrê tê kişandin. Ji bo nîrtîya gelempar em dikarin vê mînakê ji helbesta Feqîyê Teyran ya bi navê “Ey Av û Av” bînin;

Bê rahet û bê sekne yî
Yan ‘aşiqê baxwê xwe yî?
Yan Şubhetê Qelbê me yî
Ji işqa kê natebixî (Sadinî, 2011: 111)

Dî vê çarînê de bi bêjeya “aşiq” ve tişa tê qestkirin esas av e û zayenda bêjeya “av”ê mî ye. Lî di çarçoveya nîrtîya gelenper de bêjeya “aşiq” wek nîr hatiye bikaranîn.

Ji bo taybetîya rengdêrê ev dikare wek mînak bê dayîn; eger em bêjeyen “egîd” û “delal” bi awayekî kesê/a refere lê tê kirin neyê zanîn bikêşin wê wiha be;

Li vî welatî egîd pir in. Elbet *egîdekî* wê rastê te were.

Li vî memleketî delal pir in. Elbet tu yê evîdarê *delalekê* bibî.

Di van mînakan de navdêrên “egîd” û “delal” ku eslê xwe de rengdêr in, bi giranî ji bo kîjan zayendê hatine bikaranîn bi wê zayendê re rîkkeftinê danîne. “Egîd” bi piranî ji bo kesen egît û mîr tê bikaranîn loma jî wek nîr û “delal” jî ji bo kesen xweşik ên jin tê bikranîn loma jî wek mî haftîye bikaranîn.

Zayenda navdêrên cotzayend yên heywanan bi du awayî dîyar dibe. Yan zayenda wê navdêra cotzayend ya ku refere lê tê kirin dîyar e û li gor wê tê kişandin, wek, “kera me” ji bo kera mî û “kerê me” ji bo kerê nîr tê bikararanîn; yan jî zayenda wê navdêrê ya ku bi navdêra cotzayend ve tê işaretkirin nayê zanîn. Di vê rewşa duyem de zayenda van navdêran bi wan kirîteran ve têne dîyarkirin ku ji bo navdêrên nejîndar têne bikaranîn.⁶ Mesela, wextê zayenda “şêr” û “kevok” neyê zanîn û di nav hevokekê de werin bikaranîn, lewra çîma “şêr” hêzdar e, loma jî wek nîr tê işaretkirin; wek “şêrê wehşî” û çîma “kevok” hessas û rindik e, loma jî wek mî tê işaretkirin “kevoka li ser darê”.

Tablo 3: Sîstema Referansî ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Navdêrên Însanan	Navdêr	Navdêrên bi giranî refereyê zayendekê <i>nakin</i>	Zayenda navdêrê tê zanîn	Li gor zayenda referans lê tê kirin	Hevalê min Hevala min
			Zayenda navdêrê nayê zanîn	Li gor nîrtîya gelenper	Hevalê min Doxtorê min
			Navdêrên bi giranî refereyê zayendekê <i>dikin</i>	Zayenda pîşeyî	Seydayê min Sînem e. Hemşîra min Elî ye.
		Navdêrên ji rengdêran hatî çêkirin	Zayenda navdêrê tê zanîn	Nîrtîya Gelempar	‘aşiqê baxê xwe ...
			Zayenda navdêrê nayê zanîn	Li gor zayenda navdêrê Li gor taybetiya rengdêrê	Egîdekî Delalekê
		Navdêrên Heywanan	Zayenda navdêrê tê zanîn	Li gor zayenda navdêrê	Kerê me Kera me
			Zayenda navdêra referebûyi nayê zanîn	Krîterên zayendê yên navdêrên nejîndar	Şêrê jêhatî kevoka xweşik

231

Di vê tabloyê de senifandina zayenda navdêrên referansî hatiye kirin ku li jorê bi hurgili behsa wê hate kirin.

⁶ Li jêrê wê bi berfîrehê behsa van kirîteran were kirin.

c. Benda Cudabûyîna Zayendê

Di gelek zimanên xwedîzayend de navdêrên jîndarên biçûk wek “derguş” û “heywanêن biçûk” muemela zayendî ya navdêrên din yên jîndar nabînin. Mesela di zimanê Zandeyê de, navdêrên mîrân nîşan didin nîr û yên jinan nîşan didin jî mî têne işaretkirin. Lî ji bo zarakan wê zayendê bi kar tînin ku ji bo zayenda heywanan tê bikaranîn (Corbett, 1991: 14-15). Gelo heta çendsalîyê zayenda navdêrên însanên biçûk û heta çiqas mezintîyê zayenda navdêrên heywanêن biçûk di nav senifêن însan û heywanêن mezin de nayê senifandin? Bersiva vê pîrsê li gor civatan diguhere. Ji bo vê benda dîyarbûna zayenda navdêrên jîndar bêjeya “benda cudabûyîna zayendê” (threshold sex-differentialability) tê bikaranîn.

Ji bo “benda cudabûyîna zayendê” dibe ku ji Almanî jî mînak bê dayîn. Mesela, bêjeya ‘Mädchen’(Keçik) her çiqas navdêreke jîndarên mî be jî û divê zayenda wê mî be, lî zayenda wê notr e. Lî hin caran wek mî jî tê bikaranîn. Braun û Haig (2019: 2) vê rewşê bi faktora , ‘emir ve terîf dîkin. Yanê eger “Madchen” (Keçik) ji bo keçikêni bi emir biçûk were bikaranîn wek notr û ji bo keçikêni mezin were bikaranîn wek mî tê bikaranîn.

Di Kurmancî de “benda cudabûyîna zayendê” heye. Ev bend hem di navdêrên însanan de hem jî yên heywanan de heye. Ji bo navdêrên însanan bêjeya “dergûş” dikare wek mînak were dayîn. Di kilama Şakiro ya bi navê “Ferzende Beg” de ji bo vê rewşê mînak heye,

Asyayê digot Besrayê dardayê *dergûşa* milê te *lawîn* e
Tu bi destê *Elfesya* bigrê jî navê derkeve here. (Yıldız û Taşkin, 2018: 72; Şakiro, Ferzende Beg: 4.38-4.41)

Di vê dere de her çiqas “dergûş” lawîn yanê kurik be jî lî “dergûş” wek mî hatîye kişandin. Dîsa navê dergûşê “Elfesya”ye ku ev nav navê mîrân e.

Hin navdêr hem ji hêla leksîkî ve hem jî ji hêla rîkkeftina zayendî ve her çiqas di nav sînorêن zayendekê de bin jî dikarin bi firehbûna meneyê ve ji bo zayenda din jî bêne bikaranîn. Her çiqas di Kurmancîya standart de ev rewş tîne be jî, bi taybetî di devoka Bohtan⁷ de mînakeke bi vî awayî heye. Mesela, bavek dikare ji keça xwe re bêje “kurê min”. Di vê derê de bêjeya kur hem ji hêla leksîkî ve û hem jî ji hêla rîkkeftinê ve nîr e lî kesa refere dike mî ye. Sebebê vê bi me berfirehbûna me’neya bêjeya nîr a “kur” ber bi bêjeya cotzayend “ewlad” ve ye. Lî wextê me’ne fireh bûye, zayenda bêjeyê neguherîye.

Dibe ku *benda cudabûyîna zayendê* ne tenê ji bo navdêrên însanan lî ji bo navdêrên heywanan jî wek krîterek derkeve pêşberî me. Bedir Han û Lescot (2005: 65) wiha dibêjin; gelek navdêrên heywanan wek nîr û mî têne senifandin. Mesela “rovî” û “şêr” nîr lî “kew” û “qijik” mî ne. Di dîyarkirina

⁷ Li gor axêverê Behdînî Şehmûz Kurt di devoka Behdînî de jî ev rewş heye.

zayenda navdêrên hewanen de biçûkbûn û mezinbûn jî krîterek e. Krîterên heywanêن mezin li jorê hate behskirin, Heywanêن biçûk jî lewra işaretên derbarê zayenda wan ya bîyolojîk kêm in, yanê ji şiklê wan nêrîti an jî mîyîtiya wan nayê fêmkirin loma jî heywanêن ji aliyê girseya xwe ve biçûk in bi piranî mî têne qebûlkirin. Lî di vê xususê de tiştekê heye ku divê bête zanîn, hin heywanêن biçûk ji ber hin krîterên din dikarin têkevîne nav senifa navdêra nêr. Di vê rewşê de krîtera serêkvebûna (overlapping) dibe sebep ku ev navdêr nêr bêne qebûlkirin. Mesela, “mişk” her çiqas mî be jî “mişkê kor” wek nêr tê qebûlkirin. Lewra, “mişkê kor” heywanek zerardar e û lewra tiştên xeternak nêr in, loma jî ew nêr têne qebûlkirin.

2.1.2. Dîyarkirina Zayenda Navdêrên Nejîndaran

Di zimanên xwedîzayend de pêvajoya dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran li gor navdêrên jîndaran zehmettir e. Her wekî lêkolînerên wek Haig (2000: 11), Haig û Öpentin (2014: 60-61) û Blau û Barak (1999: 31) gotine dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran di Kurmancî de pêvajoyeke tevlihev e. Li gor wan zayenda gelek navdêrên nejînadaran yên Kurmancî li gor sistematîkekê nikare were dîyarkirin.

Xebatên li ser dîyarkirina zayanda navdêran di Kurmancî de bi piranî li ser navdêrên jîndaran hatine çekirin. Xebateke ji xebatên herî girîng û ya ewil ya li ser dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de xebata Emir Djaledet Bedir Khan û Roger Lescot ya bi navê “Grammaire Kurde (Dialecte Kurmanji)” ya di sala 1971an de çapbûyî ye. Di vê xebatê de hem li ser dîyarkirina zayenda navdêrên jîndaran û hem jî li ser yê nejidaran sekinîye. Dîsa, Kurd (2011) bi awayeke berfireh lê ne bi awayeke sistematîk li ser vê mijarê sekinîye.

Di vê beşê de wê krîterên dîyarkirina zayenda navdêrên nejîndaran yên di zimanên dinde hatî qebûlkirin bo Kurmancî jî bê tetbîqkirin. Ev krîter li bin heft serenavan kom bûne.

- Hişkahî û Bihêzbûn:** Hişkahî û bihêzbûn di zimanen de krîtereke dîyarkirina zayenda navdêran e. Mesela di zimanê Objibwayê de ev kirîtereke gelek girîng e. Dîsa ji hêz û hişkahîyê ci tê fêmkirin ew jî girîng e (Corbett, 1991: 21). Ev fêmkirin li gor nêrîna heyatê ya wê civatê diguhere. Di Kurmancî de jî ev krîtereke girîng e. Navdêrên hişk û bihêz nêr in û yên nerm û bêhêz mî ne. Mesela, *kevir, zinar, demir, çiya, hestî, şer, hwd.*” navdêrên hişk û bihêz in lewra jî nêr in lê *xwelî, hirî, çemûr, ax, xezal, hwd.* jî navdêrên nerm û bêhêz in loma jî mî ne.
- Tiştên Erêni (Tiştên Bifayde):** Di Kurmancî de tiştên li gor civata Kurmancan wek erêni têne dîtin nêr û yên neyîmî têne dîtin jî mî ne. Mesela, berhemên ji heywanan têne destxistin wek tiştên erêni dikarin bêne terîfîkirin. Wek mînak, *şîr, mast, rûn, dew, to, penêr, goşthwd.* Ji bo tiştên

neyînî jî tiştên neyînî yên ji heywanan dertên dikarin wek mînak bêne dayîn; mesela, *rêx*, *bişgul*, *mîz*, hwd. Eger were pirsin, “gû” navdêreke neyînî ye lê çima nêr e? Bersiva wê bi krîtera “serêkvebûn”ê (overlapping) ve dikare were vegotin. Ev bêje her çiqas tişteke neyînî be jî di Kurmancî de bi piranî ji bo sixêfan tê bikaranîn. Ev rewş jî meneyeke hêzdarîyê li vê bêjeyê zêde dike ku li jorê hate gotin navdênen hêzdar nêr in. Di encama serêkvebûna van herdu krîteran de krîtera duyem ya hêzdarbûyînê li ser ketiye. Loma jî wek nêr hatiye qebûlkirin.

3. **Bilindahî:** Tiştên bilind û mezin di Kurmancî de nêr û tiştên çal û biçûk mîne (Bedir Han û Lescot, 2005). Mesela, *çiya*, *zozan*, *kaş*, hwd. mezin û bilind in loma jî nêr in û *deşt*, *çal*, *newal*, *herq*, *morîstang*, hwd. jî çal, rast û biçûk in loma jî mîne.
4. **Perçe û Tevhî:** Têkilîya perçe û tevhîyê di gelek zimanî de xwe wek krîtereke dîyarkirina zayendê nîşan dide. Mesela di Almanî de navdêren navê gruban nîşan didin dibin notr û navdêren di nav wê grubê de ne mîne. Wek mînak, “Instrument” (enstiruman) notr e lê “guitarre” (gitar) mîye. Dîsa, “Obst” (Meywe) notr e lê “Apfel” (sêv) mîye (Corbett, 1991: 84). Ev rewş di Kurmancî de jî heye. Navdêren navê grubê nîşan didin nêr in lê navdêren endamên an jî perçeyêن vê grubê ne, ew jî mîne. Mesela, bêjeya “wext” nêr e lê bêjeyêن “roj, şev, esir, sibe, duşem, payız, zivistan, sal”, hwd. ku perçeyêن grubâ “wext” ne ew jî mîne.⁸ Dîsa, bêjeya “bajar” nêr e lê endamên vê grubê yêن wek “Dîyarbekir, Mûş, hwd.” mîne. Dîsa “welat” nêr e lê “Kurdistan, Tirkîye, Almanya, Iraq, hwd.” mîne. Malbata gîyayan jî dikeve nav vê grubê. Jina Kurd (2001) dibêje; “Gîya jî malbatek heye, û gîha bi xwe serokê wê malbatê ye, zayenda gîyê nêr e. Lê gîyagelaşen mirov an ajel wan dixwin, zayenda wan mî hatîye; vê tuzikê, vê pûngê, vê sebanixê, ...”.
5. **Xeternaktî:** Di Kurmancî de navdêren xeternak nêr in. Her wekî li jor behsa wê hatibû kirin hin navdêren heywanan li gor krîteren navdêren nejîndar têne dîyarkirin. Mesela, “mişk” her çiqas biçûk be jî çima “mişkê kor” tişteke xeternak e ji bo çandîniyê loma jî wek nêr hatiye senifandin. Dîsa, “mêş” mîye lê çima “moz” xeternak e wek nêr hatiye senifandin. “Cin”, “şeytan” çima tiştên xeternak û xirab in loma jî wek nêr hatine senifandin. Ev rewş di zimanên Ojibwa û Dyirbal de jî heye (Corbett, 1991: 24-25).
6. **Bêjeyêن Dînî û Mîtolojîk:** Bêjeyên mitolojik di civatê de li gor rola hilgirtîye ser xwe tê senifandin (Corbett, 1991: 16). Ev rewş di Kurmancî

⁸ Di hin devokan de hin caran bêjeya “wext” an jî hem me’neyen wî “dem” “zeman” wek mî jî dikarin werin bikaranîn. Sedemê vê ew e ku “wext” û hem me’neyen wî eger bi me’neya gelenperî de were bikaranîn wek nêr tê bikaranîn lê eger di me’neyeke taybet de were bikaranîn wek mî tê bikraranîn. Mesela, “wextê wê derbas bûye” di vir de wext ne dîyar e loma nêr e lê “wexta tu hatî em çûn” di vê derê de jî wext dîyar e.

de jî heye. Mesela, *Xwedê, pêxember, reb, ruh, qelb*, hwd. nêr in û *merhemet, riza*, hwd. jî mî ne.

7. **Têkiliya Tasawurî:** Li gor vê krîterê eger navdêrek bi navdêreke din re di nav têkiliyeke bihêz de be wê gavê zayenda wê navdêrê distîne. Di Kurmancî de jî ev krîter heye. Mesela, kincênu ku însan li xwe dikin çima bi însana re eleqedar in loma jî nêr in, wek, *kinc, pantolon, şal, işlik, atlêt, kîlot*, hwd. Di vê mînakê de her çiqas krîtera perçê tevahî hebe jî, yanê kinc wek navê grubê û nêr, û endamên vê grubê wek *cakêt, işlik, atlêt*, hwd. jî wek mî divê were senifandin jî, lê ji ber krîtera serêkvebûnê krîtera têkiliya tasawurî ji ya perçê tevahî girantir hatiye. Dîsa bêjeya “şar/şarpe” çima bi jinan re ji hêla tasawurî ve di nav têkiliyeke zexm de ye loma jî mî ye. An na ew jî wek cureyên din yên kincan divê nêr biba.

Dîyarkirina zayenda navdêran di Kurmancî de bi giranî bi krîterên me’neyî ve têne kirin. Ji bo vê jî pêşî navdêr li bin du besan têne senifandin; navdêren jîndaran û yên nejîndaran. Navdêren jîndar wek yên nêr, mî û yên cotzayend têne senifandin. Navdêren nejîndaran jî wek nêr û mî têne senifandin. Yên nêr li gor krîterên pozitîf; yên mî li gor krîterên pozitîf û li gor krîtera bermayîyen me’neyî ve yên din ve têne senifandin. Eger di tabloyekê de ev sîstem bê dayîn wê wiha be;

Tablo 2: Di Kurmancî de Sîstema Dîyarkirina Zayenda Navdêran bi awayekî Me’neyî ve

235

Navdêren Jîndaran						Navdêren Nejîndaran		
Nêr		Cotzayend		Mê		Nêr	Mê	
Însan	Neînsan	Însan	Neînsan	Însan	Neînsan	Krîterên Pozitîf	Krîterên Pozitîf	Bermayîyen Me’neyî
Sinan, xalo, bira, ...	Beran, dîk, nêreker, ...	Heval, doxtor, seydâ, ...	Gurker, kew, ...	Elîf, xaltî, xwişk ...	Mih, Mirîşk, manke r, ...	çîya, penêr, dest, ...	deşt, ax, mês, ...	radyo, internet, organîzasyon, ...

Wextê ev krîterên li jorê li navdêrekê bêne tetbîqkirin û dîsa jî zayenda navdêre bi awayeke rast dernekete pêşberî me, wê çaxê yan ev navdêr bi awayeke morfolojîk tê dîyarkirin an jî di dewreke dîrokê ya nedîyar de wê navdêre zayenda xwe ji ber hin sedemên nayêñ zanîn guherandiye.

2.2. Sîstema Morfolojîk ya Dîyarkirina Zayenda Navdêran

Di dîyarkirina zayenda navdêran de li pey taybetiyêne me'neyî yên navdêran, rîya duyem ya dîyarkirina zayenda navdêran taybetiyêne şîklî yên navdêran e. Ev jî li bin du serenavan tê nirxandin; taybetiyêne morfolojik û yên fonolojîk. Taybetiyêne fonolojîk di dîyarkirina zayenda navdêren Kurmancî de xwedîyê tu bandorê nînin (Haig û Öpentin, 2014a: 4). Loma jî wê tenê li ser taybetiyêne morfolojîk bê sekinîn.

مەستى ئەفەندى ئەو ماۋەيەي کە بەریوبەرى مەعاريفى موسىل بۇوه، ئامىرىكى راکىشانى ئاوى دروست كردووه كە بى ھەوا و بى ھەلم كار بکات، بەلام نرخيان بۇ داھىنائەكەى دانەنا (زىكى، 2005: 218)، ئەگەر چى پېشتر ناوبر او له فەنسىيەوە ھەندى شتى وەرگىرابۇو، ئەم فەنسىزانىنە و شارەزابۇونەي لە بوارى زھويناسى و فيزىيا، واى كردووه كە دەولەمت ئەم مەتمانەيەي لا دروست بى كە ناوبر او شىاۋى ئەمەيە تاقىكارىي زانسىت دەست بى بکات. لە بەلگەنامەكدا كە مىزرووى 1317/7/27 كۆچى بەسەرھو، مەكتۇوبى قەلمەمى سەدارەت نۇوسراوى بۇ وزارەتى بەحرىيە كردووه و ئاماژەي بەھو داوه كە رەسۋول مەستى ئەفەندىي بەریوبەرى پېشىۋى مەعاريفى موسىل بۇ ئەمەيە تاقىكرىنەوە لەسەر ئەمە بکات بەھۆى ھەواوە ئاو لە قولايىھەكانەوە دەربەيىنى، پىویستى بەھۆيە شەش مانگ لە پارىس بىئىنەتەوە. وزارەتى تىجارەت و نافىعەي دەولەتى عوسمانىش ئاگادارى داھىنائەكانى ئەمە و بە نۇوسراوى رەسمى ئەمەي راگەياندۇوه(BEO.001410.105708.001). داھىنائەكەى مەستى ئەمە بۇو لەو سەردىمەدا كەوتىبووه فکرى ئەمەي ماكىنەيەكى ئاوى، كە لە ژۇورۇو 43 مەتر ئاوى ھەلدەنجا بەمېتى ھېزى ھەوا و ھەلم. لەم ئىختىرا عەتمەدا بەتەواوى سەركەمەت بۇ فرۇشتى لە رېڭەي مىسرەوە چوو بۇ

پاریس، هەشت مانگان لھوی و مانگیکیش لە قیەننا مايموه و گەرايموه ئەستەنبول (موکریانی، 2019: 348).

لە نامەکدا مەستى ئەفەندى كە لە رېكھوتى 11 ئى تشرىنى يەكمى سالى 1315 ئى رۆمى كە دەكاتە 1899/10/23 ميلادى، بۇ سولتانى عوسمانى نووسىيە و تىيدا باسى لە داهىنانەكە خۆى كردۇوه و تىيدا كارەكە بە شىۋەيەكى زانستىي روون كردۇتهوه و لەگەل ئەوشدا باسى ئەھوھى كردۇوه كە دوو سال لەھو پېش ئەھ پۈزۈھەي پېشکەشى دولەتى فەرەنسا كردۇوه و دىارە ئەوش پېۋىستى بە پىنج سەد لیرە ھەبۇوه و نەبىووه و گەراوەتموھ ئەستەنبول. ئىستاش بۇ ئەھى داهىنانەكە بىننەت دى پېۋىستى بە مانھوھى شەش مانگە لە پاریس و خەرجىي رېيگە و پارەي مانھوھى. (BEO_001440_107944_002_002) دواتر لەگەل نووسراوەكەدا وينەي بەدەستكىشراوى ئامىرى ھەلکىشانى ئاوىشى ھاوپىچ كردۇوه (BEO_001440_107944_003_001). دواتر چەند نووسراوېك لەسەر ھەمان بابەت نووسراون و ڕەزامەندى لەسەر ھاوكارىكىدى دەرىپەراوه.



مهستی ئەفەندى دواى نەمانى لە بەریو بەرايمەتى مەعاريفى موسىٰ (بە چەند سالىك، چۆته ميسىر و موددەتىك تىا دانىشتووه و بە جەوهەر و سەعى خۆى فيرى زمانى فەرنگىش بۇوه و سياحەتىكى لە ئەمۇرۇپادا كردۇوه)(زەكى بەگ، 2005: 181). ئەو داهىنائى لە بوارى راکىشانى ئاودا كردىبوسى لە نىشتمانى خۆيدا كەس نەزىخ نەزانى، بۆيە چووه ميسىر و داهىنائىكە بۇ خەبىيۇ عەباس حىلىمى¹⁰ پاشاي ميسىر خستەرۇو، بەلام لمۇيش شىتكى بەدەست نەھىنا(الكردى، 2008: 200). هەرۋەھا بۇ دروستكىرنى ئەم داهىنائى لە رېيگەمى ميسىرەو چووه پارىس و ھەشت مانگان لەۋى و مانگىكىش لە قىھىننا مايەوە و گەرەيمەو ئەستەنبول. مەستى بە دوايدا كەوتىبووه سەر خەيالى داهىنائى ئەمەرەي زەوی ھەممىشە رەوناك بى و تارىك نەبى (موكىريانى، 2019: 348)، بۆيە ھەممىشە لە ھەمۇل و گەراندا بۇوه بۇ بەدەستخىستى پشتگىرى، ئەم سەھەرەنەشى لە بەلگەنامەكاندا دەبىزىن. بەگۈرەي بەلگەنامەمەك، وەكىلى خەبىيۇ ميسىر لە 1315/6/9 كۆچى بۇ وەزارەتى ناوخۆى نازدۇوه، ئەمەرەي ڕەونون كردىتەمە كە ماۋەيەك لە مەدرەسەيەك ماۋەتەمە و دواى ئەمەرەي فەرمانى ئاڭاداركەردنەمە ئىيە هات، بۇ ئاڭاداركەردنەمە ئەم، زانىمان كە ناوبر او ميسىرى بەجى ھىشتووه و چۆته پارىس (1315/6/29) كۆچى نووسراو بۇ وەزارەتى مەكتەپ دەكتات و ئەم زانىارىيەنە بۇ ھاۋىپىچ دەكتات (DH.MKT.02086.00001.002).

4.2.7.3.2 دووبارە داواى گەرانەمە سەر كارى دەولەتى

ھەر لەم ساوهى كە مەستى ئەفەندى لە كار دوورخراوەتەمە، ناوبر او لە رېيگەمى جۆربەجۆرەوە ھەمۇلى ئەمەرەي زۆر بەلگەنامەكانى كارەكەي، بۇ ئەم مەبەستەش نامەي پشتگىرى لە چەند دام و دەزگایەكى جۆربەجۆرەوە ھىنناوە. لە دۆسىيەكى نىيۇ بەلگەنامەكانى عوسمانىدا 18 لەپەر تايىەت بەم باپەتە ھەمە، تىيىدا نووسراونىك ھەمە زۆر پەسىنى مەستى ئەفەندى تىدا ھاتۇوه و ئاماژە بەمە دراوه كە ناوبر او خاۋەنی فەزىل و كەممالە و خزمەتىكى زۆرى لە

¹⁰ خەبىيۇ عەباس حلى (1874-1944) كورى توفيق كورى ئىسماعىلە، لە قاھىرە لەدایك بۇوه و لە سوپىسرا كۆچى دوايى كردۇوه. بە خەبىيۇ عەباس حىلىمى دووم بەناوبانگ بۇوه. خەبىيۇ ميسىر و شەشەمین حاكمى بنەمەلەي مەممەد عەلەي پاشا بۇوه. لە نىوان سالانى (1892-1914) حاكمى ميسىر بۇوه و نازناؤى شىخ بۇوه. دواتر چۆته ئەستەنبول و پاشان لە ئەمۇرۇپا سەرى نايەوە. (السىد، 1990: 186)

مهکتبی ئامادهیهکان کردووه و سوپاس و پیزانینی زۆرى مامۆستاييان و دەستەي کارگىرېي ئەم مەكتەبانه ھەمە دەرھەق بەمۇ، ناوبر او داواکاريي گشتى له ئەستەنبول سەبارەت بەمۇ سەتمەمى كە لىنى كراوه ئاگادار كردۇتەمۇ، تەنانەت دوولەت ئاگادار بۇوه كە ناوبر او چۆته ميسىر و دواتر چۆته پاريس ئەم كاتىش وەزارەتى دەرھەق ئاگادار بۇوه. ئەم وەزيفەكەي خۆى زۆر بە باشى جىبەجى كردووه و رۇلۇكى باشى كىراوه له بەرھۇپىشىرىدى مەعاريف لە ويلايەتكەدا (SD.02179.00014.005). هەر لەم بارھە ئەبوبەكر حازم والىي موسىل نووسراوىكى لە 16ى صەھىرى سالى 1319 ئى كۆچى بۇ وەزارەتى مەعاريف كردووه و تىبىدا زۆر بە دور و درېزى، بە باشە وەسفى رسوول مەستى ئەفەندى كردووه و باسى ئەم پىشكەوتانەي ويلايەتكەي كردووه له بوارى مەعاريفدا ھەمۈرى لە شان وشكۇ و شارەزايى و ماندۇويي مەستى ئەفەندىدا زانىوھە (SD.02179.00014.006).

وا دياره دواي چەند سال لەسەر لەكاردۇرخستەمەنەي مەستى ئەفەندى، ناوبر او ھەولى ئەم دەدا بىگەرەتىمۇ سەر كاركەي، دواي ئەمەي شوراى دوولەت بىتاوانىي ناوبر او بە بىيارىك سەلماند، وەزارەتى مەعاريف لەبىر پىویستىي شارەزايى ناوبر او بۇ مەعاريفى ويلايەتى دياربەكر، بىيارى ئەم دەدات كە دووباره ناوبر او بىگەرەتىمۇ سەر وەزيفە و لە بەلگەنامەيەكدا وەزىرى مەعاريفى گشتى بۇ سەدارەت نووسراوىك دەنۈسى و داواي رەزامەندىي بابى عالى دەكات بۇ دووباره دامەزراىندەمەنەي رسوول مەستى ئەفەندى لە ويلايەتى دياربەكر، كە پىيى وايە مەستى ئەفەندى لە ئەربابەكانه و شاياني ئەم خزمەتىي، بۇ يە پىشىنيازى ئەمەيان كردووه بە مۇوچەي مانگانەي 1800 قەرووش لەم بەرئۆبەر ايەتىيە دامەززى. ئەم نووسراوەش مېزۇوى 1319/12/30 ئى كۆچى بەسەرەمەدە (BEO 137627 - 1836). هەر لەنئىو ئەم دۆسىمەيدا و لەم فۆرمەي كە تايىەت بۇوه بە لەكاردۇرخراوەكان و ناوبر او پىرى كردۇتەمۇ، لە بىرگەي ھۆكاري لەسەركار لادانى ئاماژە بەمۇ دەكات كە ماوهى سى سالە بى كاره و لە كارى خۆى دوورخراوەتەمۇ و داوا دەكات كارىكى پى رەوا بىبىن.

لە بەلگەنامەيەكى تردا ديار دەبىت كە هەر يەك لە بەرئۆبەر مەعاريفى موسىل رسوول مەستى ئەفەندى و بەرئۆبەرانى مەعاريفى دياربەكر و سیواس داواي دووباره گەرانەمە سەر كار دەكەن. ئەم بەلگەنامەيەش

میزرووی 1325/1/8 کۆچی لەسەر نووسراوه (- MF.MKT. 979 .(24)

4.2. خیزان و مندالەکانی

ئەمەی دەزانىرى دوو له كورىكىنى رەسول مەستى ناويان رەشید مەستى و عەبدولەمەجید بەرقى (1878-؟¹¹) بۇوه، يەكمىان سەردەمیك بەریوەبەرى شار موانيي سلیمانى بۇوه. (بابان، 2012: 182) ئەمە دوومىان له دەولەتى عوسمانىدا فەرمانبەر بۇوه و بەلگەنامەمەكى زۆر لەبارەيەوە هەمە. هەرچى سەبارەت بە ژن و كچەكەمەتى، له بەلگەنامەكاندا ناوی خیزانەكەى بە خەدىجە و ناوی كچەكەى بە عەتىيە دەھىنرى. له بەلگەنامەمەكادا كە میزرووی 1327/5/27 کۆچى لەسەر نووسراوه، باسى ئەمە دەكتە كە عەتىيە كچى و خەدىجە خیزانى خوالىخوشبوو رەسول مەستى مووچەكەيان له وىلايتى موسىلەوە بدرىتى، لەسەر بىنچىنە لىستى خانەنشىنەكەى كە 435 قىرووشە. ئەم نووسراوه ھى وزارەتى كاروبارى خانەنشىنەيانە و میزرووی 12 ئى جەمادى يەكمى سالى 1327 بەسەرەوەيە (SD.01094.00014.001).

263

5.2. كۆچى دوايى

بە روونى رۆز و مانگى كۆچى دوايىكەى مەستى ئەفەندى لە سەرچاوەكاندا باس نەكراوه، له بەلگەنامەمەكادا كە میزرووی 1325/12/5 کۆچى لەسەر

¹¹ عەبدولەمەجید بەرقى كورى رەسول مەستى له بەكەكانى كورده و له سولالەي چوتانى يە. سالى 1289 كۆچى، بەرامبەر 1873-1872 ميلادى لە وىلايتى موسىلەدایك بۇوه. له مەكتىبى روشنىيە سلیمانى خويىندۇرۇپەتى و دەرسەكانى تەعوا كەدووە بەلام نەيتوانىو بروانامە وەربگرى. له وىلايتى موسىلە مەكتىبى دۆمىنەكەن و فەرنىسييەكەن خويىندۇرۇپەتى و عمرىي، فارسى، تۈركى و فەرنىسى بە قىسەكىردن و نووسىن و زمانى كوردىشى بەقسەكىردن زانىوە. له سالى 1305 ئىرۇمى چۈتە مەكتىبى فنۇونى مولكىيە و تا پۇلى سى بەرمەمام بۇوه و دواتر وازى ھەتىناوه. واتارى له رۆزئانەمى موسىلەي شارى بۇمباي ھېنەستان بڵاپۇتەمە. له 21 شەموالى سالى 1317 كۆچى كە دەكتە بەرامبەر 1900 بە رۆزانە 20 قىرووش لە دىياربەكر بۇته فەرمانبەر. دواتر بە مووجەمى 1125 قىرووش لە وىلايتى وان، له سەنجاقى ھەكارى لە بېرىۋەبەر ايمەتى تەحريرات دامەزراوه. له 1907/9/17 لە دىياربەكر دەستى لە كار ھەلگەرتۇوە و رۆزى 5 ئى رەھىزانى ھەمان سال لە ھەكارى دەست بەكار بۇوه. ھەر لەپەر لىيھاتووپى و خزمەت باشەكانى لە كارى فەرمانبەردا، له ھەر يەكە لە ئەنچىمەنلى وىلايتى دىياربەكر و ئەنچىمەنلى سەنجاقى ھەكارى سوپاس و بىزىانىنى بۇ تىرىدا راوه. لەپەر شارەزاپونى لە كاروبارى سپاسىدا، حکومەتى مەشروعەتىيە عوسمانى بە گونجاوى زانىوە ناوبرارو لە شارەكانى خوى و سەلمانس بىكانە فەرمانبەرى شابەندەر لە وزارەتى دەر دووه. ھەندى لە بۇچۇنەكانى بۇته جىئى رەخنەي عوسمانىيەكەن، بە گویرە بەلگەنامەكان چەند بەرھەمنىكى نووسىو، بەلام تا تىستا ھېچيان دىار نىن و ناوبرارو لە دواي خانەنشىنېوپەنېشى لەپەر لىيھاتووپى لە كارەكانىدا، رەزامەندى درا لە سەنجاقى سېتۇپ لە 24 ئى تەممۇزى سالى 1329 ىرۇمى لە وىلايتى قەستەمۇونى دەست بەكاربىتەمە. تا سالى 1918 ش لە ژياندا بۇوه و ناشزانىرى كەى و له كۆئ وفاتى كەدەوە (DH.SAIDd.00171).

نووسراوه که دهکاته 1908/1/9 میلادی بەردەوامیی مووجەی خانەشینەکەی ناوبراو جەخت لى دەکاتەوە. كەواتە تا ئەم مىزرووە ناوبراو لە زیاندا بۇوە. پاشان ھەر لەو بەلگەنامەيدا مىزرووی كۆچى دوايىەکەی دیاركەردووە كە لە نەخۆشخانە لە رۆزى 31 تەممۇزى سالى 1324 یەرۇمى بۇوە (MF.MKT.01034.00047.002). ئەم مىزرووە دەبىتە 1908/8/13 میلادى.

3. بەرھەممەكانى رەسوول مەستى:

1.3. كتىبەكانى

سەرچاوهکان باس لە چەند كتىبىكى مەستى ئەفەندى دەكەن، (ئاثارى عىلەمپە و فەننەپەزىز زورە، بەلام ئەھوە مەطبوع و بىنراوه (حوادث عناصر) و (سپر زلزلە) يە) (زمکى بەگ، 2005: 181)، دىارە ھەر ئەم دووانەش لە نىۋ ئەرشىقخانە عوسمانیدا بە چاپكراوى دۆزرانەوە، كۆئى بەرھەممەكانى وەك كتىب بىرىتىن لە:

حوادث عناصر: ئەم كتىبە لە بوارى فيزيايە و باس لە چەند دىاردەيمەكى كەمش و ھەوا و چەند مەسىلەمەكى زانستى وەك بەفر و تەززەر و چەند دىاردەيمەكى تر دەكەت. كتىبەكە 60 لاپەرەيە و لە چاپخانەي عامرە لە ئەستەنبول لە سالى 1290/1873 چاپكراوه. نۇوسەر لە كوتايى كتىبەكەدا ھەر بە زمانى عمرەبى باسى ئەھوە كردووە كە دەكرا ئەم كتىبەكە زۆر لەو قەبارەيە گەورەتە بوايە، بەلام كىشانى وىنەكان زىاتەر لە دە هەزار درەھمى تىتەچۈر و ئەم پارەيەشم لا نىيە، باش بۇو كە دەولەت دوو هەزار نوسخەي لەم نامىلىكەيە چاپ كردو و هەزار و چوارسىد دانەي گەرەندەوە بۇ مەعاريفى دەولەت و چوارسىد دانەيشى دا بە ئىيە و ئىرای ئەھوە حەقى ماندوبۇون و نۇوسىنەكەيىشمان وەرگرت. ئەم كتىبەش لە كتىخانەي ناوەندىي زانكۆي ئەتاتوركى ئەرزەرۇم بە ژمارە 0105198(وينەكەي پارىزراوه).

بۇ پىشەستكەرنەھە ئەم زانيارېيانە سەرەمە، لە بەلگەنامەكانى عوسمانیدا دەربارە چاپكەرنى ئەم كتىبە چەند بەلگەنامەمەك ھەن، گەنگەرەنەن ئەھوەيە لە بەلگەنامەمەكدا كە مىزرووی 1290/8/14 كۆچى پىوهە، وەزارەتى مەعاريف داوا لە چاپخانەي عامرە دەكەت، سەبارەت بە چاپكەرنى كتىبى حوادث عناصر پىويستە دوو هەزار دانە لى چاپ بکەن و 600 دانە بىدەنە نۇوسەرەكە و ئەھوە دەمىننەتەوە لە پارە فرۇشتەكەي خەرجى

چاپهکمی لى بىگىرنمۇه. نووسەر شايانى لوق پىكىرنە و مەجلىسى مەعاريفىش ئەم بېرىارەدىاوه (MF.MKT. 13 - 97).

نامەيەكى دىكەمىيەتى مەعاريف بۇ بېرىومېرىايدەتى چاپخانەمى عامرە لە 1290/11/9 كۆچى ھەمە، تىبىدا داوا لە چاپخانەكە كراوه، كىتىبى حواتە عناصر ناوى ئەم كىتىبى كە چاپ دەكىرى، بېرىار وابۇو وەك پاداشت 600 دانە بىرىتە نووسەر جا بۇ ئەمەنى ناوبر او سوودى لى بىبىنى چونكە ئەم كەسىكى ئەرباب و خاوهن فەزىل و ھونھەر و پېيىستەتى، بۇيە دوو سەد دانەى ترىشى بەندى، دواى ئەمەنى كە چاپخانە 1400 دانەى بۇ دەمەننەتەمۇه، ھەر دانەى بە سى قۇروش بەرۋوشى بە تىكەلى خەرجى چاپەكە كۆدەكەرىتەمۇه (MF.MKT. 16 - 48).

سېر زلزلە: ئەم كىتىبە بە زمانى تۈركىيە و باس لە بۇومەلەرزە و ھۆكارەكانى و زيانەكانى دەكەت و بە شىوهى ھىلکارى چەند لايەننەكى بۇومەلەرزە لە ropy دانستىبىيەوە شىدەكتەوە، تەنانەت بۇ بەرگەتنە لە بۇومەلەرزە و خۆپاراستن لىنى چەند پېشىنەزىك دەكەت ئەم رىسالەتى مەعارف بە ژمارەى 481 لە سالى 1319 لە ئەستەنبول لە چاپخانە ئەختەنەن چاپكراوه. رىسالەكە 48 لايەرەيە. د. بۇح ارسلان تاش تەمواوى مەنتى ARSLANTAS, 2007: 129-168). لە بەلگەنامەيەكدا كە مىزۇرى 1319/4/9 كۆچى لەسەر نووسراوه، ئاماژە بوه دراوه كە رسۇول مەستى ئەمەندى بېرىومېرى پېشىووی مەعاريفى موسى كىتىبى سىر زلزلە چاپ كردۇوه و نوسمەنەكى بۇ مابەينى ھومايۇن جەنابى مولوکانە و سەردىقتەر ناردۇوه (MF.MKT. 570 - 39).

265

تشريح الادراك في تشريح الافلاك: ئەم كىتىبە لە ئەثنای تەھصىلى لە ropy واندۇدا يەكمە ئەتمەرىيەتى (زمىرى بەگ، 2005: 181). بەلام ئەممەشيان ھەر نادىيارە و پېشتر لە چەند بەلگەنامەيەك راستىي ئەم كىتىبە رۇون كراوهتەمۇه.

رسالة اثبات الواجب: ئەم رىسالەتى كەلامە و تا ئىستا نوسمەنە دەست نەكەوتۇوه، ئەم بەرھەمە و بەرھەمىي تەرىجىي الافلاك لە بەرھەمە سەرەتاي ژيانى نووسىنى مەستىيەن و لە بەلگەنامەيەكدا كە مىزۇرى 1276/4/3 ى كۆچى بەرامبەر 1859/10/31 لەسەر نووسراوه، چەند

نووسراویکی ٻہسمی همن، تبیدا ئامازه بهم دوو برمهمه دمکمن و دھولھتی عوسمانی له برمابر ئهو دوو برمهمدا بڑی 150 قرووشی مووچھی مانگانهی بؤ دهپریتمو (MVL. 423 - 18572 ..A).

كتيبياک له باهت ئەندازياريمو: ئم كتييه تا ئىستا ديار نبيه و سوراغمهكمي نازانري، ئموهنده همي بهلگهنايمهك كه مىزورو 1278/2/25 كوچي لمسير نووسراوه، بهشى قەلمى موهيممهئاسەفى نامه بؤ مستefa پاشاي قائيمقامى سليمانى ناردووه و ئوهى باس كردووه كه له زانيانى سليمانى رسوول مسٹي ئەفندى له بوارى زانستى هەندەسمووه ريسالىيەكى داناوه، ناوبراو له داريي ناوچەكە هەزار قرووشى پى بدرى و ئەمەش ڦەزامندى وزارتى داريي لمسير ورگراوه (MKT.UM.. 495 - 94 ..A).

كتيبياک له وەلامى بۇچونەكانى پاپاي ديانەكان: ئم كتييش تا ئىستا ديار نبيه و تمنيا له بهلگهنايمهكدا ئامازه بؤ كراوه، مىزورو 1277/2/29 كوچى كه دەكتاه 16/9/1860 لمسير نووسراوه و ئمو كاته مسٹي ئەفندى له ڦواندوز بووه. بهلگهنايمهك كه له قەلمى موهيممهئاسەفموه بؤ قائيمقامىيەتى ڦواندز نىرداوه و تبیدا هاتووه كه مسٹي ئەفندى ريسالىيەكى نووسىيە و لمبر چاپه كه وەلامىك بؤ قەشمەك كه له بارهى شته حەرامکراوەكان كتىيىكى نووسىيە. له بهلگهنايمهكدا پەسىنېكى زورى مسٹي ئەفندى كردووه كه كەسىكى به هيئەت و غيرهتە و توانيويەتى ئمو برمهمه بنووسى (MKT.MHM. 195 - 38 ..A).

حىكمەتى طبیعەت: ئوهى ئم كتييه له كتىيەكانى ترى مسٹي جيادەكتامو، ئوهى كه به كوردى نووسراوه "كتىي" بورو به كوردى (نازانري چىلى ھاتووه) كه ناوى (حڪمت طبیعت) بورو (هاوار، 2007: 289).

كتيبياک لمبارە زانستى فيزياوە: ئم كتييه ئەگەر چى ناديارە، بهلام بهلگهنايمهكان ئامازه به ھەولى ناوبراو دەدەن لە بارهە (له باهت فيزيكموھ كتىيىكى تەليل كردووه و پېشكەشى سولتان عەبدولعەزىزى كردووه، له برمابر ئومەدا خەلات كراوه) (موکريانى، 2019: 348).

علم الھيئە: ئم كتييش له بوارى ئەستىرناسى و گەردوونناسىيە، بهلام تا ئىستا ديار نبيه و تمنيا گيۇ موکريانى ناوى ھىناوه.

جوغرافيا: ھىچ زانيارىيەكىش لمبارە ئم برمهمه نبيه، تمنيا گيۇ موکريانى ناوى ھىناوه.

2.3. شیعر 1.2.3. شیعری سهربهخو

تا ئېستا لهبارەی شیعرە کوردیبەکانیبیوه لهو دوو شیعرەی کە گیوی موکریانی بلاوی کردۇتەوە و لهگەمئەو وەلام و وەلامکاریبیھی لهگەمئ شیخ رەزا بىترازى، ھىچ شیعرىيکى ترى نەماوە. ھەر دوو شیعر ھەمان شیوازى شیعرى كۆتايى سەدەن نۆزدەن کوردیي ناوەندىيان ھەيە و پەچاوى سەرواي يەكگەرتۇو و كىشى عەرۇوزىيان كردۇوە و لە كۆتايى شیعرەكەشدا مەخلەسى (مەستى) نۇوسىيە. دوو شیعرەكە بىرىتىن لەمانەن خوارەوە:

(1)

بۇ كوشتنى شەيدايان ھەر لە حزە مۇھەببایە
ئەى دل حەزەرلىكە بى خەوف و مۇھەببایە

وا مەستە دەلىن چاوى بىبىنە چ ھۆشىيارە
بۇ صەيدى دلى عاشق تىرى لە كەمان دايە

كەلەكى چىيە ئەم رۆحە ھەر لە حزە ئەگەر نەيکەم
قوربانى قەد و بالاى ئەو دلبەرە رەعنایە

267

باuss به فيراقى يار ھەر تەعنەي ئەغىyar
كويىر بن، ھەممۇ مەحرۇوم بن، لهو بەزم و تەماشايە

نەزم و غەزەلى مەستى شايسەتىي تەحسىنە
مەوزۇون و تەپ و شىرىن، دلچىرو و دلشارايە

(2)

رمقىيى بەدلەقا يار مەن ئەسەيرى دەردى مەيىھەت بى
فتادەي بەحرى غەم دووجارى گەردابى مەشققەت بى

بە ئوممیتى مرووهت بى نەسیبکەی عەبەس چونكە
لە دنیا ھېچ كەس نەپېيە [كە] بەد ساحب مرووهت بى

ئىلاھى كۈزىر بىن جوملهى رەقىيان يەك بە يەك تاكە
ئاسىرى نارى فېرقەت بىم، دەمى با وەقتى وەصلەت بى

ھەناسەتى ساردى من دۇرمن لە چاۋ و جى و مالى كا
لەزىز بارى نەھاتى دازى، ثىانى بە سەخلىت بى

رەقىيى سەگ سېقەت چارى بە نان و دەرزىيە مەستى
عىلاجى دوور كۈننەتى هەر ئەوه با تۇوشى زەممەت بى (موكريانى، 2019:
348).

2.2.3. تاكە شىعر و شەرەشىعرى لەگەل شىخ رەزاي تالەبانىدا

بە ھۆى ديوانەكەتى شىخ رەزاي تالەبانى، ئەم پەيپەندىيەتى مەستى و شىخ
رەزا ئاشكرا دەبىت، كە هەر جارىك ناوى مەستى لە ديوانەكەيدا ھاتبىت،
ھەجووى كراوه و ھەرگىز پەسىنى نەدرابو. ئەگەر چى ڕەسول مەستى
دەكتە باپىرى توفيق وەبى بەگ لە دايكمەوه، ئەم گومان دەختە سەر ئەوهى
كە مەبەستى شىخ رەزا ڕەسول مەستى بۇوبى، بەلکو مەبەستى مەستىيەكى
تر بۇوه. دەلى: شىخ رەزا لەگەل باپىرمدا ڕەسول مەستى كە ئەوسا مودىرى
مەعاريفى وىلايەتى موسى ئەبى، زۆر نارىك دەبن، باپىرم زۆر پىاوىكى
ئائىدار و پاڭ بۇو، بە پىچەوانە ئەوهە كە شىخ رەزا لە شىعرىكىدا وەتبوسى:

گەر نەكا مەستى ئەفەندى تەركى تلىاکى لەعين

فېرى سى بەزمى ئەكا پېزمىن و كۆكىن و تېرىن

لە ھەولىز كابرايمەك ھېبۇوه ناوى "مەستى" بۇوه و لەوئى كاتبى تەحرىر بۇوه
و ھەميشە تلىاکى كىشاوه. كە خەلک گلەييان لە شىخ رەزا ئەكرد كە تو چۈن
بە مەستى ئەفەندى مودىرى مەعاريفى وىلايەتى موسى دەلىي تلىاکكىش؟ لە
وەرامدا ئەمۇت من مەبەستىم لە مەستى ئەفەندىي كاتبى تەحرىر ھەولىزە
(هاوار، 2007: 143). ئەم مەستى گۆرىنەتى شىخ رەزا لە چوارچىۋەتى
ھونەرى شىعرى توانج پۇشى بۇوه و وەك ھونەرىكى شىعرى و
خۆدەربازكىرىن بۇوه لە قىسى خەلکى، كە لە ديوانەكەيدا بۇ شىخ حەسەننى
مامى و خەلکى ترىش ئەو شىۋازە بەكارھىناوه.

توفيق و هبى له گومانه‌کەمى بەردوام دەبى و دەللى: باپيرم كە باوکى دايىكى به مەستى بەگ بەناوبانگ بۇوه، مدیرى مەعاريف بۇوه لە مەركەمىزى مووسىل كە ئەوسا و يلايەتى مووسلىان پىئەوت. مەستى بەگ دەستييکى شكاۋ بۇو و هەر بە يەك دەست ئىشى كردووه، كتىبى بۇوه بە كوردى (نازانى چىي لىٰ ھاتووه) كە ناوى (حڪمت طبىعەت) بۇوه؛ لە فەلمەكتىر و رىاضياتدا زۆر شارەزا بۇوه. وتى: شىيخ رەزا زۆر ىرقى لە باپيرم بۇو. سەير ئەھەيدى "مەستى" ناوىك كە ناوى مەستى ئەھەندى بۇوه، عەرەقخۇر و سەرخۇشىكى زۆر سەير بۇوه، هەتا ئەللى كە سەرخۇش ئىبوو، ھەزار جىتىي ئەدا بە خەلک و بەزىنەكەشى؛ شىشيخ رەزا، لەجياتى مەستى بەگ كە مەقسەدى شىشيخ رەزا بۇوه، بە ناوى ئەم مەستى ئەھەندىيەوە ئەم جىتىوانە داوه كە لە شىعرەكانى شىشيخ رەزادا ھېيە. مەستى بەگ، زۆر مۇتمەدەن بۇوه و نە تiliak و نە مەشرووبى خواردۇتەوە (ھاوار، 2007: 519).

لە شوينىكى دىكەشدا ئەم جۆرە شەرمىنیيە بە توفيق و ھەبىيەوە دىيارە و وا خۇويما دەكتات كە لەمەر جىتىو و ھەجۇوەكانەوە حەز نەكتات لەگەمل باپيرى بى. بۇ وىنە دەكەمال فۇئاد لە گۆفارى ھىقى بە بۇنە كۆچى دوايى توفيق و ھەبى و تارىكى نۇرسىيە، تىيدا ھاتووه: جارىكىان لىيم پىرسى: مامۆستا، من وەك بىستۇرۇمە باپيرتان لە دايىكەوە مەستىيە فەندى پىاۋىكى زانا و بى وەي بۇوه، ئەبى چىي كردىت كە شىشيخ رەزاي بەمە جۆرە لە خۆى و روزاندۇوە! وتى: جا توخوا پىاۋ دەم ئەخاتە دەم جىتىو فەندىيەكى وەك شىشيخ رەزا وە! باپيرم حەزى لە شەرمىتىو نەكردووه. پاشان واي پىشان دا كە ئەبىت شىشيخ مەبەستى لە مەستىيەكى تر بىت، كە ھەر لەم سەرددەمەدا ژياوه. ئەمجا وتى: فەرمۇو، ستايىشەكەي ئەمەمەد پاشاي بابان بخوينەوە، توخوا ئەمە ستايىشە!

269

ھىچ دەنگم نەكرد، بەلام ئەمزانى كە شىشيخ رەزا راست مەبەستى لە مەستىيە فەندى باپيرى مامۆستا و ھەبى بۇوه (فوئاد، 1984: 17-19).

بە چەند بەلگەيمەك دەسەلمىنرى كە مەبەستى شىشيخ رەزا، ىرسۇول مەستى بۇوه، لەوانە:

ناوى مەجىدى كورى دەھىنى، ئەمەش بە بەلگە سەلمىنراوه كە كورىكى ىرسۇول مەستى ناوى عەبدۇل مەجىد بۇوه.

ھەروەها باس لە دەست شەكانەكەمى دەكتات و ئەمەش ىروونە كە مەستى دەستييکى گۆچ بۇوه و ھەر بە دەستييک كارى كردووه.

ھەر لە بارەی ئەو پەیوەندىيەئى نىوانيان و دروست بۇونى شىعر لەو پەیوەندىيەدا، (گوايە جارىكىان شىخ رەزا لە سليمانى ئەبىت، ئەچىت بۆ مالى مەستىيە فەندى، ئەللىن لە مال نىبىه. ئەويش وا تىئەگات لە مالە و نايەويت بىبىنېت. لەسەر خواجانشىنەكەي بەر مالىان دائەنىشى، شتىك ئەنۇسىت و ئەللىت: باشە كە هاتەوە ئەم نامەيەي بەدەن! نامەكەش برىتى ئەبىت لە ھەجوجو ھەناوبانگەكەي، كە بەم جۆرە دەست پى ئەكەت:

دەستىكى ھەيە مەستىيە فەندى لە كەرمەم دا
میوانى عەزىزى ھەيە دائىم لە حەرمەم دا

ئەلەحق ژنەكەي موشفىقە دەرەحق بە غەربىان
سەد... بە رېقەم داوه، ھەزارى بە عەجمەم دا

وەك من بىستۇمە مەستىيە فەندىش حەزى لە شەرەشىعە كەردووە. ئەللىن جارىكىان لە مەجلىسيكىدا رۇو ئەكاتە شىخ رەزا و ئەللىت:

بۆ شۇرۇشى ئەستقۇم دەخورى شەر ئەفرۇشى
با يېتىھوھ مەيدانى قىسە گەر ھەيە مەردىنى

شىخ رەزاش دەم و دەست بەم فەرەدە وەلامى ئەدانەوە:

من داکى ھەزارى وەكۇ تۇم بە فەردى
نەتىبىستۇرە ضرب المثل سەدقەل و بەردى.

لە يەكىك لە ھەجوجەكانى شوکرى فەزلى (1870-1926) ش دا ئەم فەرەدە ئەھىنېتەوە ياد، كە ئەللى: ھەر وەكۇ مەستىم بە فەردى.... خوارۇح بەرى مولحىدى كافر مەزبەگەر توش بە ئەو مولحىق نەكم (فوئاد، 1984: 17-19).

لە شىعرىكىدا شىخ رەزا گالتە بە بەرھەممىكى مەستى دەكەت لە بوارى زانستى ھىأت ھوھ و دەللى:

مسنی و داعیە حکمت (هیئت) هیجات!
برندازند به یك دست دو تا خر بزمرا

واته: مهستی و لافی زانستی فلهکیيات لیدان؟ بهلام ئهوه دوروه، مهحاله به
یهک دهست دوو شوتی همناگرن (مستهفا، 2010: 424).

دیاره مهستی شیعری تری له دژی شیخ رهزا نووسیوه، شاعیریکی وەک
شوكى فەزلى ئەمەمی له شیعریکی ھەجوودا بۆ شیخ رهزا باس کردووه،
کاتیک دەلی:

مهستی فيعلم دايکى گای، ئەم سيرره با ئەفشا نەكم
بۆچ ئەكمى ھەجوم، بەلئى، تو شىخى، ھەجوت با نەكم (ناقامە، 2010:
(264).

له شیعریکی دیکەدا بەتمواوى دلنىادەبىنەوە كە مەبىست رەسول مەستىيە نەك
مەستىيەكى تر، چونكە باسى چۈونى له كەركۈوكەوە بۆ بەسرە دەكات، كە
ئەم سا مەستى ئەفەندى لە مەكتەبى روشنىيەكى كەركۈوكەوە بۆ روشنىيەكى
بەسرە گوازرابۇويەوە:

271

لېرە.... ڙنەكمى مەستى ئەفەندى بەسرە
ئىستە بۆ بەسرە دەچى بەعده خەرابولبەسرە (مستهفا، 2010: 125).

له شیعریکی تردا ھەجوم شوكى فەزلى دەكات و به پۇورە شوكى ناوى
دەھىنى و له شیعرەكەدا جاریکى تر ناوى مەستى دىننەتەوە و دەيخاتە بەر
جنىيەكەنلى خۆى:

ھەر وەکوو مەستىم بە فەردىي گا، خوا رۆحەم بەرى
مولھىدى كافر مەزىب گەر توش بە ئەم مولھق نەكم

من دەزانم كىنى لە خىتنى بىرىۋىي ئەممە ج سورۇد
سەپىدە، سەپىد، قىسە سۈرۈكى دەبى دەرەحق نەكم (مستهفا،
(84: 2010).

ھەروەھا لە شیعیریکی دیکەدا، ھەر لە دىرى يەكەممەھە تاييەتى كردۇوه بۆ
مهستی ئەفەندى:

دەستىيکى ھەبىھ «مهستى» ئەفەندى لە كەرمەدا
مېھمانى عەزىزى ھەبىھ دائىم لە حەرمەدا

ئەلەحق ژنەكەھى موشفيقە دەرەحق بە غەربىيان
سەد ... بە پۇرمۇدا و ھەزارى بە عەجمەدا

ھىنيد ... ھەتپىوانى بە ... چۈوه داكى
دەستىيکى شەكابۇو بە منالى لە شەكمەدا

بەر زەربەتى كامڭ ... قەھۋى كەھوتۇوه ئاخۇر
بەھو دەردى چۈوه ساھىدى «مهستى» لە پەھەممەدا

حەققا كە «مهجىدى» كورپى زۆر تەبعى جەواهە
سەدگ ... بەھەك لەحزە بە بىپۇل و درەمەدا

گەھودا و تەھرەس، مۇلھىد و بىن دىن و مۇناھىق
مۇرتەددە، نېبىھ مىسىلى لە مىسقۇف و عەجمەدا

بۆ سەددى رەھى «مهستى» وەكى تەپلى سەكەندەر
ئوازى دەھۆلى داكى لە حەرمەدا

ئەھوڭ زەھى كى بۇو لە كەيلانى فەتەح بەگ
مشتىيکى كوتايىھ كۆ...، مشتىيکى لە دەم دا (مىستىفا، 2010: 31).

لە بەشە فارسیبەكەھى دیوانى شىخ رەزادا، شیعیرىك بۆ مەلا رەسوول ناوىك
نووسراوه، بى ئەھەنەي ئەوانەي لىكۆلینەمەيان لەسەر كردۇوه ژيانى ئەھەنە
رەسوولە رەون بەكەنەوه. بە بۆچۈونى ئىمە ئەم مەلا رەسوولە خودى مەستى

ئەفەندىيە، بە بەلگەمى ئەمەرى لەگەل شىيخ ڕەزاي تالەبانىدا دەركەمۆت كە مەستى ئەفەندى وەك ھەممۇ ئەو كەسە كارىگەرانەي ئەمۇسا، كەوتۇتە بەر توانج و جىئىوەكانى شىيخ ڕەزا، بەدلەنلىيەي دەبىي مەستىيەش شىعەری ھەبۈوبىن و وەلامى دابىنەوە، بەلام لەمانە بىترازى ھىچى تر تا ئىستا نەدقۇزراونەتەوە.

ملا رسول

در برابر نشستى غول استى
يا جناب ملا رسول استى

بادۇ دىستت ھەمى زىم بە زەمين
گىر بدانىستى كە يىك دىستى

من خداوند شاعران ھەستم
تو ھمانا رسول من ھەستى (مسەفا، 2010: 418).

273

ئەنجام

- مەستى لەتىي بەلگەنامەكانى عوسمانىدا، بە عبدولپەرسوول مەستى، ڕەرسوول مەستى، مەستى ئەفەندى و بە يەكىك لە زانىيانى، ڕەواندۇز، سلىمانى و موسى ناوى ھاتۇوه.
- مەستى لەو ماوەيەي كە بەرىۋەبەرى مەعارضى موسىل بۇوه، چالاكىي زۆرى ھەبۈوه و بە سەرىپەرشتى ئەو چەند مەكتەبىك لە نوپۇھ كراونەتەوە بۇ يەكمەجەر مەكتەبى كچانى لە موسىل كردۇتەوە.
- مەستى ئەفەندى ناكۆكى لەگەل ئەمەر فائىز بەرزنجى ئائىي موسىل ھەبۈوه و يەكىك لە ھۆكەرەكانى لەسەر كارلادانى بۇ ئەو گەراندۇتەوە.
- مەستى زمانەكانى، كوردى، عەرەبى، فارسى، توركى و فەنسى زانىيە و بە گۈيرەي بۆچۈونى خۆى، بەشىك لە بەرھەممە زانستىيەكانى لە فەنسىيەمە وەرگىراوه.

- له بواری زانستی فیزیاوە، ئامیری راکیشانی ئاوی بەبى ھمو و ھەلەم دروست کردووه و بمو داهینانەی دەولەتی عوسمانی ماوەیەك ناردوویەتییە فەرەنسا، بەلام لەبەر بى پشتیوانییەکەی پېرۋەتكەی وەستاوه.
- مەستی ئەفەندى دە كتىي نۇرسىيە و دوانيان چاپ كراون و ئەمانى ترى وەك دەستخەمتىش بىزرن و تەنەيا ناویان ماوە.
- شىوازى شىعرەكانى مەستى لە شىعرى كۆتايى سەدەتى نۆزدەتى شىعرى كوردىي ناوەند دەچى و تەنەيا دوو شىعرى سەربەخۆت دۆزراوەتەمە.
- شىخ رەزاي تالەبانى لە چەند شىعرى يەكدا ھەجتوو مەستى كردووه، بەلام تەنەيا يەك دىرە شىعرى مەستى لەو مەملانىتىيەدا ماوە.

زىدەر

274

- بابان، ج. (2012). أعلام الکرد، الجزء الثاني، الطبعة الثانية، أربيل: دار آراس.
- بەحرکەبى، ت. (2010). مىزرووی زانیانی كورد، بلاوکراومەكانى كۆربەندى هزرى ئىسلامى، چاپى يەكەم، ھولىر: چاپخانە ئاراس
- تاقانە، ئە. (2010). شىخ رەزاي تالەبانى كەلەشاعيرى خۆرەلاتى ناوەرات، چاپى دووەم، ھولىر: بلاوکراوەت ئاراس.
- زكى، مـ. (2005). مشاهير الکرد وكرستان، اعداد رفيق صالح، السليمانية، مطبعة شفان.
- زمکى بەگ، م.ئ. (2005). تاريخى سليمانى و وەلاتى، چاپى دووەم، سليمانى: بلاوکراومەكانى بنكەي ژين.
- السيد، فـ. (1990). معجم الالقاب والاسماء المستعارة فى التاريخ العربى والاسلامى، الطبعة الاولى، بيروت: دار العلم للملايين.
- فوئاد، أـ. (1984). بميونەي كۆچى دوايى مامۆستا توفيق وەبى يەوه (1891-1984)، گۆفارى هيوا، بلاوکراوەت ئەنستيتوتى كورد، ژمارە 2 / پاريس: لـ 19-17.
- الكردى، مـ. (2008). الموسوعة الكبرى لمشاهير الکرد عبر التأريخ، المجلد الثانى، الطبعة الاولى، بيروت: الدار العربية للموسوعات.
- مستەفا، شـ. (2010). دیوانى شىخ رەزاي تالەبانى، چاپى دووەم، ھولىر: بلاوکراوەت ئاراس.
- موکريانى، گـ. (2019). گولچنى گىو، رېكخستن و ئامادەكردنى دـ. كورستان موکريانى، چاپى يەكەم، ھولىر: چاپخانە رۆزھەلات
- هاوار، مـ. (2007). بېرمۇرە، سليمانى: بلاوکراومەكانى بنكەي ژين.
- وەبى، توفيق(؟)، مذکراتى، نسخة مخطوطة فى مؤسسة ژين- السليمانية.

Jêder


- Al-kurdî, M. (2008). *Almeusu'etul-kebrî li meşahîril-kurd 'ebret-tarîx*, c.2, Beyrut: addarul'erebbiye lîlmewusu'at.
- Arslantaş, N. (2007). "Il.Abdülhamid Zamanında Kaleme Alınan Bir Deprem Risalesi: Resul Mesti Efendi'nin Siper-i Zelzele'si [Paratremblements De Terre]" *M.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi*, ss. 129-168.
- Baban,C. (2012). *E'lamlul-Kurd, Etteb'etus-saniye*, Hewlêr: Dar Aras.
- Behirkeyî, T. (2010). *Méjûy Zanayanî Kurd, Billawkrawekanî Korrbendî Hizrî İslâmî*, Çapî Yekem, Hewlêr: Çapxaney Aras
- Esseyyid, F. (1990). *Mu'cemul-elqab wel-esma elmuste'are fit-tarîxil-erebî welîslam*, Beyrut: Dar el-ilim lil-melayîn.
- Fuad, K. (1984). "Be boney koçî diwayî Mamosta Tofiq Wehbî yewe (1891-1984)", *Govarî Hîwa*, Billawkirawey Entittoy Kurd, j. 2, r.17-19.
- Hawar, M. (2007). *Bîrewerî, Silêmanî*: Billawkrawekanî Binkey Jîn.
- Mistefa, Ş. (2010). *Dîwanî Şêx Rezay Tallebanî*, Çapî Duwem, Hewlêr: Billawkrawey Aras.
- Mukiryanî, G. (2019). *Gullçinî Gîw*, Rêkxistin û Amadekirdinî Kurdistan Mukiryanî, Çapî Yekem, Hewlêr: Çapxaney Rojhellat
- Subaşı, T. (2019). *Osmanlı Devleti'nin İlk Maârif-i Umûmiye Nazırı Abdurrahman Sami Paşa*, Sakarya: Sakarya Üniversitesi Yayınları.
- Taqane, E.(2010). *Şêx Rezay Tallebanî Kelleşa'îrî Xorhellatî Nawerrast*, Çapî Duwem, Hewlêr: Billawkrawey Aras.
- Wehbî, T. (?). *Muzekkeratî Destxet li Arşîva Binkey Jîn*.
- Zekî Beg, M.E. (2005). *Tarîxî Silêmanî û Wellatî*, Çapî duwem, Silêmanî: Billawkrawekanî Binkey Jîn.
- Zekî, M. (2005). *Meşahîrul-ekradî we Kurdistan*, Î'dad Refîq Salih, es-Suleymaniye: Metbae Şivan.


کۆدی بەلگەنامەكان:

- A.}MKT.MHM. 195 - 38
A.}MKT.MHM. 472 - 31
A.}MKT.NZD. 297 - 21
A.}MKT.NZD. 301 - 33
A.}MKT.UM.. 495 - 94
BEO 1836 - 137627
BEO.001410.105708.001
BEO_001440_107944_003_001
BEO_001440_107944_002_002
BEO.001836.137627.003
BEO.001836.137627.004
DH.MKT.02086.00001.001
DH.MKT.02086.00001.002
DH.SAİDd... 76 - 79
DH.SAİDd.00171
İ..MVL. 423 - 18572
MF.İBT. 10 - 19
MF.İBT. 50 - 40
MF.MKT. 570 - 39
MF.MKT. 100 - 92
MF.MKT. 13 - 97
MF.MKT. 16 - 48
MF.MKT. 23 - 73
MF.MKT. 24 - 37
MF.MKT. 979 - 24
MF.MKT.01034.00047.002
ŞD. 2987 - 83
ŞD.01094.00014.001
ŞD.01109.00045.001
ŞD.01109.00045.002
ŞD.02179.00014.002
ŞD.02179.00014.005
ŞD.02179.00014.006


نمونه‌ی وینه‌ی بهرگی کتیب و چهند بهلگه‌نامه‌ی هک







A.1) MKT.NZD.00297.00021.002



الطلب بولجى مأمورىه دائرى إيجاصات ورقسى	
رقم سند اىده	اسم
سكنه	بلقى
مولى دریت و معمور خانه	بلکلى
مسنوده ر. بحث دارالعلميه جمهور رفعه كفر نصبه	مانى
جريدة ملوكى	جريدة
السته سارهه و اقباب اىده بلدىكى	السته سارهه
الشلاق الشلاق لاروس	الشلاق
السته سارهه و اقباب كيكت	السته سارهه
مقدى اىده ان طھاسى اللو ورقى	مقدى
رطه اولى سعى و رعده اولى لاروس	رطه
الشارط قلبي مقدم	الشارط
عيلس و اخويول مأمورىه مبورىه	عيلس
اچات بولجى اىده بلدىكى مأمورى	اچات
وزراء ايان اىده تاريخ عزىز	وزراء
اعيشه سنه برس و قىپۇ اىما زارىزىه بارىز اىشچىلەن بە بەجىد و سەرەددە ئەخوازىو ئەرىچىن دەنمەن - كۈرىدە ئەلەزىز كەڭىز	اعيشه
دەنلىيەن دەنلىيەن دەنلىيەن دەنلىيەن	دەنلىيەن
برىستەن خەنار مەرزاين يۈشىرىي	برىستەن
سامبازادە كارچى خەنار بەلۇنداكى	سامبازادە
ۋەچىمىسى اولىلۇنى	ۋەچىمىسى
وزراء ايان سارهه تۈرىمىي اسان	وزراء
وقىيە خەنلەزۆم كۆسلىن قىقىلالات	وقىيە
ۋەنەن اولىلۇنى	ۋەنەن
مەھىم اىچىل اوڭىزىن اىپەيكلەن مأمورىت	مەھىم
ئىچىن اوچىسى كىلىپ بىلەست ئەن	ئىچىن
ئەرمەن دەنلىيەن اوچىمىھىن راڭى	ئەرمەن
قۇن دازىمەت قۇزىزىه بەلۇنداكى	قۇن
برات فەرەزىك بەرگى	برات
رسائىك ئېھىدلا اىباب مۇھىسى	رسائىك
رسائىك ئېھىدلا اىباب مۇھىسى	رسائىك
OSMANLI ARSIVI REG 1896 1933 21 3	OSMANLI ARSIVI REG 1896 1933 21 3

BEO.001836.137627.003

ئەلفوبيي كوردى و پىتى لاتينى (خستنەرپووی لايمى مىزرووبى و گرفت و پىشنىازەكان)

ELFABEY KURDÎ Û PITÎ LATÎNÎ

Barzan KANEBÎ TAHER¹

پوخته

ئەم لېكۆلينەوهى، كە بە ناونىشانى(ئەلفوبيي كوردى و پىتى لاتينى، خستنەرپووی لايمى مىزرووبى و گرفت و پىشنىازەكان)، دەروازمەكە بۇ خستنەرپووی لايمى مىزرووبى و جوگرافى و ھۆكارى ھەولەكانى گۈرىنى ئەلفوبيي كوردى لە پىتى عمرەبىيەوە بۇ پىتى لاتينى. سەرجمەم ئەم ئەلفوبييانەش بەشىوەيەكى بەرامبەرى (عمرەبى - لاتينى) لە چەند خشتمەكدا دەخاتنەرپوو، كە بەكار ھىنراون. ھەروەھا جىگە لە ھۆكارى جىنگىرنەبۇونى ھىچ يەكىكىان بە شىۋىيەكى گشتىگىر و چەسپاۋ، بە وردى تىشك دەختامسەر گرفتەكانى ھەر يەكىكىان و چۈنۈھى دەسكارى و چارھەسەركردنى ھەندى لە گەفتانە و ھەول و پىشنىازەكانى ترى لەم بارمۇھ. بە تايىھتى ئەوانەھى زىاتر لە لايمى شارمزايانەوە ھەلۋەستەيان لەسەركرداوە و ھەولى پوختەكردىيان دراوە، ئەلفوبييەكى "جەلادەت بەدرخان 1893 - 1951 زە"، چونكە تا ئەمپۇش بەرەدەوام لە بەرەدەيە و پانتايىھەكى بەرفرە لە فەرەھەنگى كوردى دەڭرىتە خۆى. پاشان بۇ گرفتە چارھەسەر نەكراومەكان پىشنىاز يەك خراوەتپەرپوو.

وشهى كليلى: ئەلفوبيي، پىتى لاتينى، گرفت، ھەولەكان، پىشنىاز.

¹ MA in Kurdish Language and Literature / Derçüyê Lisansa Bilind di Zizman û Edebiyatê Kurdi da

E-Mail: baranbt@yahoo.com,

ORCID: 0000-0002-1823-6316

Article Type/Makale Türü: Araşturma Makalesi / Research Article

Received / Makale Geliş Tarihi: 15.08.2020 - Accepted / Makale Kabul Tarihi: 19.08.2020

Kürt Alfabesi ve Latin Harfleri

ÖZ

Bu araştırma Kürt alfabetesinin Latin harfleriyle kullanımı ve tarihsel sorunlarına yönelik bir öneri niteliğindedir. Çalışma Kürt alfabelerinin tarihi ve coğrafi yönlerini aydınlatmak için aralanan bir kapı olmakla beraber Arap alfabetesinden Latin alfabetesine geçiş için bir öneri sunmaktadır. Tarih boyunca bu iki alfabenin de kullanıldığı görülmüştür. Çalışma alfabelerin birbirinden farklı olmasından kaynaklı yaşanan sorunları gözler önüne sermiştir. Bu sorunların çözümü konusunda dil uzmanları tarafından verilen önem ile bazı çaba ve öneriler kabul edilir düzeydedir. Celadet Bedirxan'ın geliştirdiği Latin temelli alfabe halen kullanılmakta ve Kürt alfabesi için önemli bir yer tutmaktadır. Sorunlar tam olarak çözülemediğinden bu konuda bir öneri sunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Alfabe, Latin Harfleri, Kürtçe, Sorunlar, Öneri

The Kurdish Alphabet and Latin Letters Displaying the Historical Side, Problems and Suggestions

ABSTRACT

This research is a gateway to display historical, geographical and the reasons behind the attempts to change the Kurdish Alphabet from Arabic letters into Latin letters. The alphabets are used and shown opposite to each other in multiple tables in Arabic and Latin, in addition to the reason of neither of alphabets being fixed in an inclusive way this research sheds light on the problems of each alphabet, alterations and solutions. The Alphabet of Jaladat of Baderkhan) is the most studied by experts and there were attempts by them to arrange it. As until nowdays this particular alphabet occupies a large chunk of Kurdish culture and is still being used, then concerning the unsolved problems a suggestion is presented.

Keywords: Alphabet, Latin Letters, Kurdish, Problem, Suggestion.

پىشەكى

زمانى ھەر مىللەتىك لە مىللەتانى جىهاندا وابەستمەيە بە ئەلفوبييەكى ديارىكراو، كە خۆى لە كۆمەلە پىتە دەبىنېتىمە، كە بۇونەتە ھىمایەك بۆ ئەم دەنگە زمانىيانەي بە فۇنۇم دادەندىرىن، ئەممەش بە پەيوەست بۇون بە چوارچىوه

و سنوری زمانه‌که، ئەركى گەياندن و گۆرانى واتا دەبىن. زمانى كوردىش وەك هەر زمانىيکى ترى جىهان خاونە ئەلفوبييەكى تايىمت بە خۆيەتى.

بەشىوەكى سروشىش وەك زمانىيکى زىندۇو بە پىيى قۇناغەكانى گەشه و گۆرانى بە خۆيەوە بىنىوە.

بەلام سەبارەت بە ئەلفوبيي زمانى كوردى و گواستنەوهى لە ئەلفوبيي عمرەبىيەو بۆ ئەلفوبيي لاتىنى، چ لمەسر بنچىنە ئەلفوبيي ئىنگلىزى، ياخود روسى، دواجارىش بۆ لاتىنى، كە بەشىوەيەكى كتوپر بۇوە و وەك پىويسىت ېچاوى بىنما سەرەكىيەكانى ئەلفوبيي زمانه‌كە نەكراوە.

بۆيە ھولەكان هەر لە سەرتاوه بە ھۆكارى جياوازى زمانى كوردى لەگەمل ئەم زمانانە ئەلفوبييەكانىيان لىۋەرگىراوە. بە بەراورد لەگەمل ئەلفوبيي زمانى كوردىدا جياوازى بەرچاو بەدەي دەكريت. جگە لەوش بەھۆى ئەمەسى لەلايمى دەستە و كۆمەلەمەيەكى ئەكادىمىيەكى تايىمت بە بوارەكەمە ئەنجام نەدراوە، بەلکو بە ھەولى كەسىي ئىرە و ئەمە ئىنگدارى يەكتىر و بە پىيى زار و ناوجەمە بۇوە. بۆيە لە هەر دانان و بەكارەتىنەكى ئەم ئەلفوبييەناندا ھىچ يەكى لەم ھەولانە بى گرفت و كەمموکورى نەبووە.

285

لەم بارەوش لەلايمى شارەزايانەو تىشكى خراوەتە سەر و تا ئاستىك ھەندى دەسکارى و پىشنىاز بەدەي دەكريت، بەلام تا رۆزگارى ئەمەرۆشمان نەتوانراوە ھاوتاي ئەلفوبييە عمرەبىيەكە، ئەلفوبييەكى لاتىنى كوردى بىتە ئاراواه.

ئەمەش پىويسىتى بە ھەلوستە و لىكۆلەنەوهى زانستى ھەمە، بۆ خستتەرەووی لایەنى مىژۇويى و جوڭرافى، گرفت و رىيگەچارەكان، چۈنىتى پۇختەكىرىن و پىشنىازەكانى دەربارە ئەلفوبييەكى كوردى لاتىنى يەكگەرتوو و گونجاو.

بۆ ئەم مەبەستەش ئامانجى سەرەكى باسەكە، لە رەووی مىتىدوو بە پەيرەوى لە ڕىيازى وەسفى شىكارىي و ړەخنىي، بە زارى كرمانجى ناواھەراشت خراوەتە رەوو.

ناومەركى لىكۆلەنەوهەكە جگە لە پىشەكى و ئەنجام لە دوو بەشى سەرەكى پىيەكتى، لە بەشى يەكمەدا باس لە مىژۇوى ھانتەكايە و بەكارەتىنە ئەلفوبيي كوردى بە پىتى لاتىنى كراوه، لەم بەشە دا جگە لە خستتەرەووی هەر سى جۆرە ئەلفوبيي ئىنگلىزى و لاتىنى و سلافييەكەمە لە عىراق و ئەرمەنستان و ړووسيا، بەرامبەر كەردىيان بە ئەلفوبيي كوردىيەكە بە پىتى عمرەبى،

ھەروھا تىشك خراوەتە سەر ئاستەنگ و كەمەكۈرىيەكانىان و ھۆكارەكانى جىيگىر نەبۇونىيان وەك ئەلفوبييەكى سەرەكى كوردى بەشىۋەمەكى ھەمىشەيى.

لە بەشى دووەمدا باس لە ھاتنەكايەي ئەلفوبييى كوردى بە پىتى لاتينى لە سوريا كراوه، لەم بەشەدا جىگە لە ھەلۋەستەكردن لەسەر ھۆكارى گۆرینى ئەلفوبييى كوردى لە پىتى عەرەبىيەو بۆ پىتى لاتينى و چۆنۈھى گۈنچاندۇن و ھاوتاكرىدىان، ھەردوو ئەلفوبييەكەمش خراوەتە رەوو. ھەروھا ڕۇونكىرىنەمەدەن ھۆكار و ھەولەكانى پېداچوونەمەدەن دەستكارييە سەرتايىيەكانى پېشىوو، دەرخستى گرفت و پىشىيازە پىويىست و تازەكان بە مەبەستى ھىنانەكايەي ئەلفوبييەكى يەكىرىتوو و گۈنچاوجىشكى خراوەتە سەر. ئەنجامى لىكۆلەنەمەكەمش لە كۆتايى دالە چەند خالىكدا دىيارى كراوه.

بەشى يەكمەم: مىزۇوی ئەلفوبييى كوردى بە پىتى لاتينى:

ئەلفوبيي، واتە: وىنەي نووسىنى دەنگەكانى زمانە و بەنمماي سەرەكى نووسىن و خوينىنەمەدەن. خوينىنەمەدەن، تىيگەيشتنى مەبەستى نووسەرە لەھەدە كە بە وشەي نووسراو دەرىپرىيە. (كوردى، 2010، ل10) واتە وىنەي ئەم دەنگەكانىيە كە دەبن بە بەنمماي پىكەتەي وشە. ھەروھا دابەشى سەر دوو جۆرى سەرەكى دەبن: 1- پىتە بىزۇنەكان. 2- پىتە نەمزۇنەكان. (ئەمەن، 2014، ل22) وەك جىاوازىيەكىش لە نىوان دەنگ و پىتدا، (دەنگ) لەرىگاي ئەندامانى ئاخاوتىنەمەدەن دەركىندرىت و بەھۆى بىستەنەمەدەن دەركىندرىت. (پىت) وىنەي دەنگە، بە نىشانە لە نووسىندا دىياركراوه و بە ھۆى بىنېنەمەدەن وەردەگىرەت. (حاجى مارف، 1982، ل16)

زمانى كوردىش وەك ھەر زمانىيىكى ترى جىهان خاونەن تايىەتمەندى خۆيەتى. لە ڕۇوى وىنەي نووسىنى دەنگەكانى زمانەكەمەدەن، جىگە لە (ئەلفوبيي عەرەبى)، كە مىزۇو و پانتايىيەكى فراوانى ھەمە لە نووسىنى كوردىدە، واتە وىنەي دەنگەكانى ئەلفوبييى كوردى لە پىتى عەرەبى گۈنچىنراو سازكراون، (بەصىر، 1982، ل5) كە تا ئەمەرۇش لە بىرەودايە، بەلام لەگەمە ئەمەشدا (ئەلفوبييى لاتينى) پىش بەكاردەت.

سەبارەت بە ھاتنەكايەي ئەلفوبييى لاتينى، شارەزايانى زمانى كوردى كۆكىن لەسەر ئەھە سەرەھەلدىنى ئەلفوبييى كوردى بە پىتى لاتينى دەگەرەيتەمەدە دواى يەكمەن جەنگى جىهانى. ھۆكارەكەمش بۆ ئەھە دەگەرەيتەمەدە، لەم كاتمدا

درک بمهو کرا، ئەمو شىّوه ئەلفوبييە عەرمەبىيە كە بەكاردىت بۇ نۇوسىنى كوردى لمبار نىيە.

لەم بارهە بە مەبىستى دانانى ئەلفوبييە ستانداردى زمانى كوردى لمسەر بنچىنەي ئەلفوبيي لاتىنى، لە سى لاوه لە عىراق و ئەرمەنستان و سورىا، بى ئاگاداربۇون لە كارەكانى يەكتىر شارەزايانى بوارەكە ھولەكانيان خستەگەر. كەچى لەكەمەشدا لىكچۇونىكى بەرچاۋ لە نىوانىيادا ھەمە و ئەمە جىايىان دەكاتەمە، جىاوازى زارەكانى زمانى كوردىيە. وەك لە عىراق بەپىي كرمانجى خواروو بۇوە و لە ئەرمەنستان و سورىا بە پىي كرمانجى سەرروو بۇوە. (خەزىنەدار، 2010، ل54) ئەمەش دەكەرىتىمە بۇ شارەزايى قىشكەرانى زارەكە و نەبۈونى شارەزايى پېيوىست لە بارەى زارەكانى تەرەوھە.

ھولە دەركىيەكان دەربارەى زمان و ئەدەبى كوردى، رۆژھەلاتناس و گەرپىدە و نىرددە رۆژئاوابىيەكان رۆلى گرنگىيان بىنیوھ لە گرنگى دان و تىشك خستەسەر زمان و ئەدەبى كوردى. سەبارەت بە يەكمەن خستەرروو و بەرھەمى نۇوسراوى كوردى بە رېنۇوسى لاتىنى، دەكەرىتىمە بۇ "ماورىستىق گارزۇنى 1734-1804[1]ز" لە سالى (1787) كىتىبى (رېزمان و وشەنامە زمانى كوردى)"ى لە شارى رۆما بە ئەلفوبيي لاتىنى- ئىتالى بلاوكىردهو. بەھۆى ئەم كارەشىبىمە بە (باوکى كوردىلۇجىا) ناو دەبرىت. (ھەزار، 2018، ل5) ئەم كىتىبە جەڭ لە باسکەرنى ھەندى لە بەشكەنلى ئاخاوتىن و وشەنامەمەكى (ئىتالى - كوردى)، كورتەمەك لە ئەلفوبيي لە خۆ دەگرىت. شايانى ئاماڙەيە دواى ئەم بەرھەمى "ماورىستىق گارزۇنى 1734-1804[2]ز" تا ناوەراتى سەدە نۆزدەھەم ھىچ بەرھەمەكى ترى رېزمانى تايىمت دەربارەى زمانى كوردىيەمە نەھاتۇتە ئارا. (كوردىيىف، 1984، ل8) "بەلام دواى ئەم ماوهەيە، يەكى لە كارە گرنگ بەرچاوهەكان لەم بارەيەمە، بە تايىمەتى لمبارەى فەرھەنگى زمانى كوردىيەمە، لە لايەن نىرددە رۇوسى "ئۆگىست ژابا 1801-1894[3]ز" هاتۇتە ئاراوه، كە لە سالى (1879) فەرھەنگىكى (كوردى - فەرەنسى) دانابە، كە پازدەھەزار وشەى كوردى لە خۆ دەگرىت. ھەروەھا دوو فەرھەنگى تىشى دانابە، (فەرەنسى - كوردى - رۇوسى) و (كوردى - فەرەنسى - رۇوسى). (زنگابادى، 2014، ل66-67) جەڭ لەمانەش ھەر لەم بارەيەمە چەندان رۆژھەلاتناس و نىرددە تر تىشكىان خستۇتە سەر زمان و ئەدەب و فەرھەنگى كوردىيەمە، وەك: ("پ،

لىرخ 1828-1884ز، "باسىل نيكىتىن 1885-1960ز"، "ئۆسكارمان 1867-1917ز"، "مەكمەنلىرى 1926-2001ز".....هتد). سەبارەت بە ھەولى گۈرىنى رېنۇوسى كوردى لە ئەلفوپىيى عەرمەبىيەوە بۇ ئەلفوپىيى لاتينى، مىجەرسون 1881-1923ز لە سالى (1913ز)دا يەكمەمەن كەمس بۇوه، كە رېنۇوسى لاتينى بۇ زمانى كوردى دانادوھ و پەرتوكىكى لە "لەندەن" بە ناونىشانى (رېزمانى كرمانجى يان زمانى كوردى، چاپ كردۇوه. پاشان لە "بەغدا" لە سالى (1919ز)دا پەرتوكىكى ترى لەسەر بىنچىنەي زارى كرمانجى خواروو زمانى كوردى بە ناونىشانى (سەرەتاي دەستوورى زمانى كوردى) نۇوسييۇوتھوھ. كە تىايىدا لە كىشانى وېنەي دەنگەكانى زمانى كوردى بە پىتى لاتينى، ھەولەكانى لە گۈنچاندى پىتە دەنگدارەكان و بى دەنگەكانى زمانى كوردى زارى كرمانجى خواروو لەگەنل ئەلفوپىيى زمانى ئىنگلizى دا دەردىكەمۆيت (فەرەج، 1976، ل12) ئەمەش بۇوه دەسىپىكىك بۇ ھاندانى نۇوسمەران و شارەزايانى كورد و بەدواداھاتنى ھەولەكانىيابان لەم بارھوھ، وەك: كىتىي (اولمەمەن قراءتى كوردى) كە لەلايەن "محمد زەكى 1880-1948ز" و "محمد باشقە 1890-1980ز" لە سالى (1920ز) لە "بەغدا" بلاوکرايەوە (موكريانى، 1972، ل7) پاشان بە پەيرھوھ لە ھەندى لە كارەكانى "مىجەرسون 1881-1923ز" هەر لە بەغدا لە سال (1933ز) لەلايەن "توفيق وەھبى 1891-1984-1984ز" كىتىي (خويىندەوارى باو) بلاوکرايەوە. لەم سەرەدەمەشدا ھەرچەنە لەلايەن دەسەلەندرانى بەغدا ھىچ رېگىرىيەكى لى نەكرا، بەلام لەگەنل ئەمەشدا بە مەبەستى پەرأويىز خستى، وەك پىویىست بىرھوھ پى نەدرا (پور، 2015، ل180) ھەروھا لەم بارھوھ چەند وتارىكى لە كۆوارى (دەنگى گىتى تازە) بە ناونىشانى (دەستوورى زمانى كوردى) بلاوکرەۋەتھوھ. كە بى دەسکارىيەكى ئەمۆتو، ئەلفوپىيى لاتينى كوردىيابان راستەمۇخۇ لە ئەلفوپىيى ئىنگلizى وەرگەرتۇوه. لەم ئەلفوپىيىمدا جىڭ لە پىتەكانى (ö, ê) سەرچەم پىتەكانى تر لە ئىنگلizى وەرگەراون. بۇ پىتەكانى (چ، ش، غ) يش بە پىتى دەستوورى رېنۇوسى ئىنگلizى پىتى لېكىرداويان بۇ بەكار ھاتۇوه. وەك: (چ - ch، ش - sh، غ - gh). بەلام بەھۆي ئەمەشدا كوردى چۈن گۇ دەكىرىت ھەرواش دەنۇوسرىت، بۆيە بۇ پىتەكانى (ل، ر) ئەلمۇ پىتە لېكىراوەكانى (lh, rh) و بۇ(وو) و (ى) يىي قۇول پىتەكانى (iy, uw) بەكار ھاتۇوه (خەزىنەدار، 2005، ل233) شايانى ئامازەيە، ھىننانە كايەي پىتى لېكىراو شىۋەيەكى گۈنجاوى نىيە، چونكە لە ھەر ئەگەرىيەكى چارەسەرى، چارەسەرىيەكى وا

پهند دهکریت، ئاسانکاری له نووسین و خویندنەمدا بىننیتە ئاراوه.(كوردى، 2010، ل 11) هەروهە لەسەر ھەمان بىنەمای سوود وەرگرتن له ئەلفوبىيى ئىنگلizى " سىسىل جون ئەدمۇندىز 1889 - 1979 ز" له وتارىكدا، كە له (كانونى دوومى 1931 ز)دا له كۆوارى (كۆمەلەي مەلەكىيە ئاسيايى) له لەندەن بلاوكراوەتەوە، پىشنىازى بەكارھينانى ئەلفوبىيى لاتىنى بۇ زمانى كوردى دەكات، پاشان بە ھەندى دەسكارىيەوە، بۇ جارىكى تىريش له سالى (1933) له ھەمان كۆوار بلاوكراوەتەوە. بەلام دىسانموه بە ھۇى جىاوازى ئەلفوبىيى كوردى له زمانانى تر نەيتوانىو گرفتەكانى ئەوانەي پىش خوى چارەسەر بىكەت.(بىرانە: ئەدمۇندىز و مېنۋرسكى، و: سولتانى، 1996) واتە جىگە له بەكارھينانى پىتى لىكىراو بۇ ئەپتەنەي پىشتر ئامازەمان پىدا ھىچ ئامازەيەكىش نەكراوه بۇ پىتەكانى (ح، ع، ر، ل). كەواتە دانانى ئەلفوبىيەكى لەبار و بى گرفت، پىويىستى بە لىكۆلەينەمەي وردى فۇنەتىكىيە، بەتايمىتى له دىاري كردى سەرچەم فۇنەمەكان و پاشان دانانى وېنه بۇيان. دواترىش بەراورد كردى پىتەكان، بۇ ئەوهى بزانرى بۇون و نەبۈونىيان چ رۆلىكى ھەيە.(حاجى مارف، 1982، ل 16) ئەلفوبىيەكە بەم شىۋەيە خوارەوە بۇو:

289

Aa(ء), Bb(ب), Cc(ج), CHch(چ), Dd(د), Ff(ف), Gg(گ), Hh(ھ), Jj(ژ), Kk(ك), Ll(ل), LHlh(ڃ), Mm(م), Nn(ن), Pp(پ), Qq(ق), Rr(ر), RHrh(ر), Ss(س), SHsh(ش), Tt(ت), Vv(ۋ), Xx(خ), GHgh(غ), Ww(و), Yy(ې), Zz (ز).	پىتە نەبۈزۈنەكان
Aa(ئ)، Öö(وو)، Oo(ۋ)، Eê(-)، Ee(ە، ئ)، Uu(و)، IYiy(ى).	پىتە بزوينەكان

شايانى ئامازه بۆ كردنە بەكارھىنانى ئەم ئەلفوپىيى له عىراقدا به
ھۆكارى ئايىنى و سياسى نەتواندرا جىڭير بىرىت و بىتە رېنۇوسى سەرەكى
نووسىنى كوردى.(خەزندار، 2010، ل54)

دوابەدواى عىراقىش ئەلفوپىيى لاتينى كوردى له ئەرمەنسانى سۆقىھەت سەرى
ھەلدا.

كۆمارى ئەرمەنسانى سۆقىھەت له سالى (1927ز) بە مەبەستى دانانى
ئەلفوپىيى كوردى لاتينى بۆ كوردەكانى ئەرمەنسان و قەمقاس، لېزىنەكى
تايىھەتى بە سەرۆكايىھەتى "عەرب شامىلۇق 1897-1978" و "ئىسحاق
مۇروگۇولۇق" پېكەپىنا. له ئەنجامدا ئەلفوپىيى دىيارى كراوهەكى لېزىنەكە بە¹
شىۋەھەكى فەرمى ناسىندرە، كە بە پىي كرمانجى سەرەوو بۇو. پاشان بۇو بە²
رېنۇوسى كتىبى زانستى و ھونھەری و گۇوار و ڕۆژنامە و كتىبى
قوتابخانەكانىش بەم جۇرە ئەلفوپىيى چاپ كرا.(خەزندار، 2005، ل235)
دوای قەفقازىش، له يەريقان " حاجى جندى 1908-1990" له سالى
(1931ز) كتىبى (قرائىتى كتىبىا ئەلپبا) بە لاتينى - رووسى - فەرنىسى،
بلاوكىدەوە. ئەم ئەلفوپىيى زۇربەي پېتەكانى له لاتينى ئىكلىزى وەرگەن تووە و
بە مەبەستى تەواوکارى چەند پېتىكى لاتينى رووسى و فەرنىسى
وەرگەن تووە.(فەرەج، 1976، ل25) بەلام ئەلفوپىيىكەمى قەمقاس زىاتىر
بەشىۋەھەكى خىرا كەمۇتە بىرەو. ھەرۋەھە جىگە له دەركىرىنى ڕۆژنامەنى (ریا
تازە)، له لايىن دەستمەكەمۇ، له سالى(1933ز) يەكمەمین فەرەنگى كوردى -
ئەرمەنى چاپ كرا.(Kurdo, 1960, L21) شايانى باسە ئەم ئەلفوپىيىش ئاسا
ئەلفوپىيىكەمى عىراق بى گرفت و كىشە نەبۇو. ھەرۋەھە كەمەنگى كوردى -
ناكرىت بۆ جىاڭىردنەوەي پېتەكانى (ر، ل) ئى قەملەو و ھەرۋەھە (Qq) له جياتى
(غ) و (Kk) له جياتى (ق)، بەكارھاتۇوە. له پېتە دەنگدارەكانىش بۆ (و-
(Yy)، (وو- Vv)، (ى- Ii)، (ئ...)، (ھ...) بەكارھاتۇوە. وەك له
خوارەوە ئامازەي پېددەھىن:

Bb(ب), Cc(ج), Ee(چ), Dd(د), ئا(ع), Ff(ف), Gg(گ), Qq(غ), hh(ھ), ھھ(ھ), Kk(ك), گگ(ك), Ll(ل), Mm(م), Nn(ن), Pp(پ), Kk(ق), Rr(ر), Ss(س), ۋىش(ش), Tt(ت), Vv(ۋ), Ww(خ), Xx(خ), Yy(و), ۋىي(ۋ), Zz(ز).	پىته نمزوينهكان
Aa(ا), Ee(ئ)، ئا(ء)، ى(-)، ى(-)، Oo(ۆ)، Vv(ۈ)، Yy(ۈ).	پىته بزوينهكان

بەلام دواتر هەروەك لە فەرھەنگەکەی "قەناتى كوردو" كە بە ناونيشانى (Ferhenga Kurdi – Rûsî) يە و لە سالى (1960) چاپ كراوه. دەردەكمويت، جگە لە دەستتىشان كردنى ھىمماكانى (H, ھ, X, ۋ) لە بەرامبەر (ح، غ). هەروەها پىتهكانى تىريشى بەم شىۋىيە دەستتىشان كردووھ: (ق، (Qq). (ك، Kk). (ج، Jj). (ڙ، ڙ). (وو، ڻ). (ئ، ڻ). (ى، ڦ). (E). بەلام ھىچ ئامازەيمىكى بۇ جياكىردنەوهى پىتهكانى (ل، ر)ى قەلمەو و سووک نەكردووھ. (پروانە: Kurdo, 1960)

291

ئەم ئەلفوبىئىه تا سالى (1945) بە تەنبا بەردهوام بۇو، پاشان ئەلفوبىئى كوردى لاتىنى گواسترايمەوە سەر ئەلفوبىئى رووسى "سلامى"، لەگەمل ئەممەشدا لمبارەى گرفتى كەمترى ژمارەى پىته ڕووسىيەكان بە بەراورد لەگەمل ژمارەى پىته كوردىيەكان، بۇ چارەسەرى گرفتەكە ئەو پىتانەى لە ئەلفوبىئى ڕووسىدا نېبوون، يان لەگەمل دەنگە كوردىيەكان نەدەگونجان پىتى لاتىنیيان لە باتى داندرا. (فەخرى، 1977، ل74) واتە لە بەرامبەر پىته نەمزۇينەكانى وەك: (غ، ق، ھ، و)، پىته لاتىنېيەكانى وەك: (í, ھھ, ۋ، ۋىي، ۋىش، ۋىيىنى) و لە بەرامبەر بزوينى (و) پىتى (Öö) داندرا. بەلام ھىچ ئامازەيمىك بۇ جياكىردنەوهى پىتهكانى (ر، ل)ى قەلمەو، كە دوو پىتى جيان، هەر وەك لە زمانەكەدا جووته وشەى وا ھەن بە ھۆى قەلمەوى و لاوازى ئەم دوو پىتمەوە واتاي جياواز دەبەخشن، وەك وشەكانى: (بىرین - بىرین، گول -

گۆل.....هتد). (كوردى، 2010، ل18) بۇ رۇونكىردنەوهى زىاتر ئەلفوبييەكە لەم دەرخستەيدا دەخەينە رۇو:

Бб(ب), Пп(پ), Тт(ت), Шш(ج), Ҕҹ(چ), ھھ(ھ), Хх(خ), Дд(د), Рр(ر), Зз(ز), Жж(ڇ), Сс(س), Щщ(ش), Ээ(ع), آآ(غ), Фф(ف), Вв(ۋ), Qq(ق), Кк(ك), Гг(گ), Лл(ل), Мм(م), Нн(ن), ھھ(-ھ), Ww(و), Йй(ې).	پىتىه نەبزۇيىنەكان
Аа(ا!), Ээ(ءـ), Öö(وو), Үү(وو)، Ии(ى)، Ее(ئ)، ҖҖ(-).	پىتىه بزوينەكان

ھەرچەندە ئەم ئەلفوبييە بە بەراورد لەگەل ھەردوو ئەلفوبييەكەي ترى عىراق و ئەرمەنسان كەمترىن گرفتى ھەيە، بەلام ھۆكارى جىڭىرنەبۇونى وەك ئەلفوبييەكى گشتىگىر بۇ زمانى كوردى دەگەرىتىمە، بۇ دوو ھۆكارى سەرەكى، وەك:

1- پارچەپارچەمىي گەللى كورد بۇ سەر چەند ولاتىكى زمان و رىنۇوس جىاواز و دەركەوتتىيان وەك كەمەنەيمەك و نەتوانىنى كۆكىردىنەھەيان لە يەك شوينى دىيارى كراودا.

2- نەبۇونى شارەزايى و ئاشنايەتى گەللى كورد لەگەل رىنۇوسى ropyosى و ناسانايى لە فىيربۇونى، ھەروەها نەبۇونى كارىگەرى بەسەر نەتەوەكانى ترى ناوچەكەمش واي كردووه، تەنبا لەلايەن كوردىكەنلى سۆقىيتەوه بەكاربەيىندرىت و بە شىوهەكى ناوچەمىي بەيىتىتەوه.

لىرىدا بۇ ئەمەي بىتوانىن ropyontر گرفتەكانى ھەرسى ropyosەكە دىيارى بىكەين، بە شىوهەكى بەرامبەرى لەم خشتمەي خوارەوە دەيانخەينە رۇو:

رووسی (سوچیمت) (ئەرمانستان)	لاتینی (ئەرمانستان)	لاتینی (عیراق)	عەربى
			نەزروينەكان
-	-	Aa	ء
Бб	Bb	Bb	ب
Пп	Pp	Pp	پ
Тт	Tt	Tt	ت
Шш	Cc	Cc	ڙ
Чч	Ee	CHch	ڦ
ھھ	Hh	-	ح
Хх	Xx	Xx	خ
Дд	Dd	Dd	د
Рр	Rr	Rr	ر
-	-	RHrh	ڙ
Зз	Zz	Zz	ز
Жж	-	Jj	ڇ
Сс	Ss	Ss	س
Щщ	Şş	SHsh	ش
Әә	Əə	-	ع
Íí	Qq	Ghgh	غ
Фф	Ff	Ff	ف

Bb	Vv	Vv	ڦ
Qq	Ҝҝ	Qq	ق
Kk	Kk	Kk	ك
Gamma	Gg	Gg	گ
Лл	ӅӅ	ӅӅ	ل
-	-	LHlh	ڦ
Mm	Mm	Mm	م
Hh	Nn	Nn	ن
ҤҤ	hh	Hh	هـ
Ww	Ww	Ww	وـ
ӢӢ	Jj	Yy	ىـ
			بزوينەكان
Aa	Aa	Aa	اـ
Ҽҽ	Թթ	Ee	هـ، ھـ
ӮӮ	Yy	Uu	وـ
Yy	Vv	ӮӮ	وـوـ
Oo	Oo	Oo	ڏـ
Ии	ӢӢ	IY iy	ىـ
Ee	Ee	Êê	ىـ
ҶҶ	li	li	-

وهك لەم بەرامبەر كەنەدا دەردەكمەيت، جگە لەمەي لە هەرسىن ئەلفوبييەكەدا بە مەبەستى تەواوکارى سوود لە ئەلفوبييى لاتينى وەرگيراوە.

لەگەل ئەوشدا له هیچ يەکیکیاندا نەتواندراوه تەواوی ژمارەی پیتەکانی زمانی کوردى له خۆبگرن. كه يەكى له خەسلەتەکانی زمانی كوردى يەكسانبوونى ژمارەی پیت و دەنگ، واتە پیت و دەنگ يەك مامەمیان لەگەلدا دەكريت. لەم بارهوش زمانی كوردى (37) پیت له خۆ دەگریت، (8) پیتى بزوین و (29) پیتى نەبزوین. (خۆشناو، 2013، ل 8) هەروەك له ئەلفوبیيەكەي عێراق له بەرامبەر پیتەکانی (ح، ع)، له ئەلفوبیيەكەي ئەرمەنستان بۆ (ز) ئاماژە به هیچ پیتىك نەكراوه. بۆ پیتەکانی (ر، ل)ى قەملو له ئەلفوبیيەكەي عێراق ئاماژە به پیتى لیکدرابى (LH, RH) كراوه، كه ئەويش بە بەراورد لەگەل پیتەکانی تر لەگەل زمانی كوردى ناگونجیت، كەچى لە هەردوو ئەلفوبیيەكەي ترى ئەرمەنستان و روسیا هیچ ئاماژەك بۆ ئەم دوو پیتە بەدی ناکریت.

بەشى دوودم: ئەلفوبیيەكەي (جەلادت بەدرخان 1893-1951ز) و

خستەرەوی دەستکاری و پیشنيازەكان:

دواي عێراق و ئەرمەنستان رېنوسى كوردى لاتينى به شىوهەكى بنەرتى و چەمسپاو له سورىا سەرى هەلدا. ئەممەش دەگەریتەوه بۆ ئەوهى رېنوسى توركى تا دامەزراندى دەولەتى توركيا له سالى (1928ز) لەسەر بنچينەي رېنوسى عمرەبى دامەزرا بۇو. لەم مىزرووه بەدواده له توركيا ئەلفوبىي لاتينى له باتى ئەلفوبىي عمرەبى بەشىوهەكى فەرمى و گشتگير بەكارهات. (خەزندار، 2005، ل 234-235) ئەممەش ھۆكارييکى كارگەر بۇو لەسەر رۆشنبیرانى كورد بۆ ئەوهى به ھەمان شىوهى توركەكان له باتى ئەلفوبىي عمرەبى ئەلفوبىي زمانی كوردى لەسەر بنچينەي لاتينى بىتە كايەوه.

295

لەم بارهوه بە نيازى ئەوهى كوردەكانى توركيا له نووسین و خویندنى كوردى بى بەش نەبن، له سالى (1932ز) "جەلادت بەدرخان 1893-1951ز" به ناوى خواستراوى "مير ھەركۆل ئازيزان" بۆ يەكمەمین جار ئەلفوبىيەكى به پیتى عمرەبى و لاتينى له كتىيەكدا به ناونيشانى (ريزمانا ئەلفابييە كوردى) چاپ و بلاوکردهوه. (نەمز، 1976، ل 79) لەم بەرھەمەيدا بۆ يەكمەمین جار بنچينەي دەستورى بۆ پیتەکانى (x, ٦, ٥, ٤, ٣) داناده. ھۆى ئەممەش دەگەریتەوه بۆ كەمترى ژمارەي پیتە لاتينيەكان بە بەراورد لەگەل پیتە كوردييەكان. هەروەها ئەم ئەلفوبىيە وەك يەكمەمین بەرھەمى "كتىخانەي هاوار" بۇو، كه له (1932-5-15 ـ 1943-8-15) لەسەر ئەم بنچينەي

(57) ژمارەدى "كۆوارى ھاوار"ى دەركىرىد (نەبەز، 1976، ل 79) ئەلفوبييەكە بەم جۆرە خوارەوه بۇو:

Bb(ب), Pp(پ), Tt(ت), Cc(ج), Çç(چ), Xx(خ), Dd(د), Rr(ر), Zz(ز), Jj(ژ), Ss(س), Sz(ش), Ff(ف), Vv(ۋ), Qq(ق), Kk(ك), Gg(گ), Ll(ل), Mm(م), Nn(ن), Hh(ھ), Ww(ۋ), Yy(پ).	پىتە نەبزوينەكان
Aa(اً), Ee(ءِ)، Uu(وو)، Ӯӻ(ۈ)، Oo(ۈ)، ӰӶ(ۈ)، ӲӶ(ۈ)، Ii(-).	پىتە بزوينەكان

لەم ئەلفوبييەدا جگە لەھەھى پىتى (K) لە جياتى (ق) و پىتى (Q) لە جياتى (ك) بەكارھىندا (Azîzan, 1932, L11) چەند پىتىكى ترى كرمانچى خوارەوه پشتگۇرى خستووە. وەك: پىتەكانى (ل، ر)ى قەلمەھە و هەر چەندە (ر)ى قەلمەھە لە كرمانچى سەرروشدا ھەمە، ھەرەوھە پىتەكانى (ح، غ) لەگەملە (ھ، خ)دا جيانەكراوەتەوە، كە دوو پىتى سەرمەخۇن و واتا دەگۇرن، وەك لە وشەكانى: (حەز) و (ئەز)، (خار "درک") و (غار) دەردەكمەويت (فتاح، 2011، ل 71)

دوای بلاۋىبونەھە ئەلفوبييەكەي "جەلادەت بەدرخان 1893-1951 زىزىز" ، هەر زوو ھەست كرا بە كەمۈكۈرىيەكانى، بۆيە بە مەبەستى چاكىرىن و گەشەپپىدانى كەوتە بەر تىشكى شارەزايىان و لېكۈلەرانى بوارەكە، بۆ ھىنانە كايىھى ئەلفوبييەكى پوخت و بى گرفت لە نۇوسىن و خوئىندىمەدا، تا ڕېكەوتتىكى گشتىگىر لە بارەى دەستتىشانلىرىنى ھەر فۇنيمەكانى زمانى كوردى بىتە ئاراوە (على، 2014، ل 188) ھەرەوھە لەگەملە ئەممەشدا نابى ئەھەمان بىر بچىت تا رۇزگارى ئەمەرۇشمان كۆ دەنگىيەكى تەھاو سەبارەت بە ئەلفوبييەكى يەكگەرتۇو بۆ زمانەكە نەھاتۇتە ئاراوە، هەر چەندە وەك شىۋەھەكى ھەمىشەيى بەردهوا مە لە بەكارھىنانيدا، بەتاپىھەتى لە بەشە كوردىيەكانى توركىيا و سووريا.

لەم بارهیمهو سەرتا "د.کامەران بەدرخان 1895-1978ز" لە سالى 1938ز) ئەلفوبىيەكى پوخته ترى بە پىتى لاتىنى بەدەستكاربىيەو لهسەر ھەمان دەستورى براکەي بە ناوئىشانى (ئەلفوبىيَا من) لە سورىا نۇوسىوەتمەو و لمويىدا جىڭۈرگىي بە پىتەكانى (ك، ق، ك، ق) كردۇوھ، واتە پىتى (K) بۇ (Q) و پىتى (Q) بۇ (ق) داناوه. كە دواتر جىنگىر بۇو.(نمەز، 1976، ل 79) ھەروەھا دواى ئەمەيش "جەمال نەمز 1933-2018ز" لە كىتىبى (نووسىنى كوردى بە لاتىنى) بە مەبەستى جياكىردىنەوەي (ل، ر) قەلمەو لە (ل، ر) سووك پىشنىازى ئەمەي كردۇوھ، كە (R, T) بەرامبەر بە (ل، ر) قەلمەو بەكار بەيندرى. جىڭە لەمەش بۇ پىتى پەمپەندى دواى وشەيمەك كە بە پىتى دەنگدار كۆتايى ھاتىبىت، پىتى (y) بۇ (ى) داناوه، بۇ پىتى پەمپەندى دواى وشەيمەك كە بە پىتى بى دەنگ كۆتايى ھاتىبىت پىتى (i) بۇ (ى) داناوه. وەك: (مامۆستاي من min Mamostay، كورى من Kuři min). ھەروەھا بۇ پىتى بەستەتمەوھ دواى وشەيمەك كە بە پىتى دەنگدار كۆتايى ھاتىبىت، پىتى (w) بۇ (و) داناوه و بۇ پىتى بەستەتمەوھ دواى وشەيمەك كە بە پىتى بى دەنگ كۆتايى ھاتىبىت، پىتى (u) بۇ (و) داناوه. وەك: (مامۆستا و قوتابى Kuř u Kiç)، (كور و كچ Mamosta w Qutabî). (نمەز، 1957، ل 3-2).

297

ھەر لەم بارهیمهو "گىوي موکريانى 1903-1977ز" دواى رېگەدانى لەلاين "جەلادەت بەدرخان" موه جىڭە لە كىشەي (ل، ر) قەلمەو، لە بەرامبەر (ح، غ) كە لە ئەلفوبىيەكەدا جيانەكراوەتمەو لەگەمل (ھ، خ)دا، بۇ ئەم مەبەستە پىتەكانى (خ، ح) لە بەرامبەر دا دەستنىشان كردۇوھ و لە سالى 1960ز) لەسەر ئەم بنچىنەيە كىتىبىكى بە ناوئىشانى (ئەلفوبىي كوردى وينەدار بە پىتى لاتىنى) چاپ كردۇوھ، ھەروەھا شايانى ئاماژە بۇ كردنە پىشترىش بە مەبەستى تەواوکارى ژمارەي پىتە لاتىنېيەكان بەرامبەر پىتە كوردىيەكان دوو پىشنىاز لە لاين "دى-ئىن-مەكتەزى 1926-2001" خرابووه ڕوو. كە برىتى بۇون لە:

- بەكارھىنانى پىتى لىكىراو وەك:ph, lh, kh, gh)

- بەكارھىنانى نىشانەيەك لەگەمل پىتەكە وەك: (c, ü, ï, ê, ş, x, ç) (موکريانى، 1972، ل 10-13)

پوختهكەي بەم شىۋىيەي خوارمۇھ دەردىكەمەۋىت:

Bb(ب), Pp(پ), Tt(ت), Cc(ج), Çç(چ) , Xx(خ), Dd(د), Rr(ر), Zz(ز), Ss(س), Sz(ش), ÐÐ(ڏ), Jj(ڙ), Qq(ق), Kk(ك), Gg(گ), Ll(ل), Mm(م), Nn(ن), Hh(ھ), Ww(ۋ), Yy(ې).	پېتى نەمزۇينەكان
Aa(اً), Ee(ء), Uu(ۈ), Oo(ۈ), Üü(ۈ), وو(و)، ئئ(ئ)، Ii(-).	پېتى بزوينەكان

كەچى لەگەل ئەمەشدا ھەروەك پېشتر ئامازەمان بىدا، كە تاكو ئىستا لەلایىن شارەزايانەوە كۆدەنگىبىكى تەھاو سەبارەت بە ئەلفوپىيىكى يەكگەرتۇوى كوردى لاتينى گشتىگىر نىبىه. بۇيە لم بارەيەوە چەند سەرنج و پېشىزىيەكى تر دەخرىتەرەوو، ھۆكارەكمىشى دەگەرېتىمەو بۇ ئەھوەي، بەر لە پۇختەكارىيەكەي (تۆفیق وەبى 1891- 1984 ز) دەقه كوردىيەكان بە گشتى و شىعرى كلاسيكى بە تايىھتى جگە لە بەكاربردنى زۆرىك لە وشەي عەرمەبى، بە شىۋەيەكى رەھا لەسەر بىنچىنەي ئەلفوپىيى عەرمەبى نۇوسراون. لم بارەشدا چەند پېتىكى عەرمەبى بەدى دەكىتىن، كە لە زمانى كوردىيىدا نىبىه. وەك پېتەكانى: (ص، ض، ط، ظ، ذ، ث). لم بارەوە "د. بايىز عومەر ئەممەد 1961 ز"- لە لىكۆلىنەوهەكدا بە ناونىشانى (ئەلپىيى يەكگەرتۇوى كوردى بە پېتى لاتينى) چەند سەرنج و پېشىزىيەكى تر دەخاتەرەوو، لم سۆنگىبىيەو جگە لەھوە بۇ پېتەكانى (ش، چ، ح، غ)، لە بەرامبەردا بۇ پېتەكانى (Xx, Hh, Ee, Cc, Ss) يەك نىشانە بۇ بەدەستەنەنانى ھىمائى ھەر پىنج پېتەكانى فۇنيمەكە زىياد بىكىت (ئەممەد، 2007، ل 230). ھەروەها بۇ فۇنيمە ناسەرمەكىبىكەن ناچە ناو ئەلفوپىيى كوردىيەكەن دانانى ھىما بە پېۋىست دەزانى.

ھىماكانىش بەم شىۋەيە پېشىز دەكتات: ھىمائى (7) لەسەر ھەر پېتىك بۇ قەلەوو كردن و ھىمائى (8) بۇ دەربىرېنى دىاردەي سووکردن، ھىمائى (9) بۇ ئەلفوونەكانى (وو، وي، وئى)، ھىمائى (؟) بۇ (ئ) بەكار بەئىندرېت.

هەروەھا پىشنىازى ئەمەش دەكەت ھىمای(O) بۇ (و)ى ئاسايى و ھىمای(U) بۇ (ئ)، ھىمای(E) بۇ (ى) دابندرىت.

كموانە بەپىي ئەم پىشنىازە ئەلفوبىيى كوردى بەم شىۋەيە دەبىت:

- بزوئىنهكان:

- كورت: (ئ) Uu، (و) Oo، (ئ) Ii

- درېز: (ئ) Ee، (ى) Aa، (ئ) Èê

- نيمچە بزوئىن: (ى) Yy، (و) Ww

- نەبزوئىنهكان:

- كپ: (پ) Pp، (ج) Çç، (خ) Xx، (ت) Tt، (س) Ss، (ش) Sh، (ف) Ff، (ھ) Hh، (ق) Qq، (ك) Kk، (ك) Kk

- گر: (ب) Bb، (ج) Cc، (غ) Xx، (د) Dd، (ز) Zz، (ژ) Jj، (ف) Ff، (گ) Gg، (ل) Ll، (ر) Rr، (م) Mm، (ن) Nn

ھەر لەم بارەيمە ھىمای ئەم فۆنيمە عمر بىيانەي كە لە ئەدەبىي كلاسيكى بەكارھاتۇن و ھىمای فۆنيمە ناسەركىيەكان بەم جۆرە دەخانەرۇو:

299

- قەلمۇھەكان: (ۋ) ÕÕ، (ر) Rř، (ل) Lí، (ط) Ğğ، (ظ) Zž، (ص) Šš، (ض) Ďđ

- سووكەكان: (پ) Pp، (ج) Çç، (خ) Xx، (ت) Tt، (ش) Sh

- بىڭۈرەكان: وو، وى، وئى (Oo)

- خۇنەگەكان: (ئ) ؟ (23)

لىرىدا بە پىي ئەم ئەم پىشنىازانە ئەلفوبىيى كوردى بە پىتى لاتىنى (31) پىت لە خۇ دەگرېت، كە بەم شىۋەيە خوارەوە دەبىت:

Bb(ب), Cc(ج), Čč(چ), Dd(د), Ff(ف), Gg(گ), Hh(ھ), Ħħ(ح), Jj(ڙ), Kk(ك), Ll(ل), Mm(م), Nn(ن), Pp(پ), Qq(ق), Rr(ر), Ss(س), Šš(ش), Tt(ت), Vv(ڦ), Ww(و), Xx(خ), Ḫx(غ), Yy(ي), Zz(ز).	پېتى نەبزوپىنهكان
Aa(ا), Ee(ى), Uu(ئ)، Oo(و)، İi- (ى)، Ēē- (ى)، (. .	پېتى بزوپىنهكان

لەم ئەلفوپىيىدا وەك دەرەكمەيت جىھە لە دەستتىشانكىرىنى ھىماكانى (7، 8) بۇ دىباردەي دەرىپىنى قىلىكىرىن و سووکىرىن و گۈربىنى ھىماكانى (O) بۇ (و)، (U) بۇ (ئ)، (E) بۇ (ى). ھەروەها دەستتىشانى كۆملەنلىك فۇنۇمى تىرى ناسەركى دەكتە بە ھۇى ئەمەي لە ئەدبىي كلاسيكى دا بەشىوپىيەكى بەربلاو بەكار ھاتۇو.

لىرىدا دەكىرىت ئەم بىگۇتىرىت، ئەم ئەلفوپىيە حىبا لەسەرجەم ئەلفوپىيەكانى تر، زۆرتىرىن فۇينم لە خۇ دەكىرىت. ئەمەش جىڭىر بۇونى وا سانا نىيە، ھۆكەرەكەش دەگەرىتەمە بۇ ئەمەي كە ئەلفوپىيەكەي "جەلادەت بەدرخان 1951-1893" دەنیكە رىزەرەوی خۆى گەرتۇو و بەشىوپىيەكى جىڭىر و گشتىگىر كەوتۇتە بىرە.

بۇ ئەم مەبىستەش دواين خستەرەووي بەرامبەرى ئەلفوپىيى كوردى و چۈرى نووسىنىان بە پېتى عەرەبى و لاتينى، لە لايەن "پروفېسۇر د. وريما عمر ئەمەن 1947-1951" كە وەك پېزەتىكى ئابورى و لۇزىيەكى بۇ رىزىكىرىنى پېتەكان و بەخشىنى سىمايەكى سىستەماتىكى بە رىزەمانى كوردى و فەر ھەنگىسازى، تىكچىرەندىنی ھەممۇ پېتە وەستاو و بزوپىنهكان بە يەك رىز و رىزىكىر دىننەن بە پېتى پېوانەكانى سروشى رىزبۇونى ستانداردى جىهانى پېشانى دەدات. (ئەمەن، 2012، ل 85) ھەروەها ئامازە بۇ ئەمەش دەكتە، ئەمەي لەبارەي پېتەكانى نووسىنى كوردى تا رادەيەكى زۇر رىزەتتىكى گشتى لەسەرە و ئەكاديمىيە كوردىش پەسندى كىردووه. (ئەمەن، 2012، ل 84) بەلام بۇ ئەلفوپىيە لاتينىيەكە تاكۇ نېستنا نەتواندر اوە بە شىوپىيەكى گشتىگىر و چەسپاۋ ئەم دۆخە بىتە ئار اوە، ھەر وەك لەم خشتنىيە خوارەوە لەگەل ھەرسى جۆرمەكەي تىرى پېشىو دەي�ەينە روو:

لاتینی (سووریا)	برووسی (سۆقیهت)	لاتینی (ئەرمەنستان)	لاتینی (عێراق)	عەرەبی
				نەبزويىنهكان
-	-	-	Aa	ء
B b	Бб	Bb	Bb	ب
Pp	Пп	Pp	Pp	پ
Tt	Тт	Tt	Tt	ت
Cc	Шш	Cc	Cc	ج
Ç ç	Чч	Ее	CHch	ڇ
Hö	һһ	Ҥҥ	-	ح
Xx	Xx	Xx	Xx	خ
Dd	Дд	Dd	Dd	د
Rr	Pp	Rr	Rr	ر
Ŕ r	-	-	RHrh	ڙ
Zz	Зз	Zz	Zz	ز
Jj	Жж	-	Jj	ڙ
Ss	Cc	Ss	Ss	س
ş Ş	Щщ	Şş	SHsh	ش
'	Әә	Әә	-	ع
ë ÿ	íí	Qq	GHgh	غ
Ff	Фф	Ff	Ff	ف
Vv	Вв	Vv	Vv	ڦ

Qq	Qq	Ķķ	Qq	ق
Kk	Kk	Kk	Kk	ك
Gg	Гг	Gg	Gg	گ
Ll	Лл	Ll	Ll	ل
Ł Ł	-	-	LHlh	ڥ
Mm	Mm	Mm	Mm	م
Nn	Hh	Nn	Nn	ن
Hh	Hh	hh	Hh	ه
Ww	Ww	Ww	Ww	و
Yy	Йй	Jj	Yy	ى
				بزوئىنهكان
Aa	Aa	Aa	Aa	آ
Ee	Әә	Әә	Ee	ە، ھ
Uu	Öö	Yy	Uu	و
Ü û	Yy	Vv	Öö	وو
Oo	Oo	Oo	Oo	ف
Î î	Ии	Îî	IY iy	ى
Ê ê	Ee	Ee	Êê	ئ
İ i	ҴҶ	İi	İi	-

بە سەرنجداڭ لە هەر چوار ئەلفوبييەكە، جىڭە لەمەھى نە تواندراوه لە ھىچ يەكىكىيان سوود لە ئەلفوبيي تەنەيا زمانىك وەربىگىردرىت، لەگەنل ئەمەشدا لە ھىمما وەرگىراوەكانىش جىاوازىيەكى زۆر بەدى دەكىرىت. ھەروەھا لە ئەلفوبيي لاتينىيەكەش دواى ھەممۇ رەخنە و پىشنىاز و دەسکارىيەكان، ھەتا ئىستاش

پیتی (ع) تهنيا هیمای (') بۆ دیاری کراوه، ئەم هیمایەش جیا لە هیمای ترە و گوازارشت لە هیمای پیتی هیچ زمانیکی تر ناکات، هەروەھا پیتی (ئـ)، هیچ هیمایەکی بۆ دیاری نەکراوه.

زیادکردنی ئاماژەکانیش بۆ پیتەکانی (R, H, X, Ï, Ê, Ç, S, Û, Î, Ē, ī, ġ, ğ) وەک نیشانەیەک بۆ جیاکردنەوەی (ر، ل)ی قولل و (ح، هـ) و (خ، غـ)، کە بەشیوەی زیادکردنی خالە (..) لە سەر پیتەکان ئەمەش لەکەم ئاماژە زیادکراوهەکانی تری پیتەکانی وەک: (C, Ç, S, Û, Î, Ē, ī, ġ, ğ)، ھاوشیوە نیبیه و وەک ئەمە دەردەکەمۆیت ھەر لەسەر بەنەمای بۇونى خال (.). لە سەر پیتە عمرەبییەکانەوە بى. واتە بە بەراورد لەکەم پیتەکانی تر بەشیوەیەکی ناوازە دەردەکەمەن.

رەنگە جگە لە جیاوازى زار، ئەمەش ھۆکاریک بى زیادکردنی ئەم ئاماژانە تاکو ئىستا لە لایمن کوردانى (رۆژئاوا) سوورىا و (باکور) توركىا بە شیوەیەکى كردارى و گشتگىر شوینى خۆى نەگرتۇوە. واتە تاکو ئىستا لە ئەلفوبىيى کوردانى ئەم دوو بەشە جیاوازى ناکریت لە نیوان پیتەکانی وەک: (رـ، لـ، حـ، هـ، خـ، غـ).

لەم بارەيمەوە بە مەبەستى چارەسەرىيەکى گونجاو، دوو پېشنىاز دىتە ئاراوه. وەک:

303

1- بە پىچەوانەي پیتە ئاماژە بۆ زیادکراوهەکان كە نیشانەي ھەشتى بچووک (8) يان بۆ زیادکراوه، نیشانەي حەوتى بچووک (7)، لە برى خال (..) بۆ ئەوانى تر زىاد بکریت.

وەک: (L- Í, R- Û, X- Ï, H- ğ, ğ).

2- بۆ سەرجمەم نەبزوينە ئاماژە بۆ زیادکراوهەکان نیشانەي ھەشتى بچووک (8) زىاد بکریت و بۆ سەرجمەم پیتە بزوينە ئاماژە بۆ زیادکراوهەکانیش نیشانەي حەوتى بچووک (7) زىاد بکریت. وەک:

- پیتە نەبزوينەکان: (ئـ - Ē, چـ - Ç, حـ - Č, لـ - L, Hـ - R, شـ - Š, ئـ - Ī, ئـ - Ě).

- پیتە بزوينەکان: (ووـ - Û, ئـ - Ī, ئـ - Ě).

لىرىدا دەردەکەمۆیت دیارى كردنی ئەم هیما و ئاماژانە تەواوكارىيەك بەرامبەر پیتە كوردىيەکانى ئەلفوبىيى عمرەبى دىننەتە ئاراوه، كە سىما و ئەندگارەکانى

زمانى كوردى پېشان دەدات. (خۆشناو، 2011، ل102) وەك لەم پۆلىنەكىرىنىتە: خوارەوە بەم شىوه يە خۆى دەنوينىتە:

ئەلفوبييى لاتينى كوردى				
نەبزۆين		نېمچە	بزوين	
بزۆين			درېز	كورت
B b (ب)	Ě ě (ئ)	Y y (پ)	A a (ئ، ا)	E e (ء، ئ)
C c (ج)	P p (پ)	W w (و)	Ü ü (وو)	U u (و)
Ă ā (ع)	Č č (چ)		Î î (ى)	I i (-)
Ӯ Ӱ (غ)	X x (خ)		Ê ê (ئى)	
D d (د)	T t (ت)		O o (وو)	
Z z (ز)	S s (س)			
J j (ڇ)	Š š (ش)			
V v (ڦ)	F f (ف)			
G g (گ)	K k (ك)			
L l (ل)	Q q (ق)			
Ӆ Ӣ (ڙ)	H h (ھ)			
R r (ر)	Ӯ Ӯ (ح)			
ڦ ڻ (ڻ)				
M m (م)				
N n (ن)				

کهواهه لیره دا بهپیی ئەم پیوهر و پیشنيازه، ئەم ئەلفوبىيە سەرچەم پېتە كوردىيەكان له خۇ دەگرىت و سىمايەكى گونجاو و بنەما دەنگسازىيەكان بهپىي پیوھىرىكى لۆزىكى و زانستى پەپەرەو دەكتە. ئەمەش دەمانگەيەننەتە ئەنچامەي بۆ كاراکىردىن ئەلفوبىي لاتىنى كوردى بە شىۋىھەكى گشگىر و بى گرفت، وەك پېتە كوردىيەكانى ئەلفوبىي عەرەبى پەپەوەست دەبىت بە لە خۆگۈرتى (37) پېت، كە لە (8) پېتى بزوين و (29) پېتى نەبزويەن پېڭ دېت، بهم شىۋىھە:

ئەنچام و پیشنياز دەكتە ئەلە(ئ), Bb(ب), Pp(پ), Tt(ت), Cc(ج), Čč(چ), ئەنچام ئەلە(ئ), Hh(ح), Xx(خ), Dd(د), Rr(ر), Řř(ر), Zz(ز), ڙ(ڙ), ئەنچام ئەلە(ئ), Ss(س), Šš(ش), Ää(ع), Ææ(ع), Ff(ف), Vv(ف), ئەنچام ئەلە(ئ), Qq(ق), Kk(ك), Gg(گ), Ll(ل), Íí(ل), Mm(م), ئەنچام ئەلە(ئ), Nn(ن), Hh(ھ), Ww(و), Yy(ي).	نەبزويەنەكان پېتە
ئەلە(ئ), Aa(ا)، Ee(ء)، Oo(و)، Uu(ۈ)، وو(و)، ئائى(-)، ئە(-)، ئەئى(-)، Ii(-).	بزوينەكان پېتە

305

ئەنچام و پیشنياز دەكتە

لە كۆتايىي باسەكمەمان دەربارەي (ئەلفوبىي كوردى بە پېتى لاتىنى) بە چەند ئەنچامنىڭ گەيشتىن، لەم خالانەتى خوارەوە دەيانخەنەن روو:

- 1- گۈرىنى ئەلفوبىي كوردى لە عەرەبىيەو بۆ لاتىنى سەرەتاڭەي ھولىيەكى دەرەكى بۇوه، نەك ناوەكى. بەلام ئەلفوبىيەكە سۈورىيا لە ناچارىيەو بۇوه، بۆ بى بەش نەبۇونى كوردىكەنلى توركىيا، بەھۇي چىتر بەكارنەھىنانى ئەلفوبىي عەرەبى لەلايمەن توركىياو.
- 2- دانان و بەكارنەھىنانى ئەلفوبىي كوردى بە لاتىنى لە عىراق و ئەرمەنستان، سۈورىيا، جىڭە لەھەي بە ھۆى جىاوازى زمانى كوردى لە هەر چوار ئەلفوبىيەكە، نەتواندر اووه بە تەمبا سوود لە ئەلفوبىي يېك زمان و مەربىگىردىت. ھولەكائىيان بى ئاگادارى يەكتەر بۇوه و هەر يەكە و بە پېتى زارەكە خۇرى بۇوه، نەك زمانى كوردى بە گشتى. ھەروەھا لەلايمەن دەستە و كۆمەلەيەكى ئەتكادىمىي ياخود ئەتكادىمىيەكى تايىمت بە بوارەكەمە ئەنچام نەدر اووه.

3- لە ئەلفوپىيىكەمى سۈورىيا جىاڭىرىنەمەرى (ل، ر) قەلھۇ و سۈوك، دانانى ھىمماي (H̄h, '، X̄x) بەرامبەر پېتەكانى عەرمىبىيەكانى (ح، ع، خ)، بە ھۆى پېشىياز و دەسکارىيەمە بۇوه. بەلام تاكۇ ئىستا به شىۋىيەكى كارا و گىشتىگىر شۇينى خۆى نەگىرنووه.

4- هەر چەندە پېتە عەرمىبىيەكانى وەك: (ط، ظ، ص، ض، ذ، ث) لە ئىستا زمانى كوردىيىدا بەكارناھىندرى، بەلام ھۆكاري پېشىياز كەنلى ھىمماكەنلى (T̄t، Ž̄ž، Š̄š، D̄d، Z̄z، S̄s) بەرامبەر پېتە عەرمىبىيەكانى (ط، ظ، ص، ض، ذ، ث) دەگەرىتىمە بۇ ئەمەرى كە لە نىيۇ دەقە شىعىرييە كلاسىكىيەكاندا بە شىۋىيەكى بەرچاولەكارنەتتۈرۈ، لە وەرگىرانى ئەم دەقانەشدا گىرقى زۆر دىتە ئاراوه.

5- وەك رىنگەچارىيەك بە مېبەستى تەواو كارى و ھاوتاڭىرىنى پېتەكانى ئەلفوپىيى لاتىنى كوردى بەرامبەر پېتە كوردىيەكانى ئەلفوپىيى عەرمىبىي، ئەم پېشىياز مەمان خستەرەوو:

آ- بە پېنچەوانەي پېتە ئامازە بۇ زىادكراوەكان كە نىشانەي ھەشتى بچووک (8) يان بۇ زىادكراوە، نىشانەي حەوتى بچووک (7)، لە بىرى خال(..) بۇ ئەمانى تر زىاد بىرىت.

وەك: (ل- Í, ر- Ě, ح- X̄x, ئ- Ě, ئ- Ě, ئ- Ě, ئ- Ě, ئ- Ě, ئ- Ě).

ب- بۇ سەرجمەن نېزۈرنە ئامازە بۇ زىادكراوەكان نىشانەي ھەشتى بچووک (8) زىاد بىرىت. بۇ سەرجمەن پېتە بزوئىنە ئامازە بۇ زىادكراوەكانىش نىشانەي حەوتى بچووک (7) زىاد بىرىت. وەك:

- پېتە نېبزۈرنەكان: (ئ- Ě، ج- Č، ح- Č، ئ- Í، ر- Ě، ش- Š، ع- Š، ئ- Ě، ئ- Ě، ئ- Ě).

- پېتە بزوئىنەكان: (وو- Ú، ئ- Î، ئ- Ě، ئ- Ě).

سەرچاوهكان

1- كىتىبەكان

- ئەدمۇندىز: سىسىل جۇن و ۋىلادمۇر: مېنۇرسكى، 1996، نۇوسىنى كوردى بە ئەلفوپىيى لاتىنى، وەرگىرانى: سولتانى: ئەنۇر، چاپخانەي "كتاب ارزان"، سويد.

- ئەمەن: نۇورى عەلى. 2014، رىزىمانى كوردى، چاپى چوارمەم، چاپخانەي رۆزھەلات، ھەولىر.

- پۇر: ئەمير حەسمەن، 2015، سەدەپىيەك خەبات لە پېنناو زمانى كوردىدا، بلاوکراوەيى بنكەي ژىن، سەليمانى.

- زىگابادى: جلال، 2014، الکردىلوجيا- موسوعة موجزة، مطبعة جامعة صلاح الدين، اربيل.

- خەزىنەدار: د. مارف. 2010، مىزۇوى ئەدبى كوردى، بەرگى يەكمەم، چاپى دووھم، دەزگاى چاپ و بلاوکراوەي ئاراس، ھەولىر.

- خوشناؤ: د. نهريمان عهدوللار. 2013، فيربوونى پيتهكانى زمانى كوردى، چاپى يەكمم، چاپخانەي هىشى، ھەولىر.
- عملى: د. تالىب حوسىن. 2014، زانستى زمان و زمانى كوردى، چاپخانەي برۇزھەلات، ھەولىر.
- فتاح: پروفېسۆر. د. محمد معروف. 2011، زمانهوانى، چاپى يەكمم، چاپخانەي حاجى هاشم، ھەولىر.
- فەخرى: د. محمەد. 1977، رينووسى كوردى، فەصلى يەكمم، چاپخانەي زانكوى سەلاحەدين، ھەولىر.
- فەرجەج: حامىد. 1976، رينووسى كوردى لە سەدىھەكدا، چاپخانەي كورى زانيارى كورد، بەغدا.
- كوردوبيف: پروفېسۆر. اك اك، 1984، رىزمانى كوردى بە كەرسىتەي دىاليكتى كرمانجى و سۇرانى، وەرگىرانى: موکريانى: دكتور كورستان ، چاپخانەي الاديب البغادىيە، ھەولىر.
- كوردى: لىزىنەي زاراوه لە ئەكاديمىيە. 2010، راسپاردهكانى كۆنفرانسى بەرھە رينووسىتكى يەكگرتووى كوردى، چاپى دووم، چاپخانەي حاجى هاشم، ھەولىر.
- موکريانى: گىۋى. 1972، ئەملفوبيي كوردى وىنەدار بە پىتى لاتىنى، چاپخانەي كورستان، ھەولىر.
- ناوخوش: سەلام و نهريمان خوشناؤ. 2011، كوردوچى، چاپى حەوتەم، چاپخانەي برۇزھەلات، ھەولىر.
- نەبىز: جەمال. 1976، زمانى يەكگرتووى كوردى، بلاوكراوهى يەكىتى نەتەوھىي خويىدكارانى كورد لە ئەوروپا، بەرلين.
- نەبىز: جەمال. 1957 ، نووسىنى كوردى بە لاتىنى، بەغدا.
- هەزار: شىركى، 2018، لە: رىزمان و وشەنامەي زمانى كوردى- ماوريتسيو گارزۇنى- رۇما.

2- گۆفارەكان:

- ئەمەد: د. بائىز عومەر. 2007، ئەلفوبييى يەكگەرتۇووی كوردى به پىتى لاتينى، كۆوارى كۆرى زانىارى كوردىستان، ژمارە 5، ھەولىز.
- ئەمەن: پروفييىر. د. ورييا عومەر. 2012، بە ستاندارتكەرنى رېيزبۇونى پىتهكانى نۇوسىنى كوردى، كۆوارى كۆرى زانىارى كوردىستان، ژمارە 21، ھەولىز.
- بەصىر: دوكتور كامل، 1982، خالبەندى بۇ رېنۇوسى كوردى، گۇفارى كۆرى زانىارى عىراق "دەستە كورد"، بەرگى نويم، بەغدا.
- حاجى مارف: د. ئەورەحمانى، 1982، گىر و گرفتەكانى رېنۇوسى كوردى بە ئەلفوبييى عەرەبى، گۇفارى كۆرى زانىارى عىراق "دەستە كورد"، بەرگى نويم، بەغدا.
- خەزنهدار: د. مارف. 2005، بە كورتى مېزۇوى گۇرانى ئەلفوبييى زمانى كوردى، كۆوارى كۆرى زانىارى كوردىستان، ژمارە 3، ھەولىز.

Serçawekan

1- Kitêbekan

- Alî, T. H. (2014), Zanistî Ziman û Zimanî Kurdî, Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Azîzan, M. H.. (1932), *Rêzana Alfabê ya Qurâî*, Şam.
- Emîn, N. A. (2014). *Rêzmanî Kurdî*, Çapî Çarem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr.
- Ferec, H. (1976). *Rênûsî Kurdî le Sedeyek da*, Bexda: Çapxaney Korî Zanyarî Kurdî.
- Fetah, M. M. (201). *Zimanewani*, Çapî Yekem, Hewlêr: Çapzaney Hacî Haşim.
- Fexrî, M. (1977). *Rênûsî Kurdî*, Feslî Yekem, Hewlêr: Çapxaney Zankoy Selahedîn.
- Lêjney Zarawe le Ekadîmyay Kurdî. (Bê tarîx). *Raspardekanî Konfiransî Berew Rênûsêkî Yekgirtûy Kurdî*, Çapî Duwem, Hewlêr: Çapxaney Hacî Haşim.
- Mukuryanî, G. (1972). *Alfubêy Kurdi Wênedar le Pîti Latîni*, Hewlêr: Çapxaney Kurdistan.
- Nawxoş, S. û Xoşnaw, N. (2011), *Kurdolocî*, Çapî Hewtem, Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Nebez, C. (1957) *Nûsînî Kurdi be Latîni*, Bexda.
- Nebez, C. (1976). *Zimanî Yekgirtûy Kurdî*, Berlin: Yekêtî Neteweyî Xwêndkaranî Kurd le Ewrûpa.
- Xeznedar, M. (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapî Duwem, Hewlêr: Dezgay Çap û Bilawkirawey Aras.
- Xoşnaw: N. A. (201). *Fêrbûnî Pîtekanî Zimanî Kurdî*, Çapî Yekem, Hewlêr: Çapxaney Hêvî.

Govarekan

- Ahmed, B. O. (2007), “Alfbêy Yekgirtûy Kurdî be Pîtî Latînî”, *Kowarî Korî Zanyarî Kurdistan*, j.5.
- Emîn, W.O. (2012). “Be Sitandartkirdinî Rîzbûnî Pîtekanî Nûsînî Kurdi” *Kowarî Korî Zanyarî Kurdistan*, j.21.
- Xeznedar, M. (2005) “Be Kurtî Goranî Alfubêy Zimanî Kurdi”, *Kowarî Korî Zanyarî Kurdistan*, j.3.

JI ALIYÊ PERWERDENASIYÊ VE ANALÎZEK LI SER MENZÛMeya GÛZ û MEWÎJÊ*

Numan YURT¹

PUXTE

Edebiyata Kurdî ya klasîk ji aliyê berhemên fêrkarî ve berhemdar e û gelek nûnerên vê edebiyatê di vî warî de yan berhemên serbixwe nivîsîne yan jî di nav dîwanan de cih dane berhemên bi vî rengî. Yek ji van kesayetan Şêx Muşerrefe Xinûkî (1926-2008) hem şêxekî terîqetê ye hem jî helbestvanekî xwedî dîwan e ku mexlesa “Mîm û Fa” bi kar anîye. Xinûkî her çend bi şêxîtiya terîqetê bê nasîn jî dersdarî di jiyana wî de cihekî girîng digire. Xinûkî di çarçoveya dersdariyê de berhemeke bi navê *Gûz û Mewîjê* ku mijara wê perwerdehî û exlaq e nivîsiye. Ev berhema ku bi şêweyeke şîretkar nivîsiye nimûneyeke menzûmeya fêrkarî ye. Ji bilî vê menzûmeyê di cihêñ muxtelîf ên dîwana wî de di heqê perwerdehî û exlaqê de hin şîretên wî yên dîtir cih digirin. Em ê di vê xebatê de ji aliyê naverokî ve li ser nimûneya helbesta dîdaktîk menzûmeya *Gûz û Mewîjê* nirxandinekê bikin.

Peyvîn Sereke: Helbesta Kurdî ya Dîdaktîk, Şêx Muşerrefe Xinûkî, Gûz û Mewîj, Şîret, Perwerdehî, Exlaq

Eğitim Bilimleri Açısından *Gûz û Mewîj* Manzumesi Üzerine Bir Analiz

ÖZ

Klasik Kürt Edebiyatı didaktik eserler açısından verimlidir ve bu edebiyatın birçok temsilcisi bu alanda ya bağımsız eserler kaleme almış ya da divanları içinde bu türden eserlere yer vermiştir. Bu kişiliklerden biri olan Şeyh Müşerref Xinukî (1926-2008) hem bir tarikat şeyhi hem de divan sahibi olup “Mîm û Fa” mahlasını kullanmıştır. Xinukî her ne kadar tarikat şeyhliği ile tanınsa da müderrislik onun hayatında önemli bir yer tutmaktadır. Xinukî müderrislik çerçevesinde, konusu eğitim ve ahlâk olan *Gûz û Mewîj* adlı bir

* Ev xebat li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di Gulana 2018an de wek “semînera tezê ya mastirê” hatiye pêşkêşkirin. Xebat pişî pêşkêşiyê tevlî hin guherînan hatiye amadekirin.

¹ MA in Kurdish Language and Culture / Derçûyê Lîsansa Bilind

E-mail: abdexweda@gmail.com

ORCID: 0000-0002-8921-3939

Article Type/Makale Türü: Case Report / Olgu Sunumu

Received/Makale Geliş Tarihi: 15.08.2020 - Accepted / Makale Kabul Tarihi: 19.08.2020

eser kaleme almıştır. Öğüt verici bir üslûpla kaleme aldığı bu eseri didaktik bir manzume örneğidir. Bu manzumenin dışında divanının muhtelif yerlerinde eğitim ve ahlâk hakkında başka öğütleri de yer almaktadır. Bu çalışmada bir didaktik şiir örneği olan *Gûz û Mewîj* manzumesi üzerine içerik yönünden bir değerlendirme yapacağız.

Anahtar Sözcükler: Didaktik Kurt Şiiri, Şeyh Müşerref Xînukî, Gûz û Mewîj, Öğüt, Eğitim, Ahlâk

An Analysis on the Poem of Gûz û Mewîj in Terms of Educational Sciences

ABSTRACT

Classical Kurdish Literature is productive in terms of didactic works, and many representatives of this literature either wrote independent works in this field or included such works in their divans. Şeyh Müşerref Xînukî (1926-2008) who was one of these personalities was both a religious sect sheikh and a divan owner and used the pseudonym "Mîm û Fa". Although Xînukî is known as the sheikh of the sect, being a professorship has an important place in her life. Xînukî wrote a work called *Gûz û Mewîj*, whose subject was education and ethics, within the framework of professorship. This work of him, which he wrote with a counseling style, is an example of a didactic poem. Apart from this poem, there are other advice on education and ethics in various parts of the divan. In this study, we will make an evaluation in terms of content on the poem *Gûz û Mewîj*, which is an example of didactic poetry.

Keywords: Didactic Kurdish Poetry, Sheikh Muşerref Xînukî, Gûz û Mewîj, Advice, Education, Morality

311

Destpêk

Perwerdekirina mirovî ji hêla maddî û manewî ve ji armancê sereke yên kes û civatan e. Ev armanc hem ji bo baweriyyê semawî hem jî ji bo bawerî û bizavê dînyewî karîger e. Ji bo vê mebestê wek saziyeke bingehîn di serî de malbat, pişt re jî ci yên fermî ci jî yên sivil bin kes an sazî di qadêن cur bi cur ên wekî dîn, exlaq, perwerdehî, çand, civaknasî, hiqûq, siyaset hwd. de xwestine ku bi perwerdekirinê rê nîşanî ferd an civaka xwe bidin û bigihînin asteke mifadar.

Behra edebiyatê jî di vê mebest û hewldanê de heye û berhemên dîdaktîk ên edebiyata klasîk ji bo vê armancê wekî pirekê navgîniyê dikin. Armanca berhemên dîdaktîk bi giştî gihadina civateke baş, nemaze jî şexsiyeteke zexm e. Taybetmendiyeyeke menzûmeyên didaktik ew e ku bi taybetî di beşa destpêkê de ji bo xwendekarê ilmê di hin mijarê dînî û exlaqî û bidesxistina ilmê de hin şîretan dihundirînin. Bi vî şîklî xwendekaran terbiye dikin û wan ji jiyanê re amade dikin (Abdülhadioğlu, 2013: 272). Berhemên dîdaktîk, di edebiyata klasîk de bi gelek teşeyan hatine nivîsîn. Li gorî tercîha helbestvan ev berhem carinan bi teşeya mesnewî, qesîde û xezelê bi awayekî serbixwe carinan jî bi van

teşeyan di nav dîwanan de hatine bicikirin. Pendname/şiretname û fablan jî mirov dikare bixe kategoriya metnên dîdaktîk.

Di edebiyata gelek netewyan de bi vî rengî berhem hene û van berhemên dîdaktîk bi vê mebestê rê nîşanî muxatabêن xwe dane. Ji bo nimûne, berhema bi navê *Behcetu'l-Huld* a Baheddîn Muhammed bîn Yûsuf (m. 911-1505) menzûmeyeke di qada perwerdehiyê de ye (Şafîî, 1984, 88/veg. Abdülhadioglu, 2013, 180). *Pendnameya* ku nîspetî Ferîduddîn Attar (1142/45-1221) tê kirin di erdnîgariya çandî ya Îslamê de mînaka nesîhatnameyan a herî navdar e (Pala, 2006). Pirtûka çîrvanokan *Kelîle û Dimne* bieslê xwe berhemeke Hindî ye û di vê berhemê de hikumdarek dixwaze kurên xwe ji aliyê malbatî, siyasî û di hin cihan de exlaqê takekesî ve terbiye bike (Karaismailoğlu, 2002: 211). Berhema bi navê *Kutadgu Bilîgê* ya Yusuf Has Hacib (1018-1077) di bingeha xwe de siyasetnameyek û şiretnameyek e (Dilaçar, 1995: 24).

Heke çend mînakêن sereke yên helbesta dîdaktîk ji edebiyata Kurdî ya klasîk bê dayîn mirov dikare bêje ku *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî (1651-1709) berhema herî girîng e ku di serdema berî mîrektiyan de hatiye nivîsîn. Ev, pirtûka yekem e ku di qada edebiyata zarokan de bi Kurdî hatiye nivîsîn û ferhenga duzimanî ya ku bi Kurdî ye (Yıldırım, 2008: 41). Di serê her beşeke *Nûbarê* de derheqê xwendin, zanîn, karêن civakî, daxwaz û fîkrêن millî, guhdarîkirina li hev û din de Xanî gelek şîretên giranbiha gotine (Xanî, 1986: 5). Mele Xelîl Sîrtî (1750-1843) jî di serdema mîrektiyan de bi berhema xwe ya *Nehcu'l-Enamê* derdikeve pêş ku beşekê berhemê ji bo mijara exlaqê terxan kiriye û ev beş di çarçoveya şiretnameyê de girîng e. *Iqdê Durfâma* Şêx Eşkerî (1898/99-1952) ji bo cureya fablê ku armanca wê şîret in nimûneyeke gelekî baş û serkeftî ye. Seyîd Eliyê Findikî ku piraniya dîwana wî ji qesîdeyên pendê pêk tê wek nûnerekî girîng ê vê cureyê bale dikişine ser xwe (Adak, 2019: 147). Mela Husnî Hezîn (j.1943) berhema xwe ya bi navê *Guldanê* bi armanca “dîtina rîya rast, rindiya xûyan û paqijiya der û hundiran” (Hezîn, 2011: 5) nivîsiye. *Guldan* ji çîrok, biwêj, gotinêن peşîyan û helbestên şîretawer pêk tê. Berhem dîdaktîk e û nivîskar her dem dixwaze şîretê li xwendevanêن xwe bike (Aykaç, 2015: 25). Ji bilî van mînakan gelek berhemên fîrkarî yên serbixwe û yên ku di dîwanan de cih digirin hene. Hin ji van berhemên fîrkarî yan rasterast li ser qadeke zanistî hatine nivîsîn an jî xalêن zanistî dihundirînin.

Helbestvanekî sedsala dawî, mutesewif û xwedî dîwan ê herêma Sîrte Şêx Muşerrefê Xinûkî (1926-2008) jî yek ji van kesayetên edebî ye ku bi berhema xwe ya *Gûz û Mewîjê* xwestiye rê nîşanî feqiyêن xwe bide. Xinûkî di vê berhema xwe ya dîdaktîk de li ser perwerdehî û exlaqê rawestiyaye. Bêguman di hilbijartina mijar û şewaza berhemê de bandora Xanî û *Nûbihara Biçûkan* eşkere ye. Menzûme her çend bi awayekî serbixwe hatibe nîvîsîn jî pişt re di nav dîwana Xinûkî de hatiye bicikirin. Berhem ji şes beşan pêk tê. Xinûkî di beşa yekemîn a bi navê *Haşa Kitabu Gûz û Mewîjê* de bang li feqiyan kiriye û bal kişandiye ser girîngiya şîretên ku dê bike. Di beşa *Fesla Tehsîlê* de li ser

“rêgezên hînbûnê” û encamên “girîngdîtina xwendinê” rawestiyaye. Beşa *Fesla Qedrê Seyda* di perwerdehiyê de “rêzgirtina seyda û girîngiya wê”, “encamên bêhurmetiyê” derxistiye pêş. Beşa *Fesla Mu'amelata Hevalan* “armanca xwendinê”, “têkiliyên di navbera feqîyan” de û “şiklê tevgera li nav medreseyê” dihundirîne. Xinûkî di beşa *Fesla Exlaqê* de behsa “rabûn û rûniştina feqîyan” a di jiyana şexsî û civakî de kiriye. Xinûkî di beşa *Xatîmeyê* de ji bo xwe û feqîyen xwe ji Xwedê re lava kiriye, selat û selaman li ser Cenabê Pêxember anije.

Di menzûmeye *Gûz û Mewîjê* de li kêleka şîretên li ser perwerdehî û exlaqê xalên têkelî perwerdenasiyê jî têr dîtin. Bi xwendineke berawirdî me dît ku di nav menzûmeyê de hin rê, rîbaz, stratejî û rêgezên ku di zanista perwerdehiyê ya nûjen de têr bikaranîn Xinûkî jî di perwerdehiya medreseyê de bi kar anije. Di vê xebata xwe de em ji aliyê naverokî ve li ser menzûmeye *Gûz û Mewîjê* rawestiyane û me xalên hevpar ên rê û rîbaz, rêgez û stratejiyên zanista perwerdehiyê ya nûjen û yên perwerdehiya medreseyê raxistiye ber çavan.

1. Danasîna Menzûmeye *Gûz û Mewîjê*

Menzûmeye *Gûz û Mewîjê* ya ku mijara wê hin esasên perwerdehiya medreseyê û şîretên exlaqî ne ji aliyê Şêx Muşerrefê Xinûkî ve hatiye nivîsîn. Xinûkî ji bo berhemê wek sernav “*Haza Kîtabu Gûz û Mewîjî*²” daniye û bi jêrenoteke Erebî ya ku bi wateya “Nivîsîna van ristan bi destê nazimê feqîr Muşerref, li gundê Rûbarê li kêleka kaniya Tûjhê h.1386 (m.1966) 12 Rebûlewvel roja ïnê pişti nimêja ïnê û xwendina Mewlûda Şerîf hatiye temamkirin. Rica min jê yên li bal min (telebe) ew e ku yên di nav (*Gûz û Mewîjî*) de tetbîq bikin.” dawî li menzûmeyê anije. Ji vê jêrenotê jî diyar e ku Xinûkî xwestiye ev şîretên wî bêr tetbîqkirin. Ev menzûme dema tê nivîsîn di nav medreseyê Kurdistanê de belav dibe, wekî lewheyekê tê daliqandin û jiberkirin. Ev şîra wî ya bi navê “*Gûz û Mewîjî*” ku bi forma mesnewîyê hatibû nivîsandin, ji aliyê feqeyan ve dihate jiberkirin. Tesîra wê şî'rê ewqas çêbûye ku ji aliyê Mela Abdûlîmê Sêrtî yê ereb ve bi heman weznê hatiye tercumekirin bi bal tirkî ve (Cûdî, 2008). Li gorî agahiyênu ku Abdullah Özcan³ dide destxeta berhemê ya resen winda ye lêbelê kopiya destxeta resen⁴ li ber destan heye. Ji bilî vê, menzûme ji aliyê gelek kesan ve hatiye îstînsaxkirin û belavkirin. Menzûme, di nusxeyê dîwana Xinûkî yên ku ji aliyê Mele Usman û Şêx Muhammed Salihê Hêsetî ve hatine îstînsaxkirin de jî hatiye bicikhîrin. Şêx Muşerref hêj li heyatê bûye û ev nusxe pesend kirine.

² Wate: Ev kitêba *Gûz û Mewîjê* ye.

³ Abdullah Özcan kurê Şêx Muşerrefê Xinûkî ye û li Zanîngeha Sêrtê di beşa Îlahiyatê de mamoste ye.

⁴ Bnr. Kopiya destxetê di dawiya xebatê de ye.

Mirov dikare bêje ku Xinûkî di hin xalên naverokî de û ji aliyê şêwaza şîretên xwe ve daye pey şopa Xanî. Dema mirov vê beşe (Gûz û Mewîj) dixwîne, dibêje her wekî ku Nûbihara Biçûkan dixwînim (Sönmez, 2018: 24). Gelek mînak hene ku bandora Xanî ya li ser Xinûkî nîşan didin. Ji bo nimûne Xanî di beşa yekem a *Nûbiharê* de wiha şîret li feqiyên xwe kiriye:

Heta tu ders û dewran nekî tekrar û mesrûf
Di dunyayê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf (Xanî, *Nûbar*, r.9)

Xinûkî jî di beşa *Fesla Tehsîlê* de wiha bala feqiyên xwe kişandiye ser girîngiya xwendinê û destbikarên wê:

Bi diqqet hûn biken daîm miştale
Miştale malekî qet bêzewal e

Kesê xwenda muheqqeş her emîr e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e

Bixûnin hûn neken teqşîr û sistî
Emanet se'y û teşşîl û durustî (Xinûkî, Gûz û Mewîj)

314

Xanî di malika jêrîn a *Nûbihara Biçûkan* de ji bo rêzgirtina mamoste şîret li şagirdan kiriye û gotiye: Heke perwerdekar hişk be jî divê ji bo xatirê ilmê xwendekar jê hez bikin.

Mu'ellim bila dil wekî ber bitin
Divêtin ku şagird(i) dilber bitin (Xanî, *Nûbar*, r.33)

Xinûkî jî di menzûmeyê de bi heman şêwazî bang li feqiyên xwe kiriye û wiha gotiye:

Ji seyda ger dixwazî istifade
Divêtin tu bikî bo înqiyad e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Ji seyda ra kesê naket ita'e
QE nabînî di dunya întifa'e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Dîsa Xanî di malika jêrîn a *Nûbihara Biçûkan* de bingeha her fezîletê bi “zanîn”ê ve, ya her xirabiyê jî bi “nezanîn”ê ve girêdaye:

Ummu'l-fedail 'alîmî, ummu'r-rezail cahilî
Ummu'l-qura ummu'l-bilad Ke'be nebî peyxember e (Xanî, *Nûbar*, r.16)

Xinûkî jî di malika jêrîn a dîwanê de maka her tiştê baş “zanîn û xwendin”, a her tiştê bela û xirab jî “nezanîn û nexwendar” dibîne.

‘Ilm e her ummu’l-feðaîl cehl e her ummu’l-bela
Van belaê bêhîsab cahilan ma nabihê (Xinûkî, *Dîwan*, r. 86)

1.1. Teşeya *Gûz û Mewîjê*

Şêx Muşerrefê Xinûkî ji bo ku şîretên xwe vebêje û hişyariyê di heqê xwendin û exlaqê de bide zanîn ji şêwaza metnên dîdaktîk û teşeya mesnewiyê sûd wergirtiye. Mesnewî, teşeyeke nezmê ye ku yekeya wê beyt e, misrayê beytên wê di nav xwe de hemserwa ne û hemû beytên wê bi heman qalibê erûzê hatine nivîsîn (Adak, 2019: 245). Berevajî teşeyê dî yên nezmê, mesnewî zêdetir di berhemên serbixwe de hatiye bikaranîn (Adak, 2019: 247). Teşeya mesnewiyê di edebiyata Kurdî ya klasik de gelekî berbelav û ji menzûme yan helbestên fîrkariyê re gelekî guncaw e. Wek têgeheke edebî helbestên ku bi mebesta vegêran, belavkirin, şîrovekirin û fîrkirina hîzr, zanist yan jî prensîbêñ exlaqî û dînî hatine nivîsîn dîbin helbestên dîdaktîk (Fesaî, 1960, 377/veg. Adak, 2019, 33). Menzûmeya *Gûz û Mewîjê* ji aliyê teşeyê ve dikeve kategoriya mesnewiyê didaktik û ji aliyê mijar û cureyê ve jî dikeve koma mesnewiyêñ exlaqî. Gelek nimûneyêñ mesnewiyêñ dîdaktîk -çi yên serbixwe çi jî yên di nav dîwanan - di edebiyata Kurdî ya klasik de têñ dîtin.

Li gorî polînkirina Adak di berhemên edebiyata Kurdî ya klasik de sê beşen sereke û hin mijarê standart ên mesnewiyan hene û ev dabeşkirin bi vî şiklî ye: beşa dîbaceyê, beşa sereke û beşa xatîmeyê. Mijarê ku di beşa dîbaceyê ya mesnewiyan de cih digirin ev in: besmele, tehmîd, tewhîd, munacat, ne‘t, medhiye, mi‘raciye û şefa‘et, sebebê te'lîfê, saqîname, muxennîname. Beşa sereke, ji aliyê qewareyê ve beşa herî berfireh e ku mijara bingehîn tê de bi hûrgilî tê pêşkêşkirin. Beşa xatîmeyê, beşa xilaskirin û dawîlêanînê ye.⁵

Menzûmeya *Gûz û Mewîjê* her çiqas bi teşeya mesnewiyê hatibe honan jî li gorî pergala mesnewiyêñ dîtir hin ciyawaziyê wê hene. Menzûme ji beşa dîbace, beşa sereke û xatîmeyê pêk tê û bi tevahî 39 malik in. Xinûkî berhema xwe li gorî metoda mesnewiyê ya klasik dabeş nekiriye. Beşa dîbaceyê (destpêk) ya bi sernavê “*Haza Kitabu Gûz û Mewîj*”ê mirov dikare wekî “sebebê telîfê” bihesibîne. Ji bilî vê mijarê di dîbaceyê de mijareke din tune ye. Xinûkî ji bo mijara sereke sernavê *Fesla Tehsilê*, *Fesla Qedrê Seyda*, *Fesla Mu‘amelata Hevalan* û *Fesla Exlaqê* daniye. Beşa dawî jî bi navê Xatîmeyê bi nav kiriye. Ev sernav hemû bi Erebî ne. Di çarçoveya Kurdiya Kurmancî de dikare bê gotin ku sernav di mesnewiyêñ dînî-dîdaktîk de bi Erebî hatine nivîsîn (Adak, 2019: 321) Xinûkî hemû beşen menzûmeyê bi qalibê erûzê yê “mefa’î lun mefa’î lun

⁵ Bnr. (Adak, 2019: 245-350)

fe'ulun"ê nivîsiye. Menzûme ji aliyê kês û serwayê ve serkeftî ye. Xinûkî şiret û hişyariyên xwe bi zimanekî fêmbar û herêmî anije ser zimên.

Tablo 1. Dabeşkirina menzûmeya *Gûz û Mewîjê* li gorî beş û malikan

Beşen Menzûmeyê		Hejmara Malikan
Dîbace	Haza Kîtabu Gûz û Mewîj	4
Mijara Sereke	Feşla Tehşîlê	8
	Feşla Qedrê Seyda	8
	Feşla Mu‘ameleta Hevalan	10
	Feşla Exlaq	6
Xatîme	Xatime	3
Tevahî		39

2. Analîza Naverokî

Menzûmeya Gûz û Mewîjê di qada perwerdehiyê de ji bo geşedana bîrî (cognitive education) ya feqîyan hin agahiyên teorîk -rê û rîbaz û merheleyên hînbûne- pêşkêş dike û aliyê wê yê zanistî heye. Xinûkî digel agahiyên teorîk bi şiretên di heqê rabûn û rûniştinê de jî armanc dike ku aliyê sehekî (effective education) yê feqîyan xurt bike. Piştî van agahiyên giştî, bihûrgilî em ê mijar, armanc û sebebê navlêkirina menzûmeyê rave bikin. Piştî ku şiret û peyamên menzûmeyê yên qada bîrî û sehekî li gorî beşan malik bi malik destnîşan bikin em ê rê û rîbaz, stratejî û rîgezîn hîndekariyê yên berhemê û yên zanista perwerdehiyê ya nûjen muqayese bikin.

2.1. Tema/Mijara Menzûmeyê

Menzûmeya *Gûz û Mewîjê*, metnekî dîdaktîk-exlaqî ye. Berhem li ser du mijarên sereke hatîye avakirin: perwerdehî û exlaq. Xinûkî, di berhema xwe de li ser girîngiya ilmê û rabûn û rûniştina li nav medreseyê û civatê rawestiyaye. Herwiha behsa rê û rîbazên fêrbûnê kiriye û bala feqîyan kişandiye van xalan. Xinûkî di vê berhemê de şiretan li feqîyan dike ku bi qene‘eta me felsefeya Şêx Muşerref ya di derbareyê tedrisata medresê de berbiçav dike. Girîngiya wê jî ew e (Doskî û Sadînî, 2013).

2.2. Mebesta Menzûmeyê

Perwerdehî pêkanîna tevgerên guherandî yên bi daxwaz û bi armanc e (Oral, 2011: 3) û armanca perwerdeyê guhartina hin tevgerên diyar e ber bi îstîqametekî diyar ve (Pertev, 2008: 11). Perwerdekar bi gotin an jî berhemên xwe hewl didin ku bi awayekî takekesî yan girseyî di xwendekarêne xwe de guhertina tevgerê (behavior change) çê bikin. Heçî mirovên helbestvan in û aliyê wan ê perwerdekariyê jî hebe fîkr û hestêne xwe bi navgîniya berhemên xwe didin zanîn. Şêx Muşerrefe Xinûkî jî ramanên xwe yên di heqê perwerdehiyê û merheleyen fîrbûnê bi berhema xwe rêz kiriye. Di heman demê de hin prensîbê exlaqî jî ku xwestiye di dil, mejî û jiyana feqiyên wî de cih bibin bi berhema xwe anîye ser zimên. Lewra di medreseyê de li kîleka perwerdehiya bîrî perwerdehiya sehekî jî tê dayîn. Armanca sereke ya Xinûkî di heqê fîrbûn an xwendina ilmê de -ku bûye sedema nivîsîna vê menzûmeyê- mirov dikare bi rista “Bixûnin hûn bi meqşûda Îlahî” wate “daxwaz an gîhîştina Xwedê” şîrove bike. Xinûkî di malika jérîn a dîwana xwe de jî diyar dike ku ciyawaziya sereke ya di navbera însan û heywên de “xwendin” û “edeb” e û li gorî wî tu cudahî di navbera “mirovekî xwende” yê Ereb an Ecem de tune ye:

Ferqa însanî ji heywan xwendin e û edeb
Mirovê xwenda şîrîn e çi ‘ecem bî çi ‘Ereb (Xinûkî, *Dîwan*, r. 90)

Li gorî babetêne ku Xinûkî li ser rawestiyaye li kîleka armanca sereke mirov dikare behsa du armancê binbeş bike. Mebesta yekemîn ji bo feqiyân awayê hînbûnê yan çalakiyên fîrbûnê ne. Ji bo nimûne:

Bi diqqet hûn biken daîm miştale
Miştale malekî qet bêzewal e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

317

Mebesta din jî perwerdekirina feqiyan ji bo gihadina asteke exlaqî ye. Ji bo nimûne Xinûkî di malikeke beşa *Fesla Exlaqê* de ji bo “hişmendîya paqijiyê” bi feqiyan re çê bike şireta paqijiyê kiriye:

Cihan paqij biken çendî bikarin
Di hucran qırş û qal wek ‘eyb û ‘ar in (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Xinûkî hem di qada exlaqî hem jî di qadêne din de digel agahiyên teorîk bi awayê prafîk jî xwestiye ku rewşa exlaqî bixe bin kontrolê (Çiçek, 2009: 113). Ev mebesta Xinûkî di hemû besan de tê dîtin.

2.3. Navlêkirina Menzûmeyê

Navê berhemekê dikare wekî nasnameya wê jî bê pejirandin. Şêx Muşerrefe Xinûkî di serê destxeta xwe de bi sernavê *Haşa Kitabu Gûz û Mewîj* dest bi menzûmeyê kiriye. Menzûme li gorî destxeta Mele Usman bi navê *Gûz û*

Mewîjê, di destxeta Şêx Muhemmed Salihê Hêsetî de bê sernav dest pê dike. Xinûkî, navê berhemê di malika dawî ya beşa yekemîn de jî bi kar anije:

Ji bo qet'a xirabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye *Gûz û Mewîj* e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Sedema vê navlêkirinê mirov dikare bi çend awayan şîrove bike. Yek jê herêma (Berwarî) ku Şêx Muşerref lê jiyaye, ji hêla gûz û mewîjan ve dewlemend û navdar e. Xinûkî bi van her du xurekên herêmî dibe ku xwestibe bandora şîret û hişyariyên xwe bi riya şenberkirin û nêzîkkirinê di hiş de zêdetir bike. Xinûkî ders û şîretên xwe wekî fêkiyên herêmê yên binirx an jî ji bo “gîhîştina heqîqetê” pêwîst dibîne û bi vî şiklî di destpêka menzûmeyê de balê dikişîne ser gotinîn xwe.

Gûz û mewîj, dikare wekî metaforekê jî bê nirxandin. Şêx Muşerref mirovekî mutesewif û xwedî terîqet e.⁶ Ehlê tesewifê, ji bo ramanên xwe bi awayekî baştir ji muxatabêن xwe re vebêjin carinan riya mînakdanê bi kar anîne û bi vê mebestê li kêleka sembolêن din ji fêkiyan jî sôd wergirtine. Di berhemên tesewifi de dema behsa pêwîstiya rênîşandêrekî tê kirin “sembola fêkî” tim û tim tê bikaranîn (Tosun, 2004). Heke ev agahî li ber çavan bê girtin mirov dikare bêje ku Xinûkî ji sembolêن tesewifi sôd wergirtiye.

Mewlana Celaleddînê Romî (1207-1273) di hin cihêن *Mesnewîyê* de rasterast peyvîn “gûz” û “mewîj”ê bi hev re bi kar anije. Mewlana bi sembolêن “gûz û mewîj”ê re peyva “zarok” jî bi kar anije. Diyar e ku wî di navbera sembla “gûz û mewîj”ê û peyva “zarok”ê de têkileyek daniye û gûz û mewîjê bi wateyên “cism û suret, daxwazêن nefse, sıfetên nefse, laşê ji ilmê Xwedê xafil, xurekên nefsanî” yên neyînî û bi wateyên “zewq û cezbeya Xwedayî, meqamên ilmê Xwedayî” yên erêni bi kar anije (İncidağı, 2015: 139). Gûz û mewîj her çend bi wateya erêni li ber dilê zarakan şîrîn û xweş be jî mijûlbûna bi van xurekan û xwarina van “xaviya serdema zaroktiyê” dinimîne. Li gorî van agahiyan û îfadeyên Mewlana dikare bê gotin ku “gûz û mewîj” rewşa kesên “xav, negihaştî” diyar dîkin û kesê ku bixwaze bikemile divê dest ji van xurekan berde. Dibe ku Xinûkî jî wekî Mewlana xurekên ku di jiyana zarakan de cih digirin hilbijartibe. Bi şîret û hişyariyên xwe jî xwestibe ku feqiyên xwe ji rewşa neyînî xilas bike, bikemiline û ji ber vê ev nav li berhema xwe kiribe.

Şibandina gûzê, ji bo seyda/mamoste “hişkbûn”, “biryardarî” û “dadî”yê îfade dike, mewîj jî “bandora erêni” li ser xwîner çê dike. Bijartina şibandinê ji hêmanê şirûştê rîbazeke ku hem kevneşopiya medreseyê hem jî ya tesewifê ye ku pirî caran serî lê didin (Baytar, 2012, r.779). Dîsa mirov dikare gûz û mewîjê ji bo “tenduristiya hiş”ê feqiyan wek xurekên sûdmend binirxîne. Çawa ku tama gûz û mewîjê bi hev re gelekî xweş e, ev menzûme jî ewqas xweş e.

⁶ Şêx Muşerref ji bavê xwe Şêx Es'edê Sanî terîqet standiye. Şêx Es'ed jî peyrewê Mustefa Kemaleddinê Erbîlî ye. Erbîlî jî ji ehlê terîqeta Neqşebendiyan a şaxa Xalidiyan e.

2.4. Peyamên Menzûmeyê

Her berhemek an rasterast an jî bi awayekî veşarî peyaman dihewîne. Şêwaza nivîskar/helbestvan reng dide awayê vegotina peyamê û di metnê de cih digire. Teşe û cureyê din yên edebî li gorî taybetmendiyêñ xwe dibe ku bi hunerê hatibin honan, bi xemêñ estetîkê hatibin nivîsîn û peyamên veşarî bihundirînin. Heçî metnêñ dîdaktîk in pêwist e ku peyamê rasterast û xwerû bigihîjîn xwîner.

Menzûmeya *Gûz û Mêwîjê* ji ber ku berhemeke dîdaktîk e ders û şîretên metnê rasterast hatine veguhestin. Xinûkî di menzûmeya *Gûz û Mewîjê* de tevgerêñ ku ji xwendekarêñ ilmê hêvî dike bi awayekî puxtedar anîye zimêñ (Baytar, 2012, r.779). Di zanista perwerdehiyê de ji bo xwendekar an koma xwendekaran hin armanc têñ diyarkirin. Tevgerêñ armanc (target behaviors) ew tevgerêñ in ku di dawiya pêvajoya fîrkariyê de tê xwestin ku bi xwendekar re bê çavdêrîkirin (Başar, 2004: 87). Şêx Muşerref di bin banê her du mijarêñ sereke de gelek “tevgerêñ armanc” ku dixwaze feqiyêñ wî bi dest bixin rêz kiriye. Ew bi şîret û hişyariyêñ menzûmeyê armanc dike ku feqî, tevgerêñ qada bîrî û sehekî bi dest bixin. Xinûkî, şîret û peyamên xwe yên di heqê hînbûn-hînkirin û exlaqê de ji hev cihê nekiriye; li kêleka çalakiyêñ fîrbûnê ku ji qada bîrî ne, wek hêmanêñ temamker ên vê qadê li ser hin rîgezêñ qada sehekî jî rawestiyaye. Ji bo nimûne Xinûkî di malika jêrîn de ji qada bîrî wek tevgereke armanc bi “xwendin”ê re ji qada sehekî “dirustî”yê jî pêşniyar dike.

319

Bixûnin hûn nekin teqsîr û sistî

Emanet se‘y û tehsîl û durustî (Xinûkî, *Gûz û Mewîjê*)

Peyam û hişyariyêñ ku di metnê *Gûz û Mewîjê* de hatine tespîtkirin ê li gorî beşen berhemê xal bi xal bê rîezkirin.

2.4.1. Peyamên di Fesla Tehsîlê de

Xinûkî di beşa *Fesla Tehsîlê* de li ser pêdiviyêñ feqiyân ên ku têkildarê hînbûnê ne rawestiyaye. Şîretên ku Xinûkî kiriye, esasêñ bernameya perwerdehiyê yên medreseyê ne. Dersdayîn çiqas girîng be dersgirtin û hezmkirina ilmê jê girîngtir e. Mebesta Xinûkî mayîndeyiya dersê ye. Mirov dikare bejê ku Xinûkî ji bo hezmkirina dersê behsa wan merheleyan kiriye ku divê feqî li gorî wan tevbigerin. Bi giştî ev merhele: dersdayîn, dersgirtin, jiberkirin, dubarekirin, mitale, nivîsîn in.

Heke mirov li malikêñ vê beşe binêre dikare bêje ku Xinûkî peyamên wiha daye: Sistî û kemasî, di xwendinê ne baş e. Feqîtî; xwendin, dirustî û hewldan e. Dirustî serê her tiştê ye û kesê ne dirust; manen qirêj e. Xwendin di her şert û mercê de bêwestan divê bidome. Mirovê xwende wekî “emîr” e ji bo civatê,

nexwende “bêkêr (wekî pîvaz û sîr)” e. Mitale⁷ (fikirîn/dersxebitîn) divê bi baldarî bê kirin. Lewra bi mitalê ders dibe mayînde. Jiberkirina metnan gelekî girîng e. Jibîrkirin, feqî destvala dihêle. Nivîsandin ji bo xwenda, mayîndeyiya ilmê dabîn dike û wekî nexşa li ser kevirê ye. Qelem (nivîs) nîvî ilmê ye, xet (nivîs) ji bo her kesî wekî “zêr” û “zîv” binirx e.

2.4.2. Peyamêni di Fesla Qedrê Seyda de

Têkiliya di navbera seyda-feqî de di perwerdehiya medreseyê de xaleke dîtir a girîng e. Ev têkilî heke li ser hezkirin û rêzgirtinê hatibe avakirin danûstendina ilmê dê bi dilxwazî û hêsan bibe. Heke di medreseyê de di navbera seyda û feqî de rêz û hezkirineke dilxwaz (Çiçek, 2009: 108) hebe ev armanc bi hêsanî dê pêk bê. Girîngiya “nêzbûna bi hêzkirinê” bi bal xwendekar ve di perwerdehiyê de ji bo pêkhatina armancênu ku têx xwestin ji mijarênu ku herî zêde li ser tê rawestan e (Baytar, 2012, r.783).

Qedirzanîn û rêzgirtina seyda di fêrbûnê de gelekî girîng e ku bandoreke mezin li sôdwergirtina ji seyda û fêrbûna ilmê dike. Şêx Muşerref di menzûmeyê de bi çavê dersdarekî çawaniya têkiliya seyda-feqî radixe ber çavan. Xinûkî di beşa *Fesla Qedrê Seyda* de sôdwergirtina ji seyda û ilmê bi rêzgirtin, itaet û guhdarîkirinê ve girêdaye û di serê vê besê de girîngiya vê wiha ifade kiriye:

Ji bo seyda muheqqeq ferd e îkram

Kesê ku nake îkram naxwe ïn'am (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Ji seyda ger dixwazî ïstifade

Divêtin tu bikî bo ïnqiyad e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Xinûkî di malika jêrîn a beşa *Haza Kitabu Gûz û Mewîjê* de hezkirin û dilsoziya xwe ji bo feqiyên xwe eşkere dike. Xwe wekî hemderdê wan dide nasîn da ku feqiyên wî pê ewle bin, derd û xemên wan çareser bike. Di malika duyem a di dîwanê de girîngiya ku dide feqiyên xwe tîne ser zimên û wan ji aliyê zanînê ve di civatekê de wekî “çira” dibîne. Hezkirineke ku bi mal û gencîneyan nayê guhertin nîşanî feqiyên xwe daye:

Çıkû ez bo we tehqîqen evîn im

Muhîbbek şadiq im hem ïgemrevîn im (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Çira hûn in di dîwana evînan

Bi min mehbûbtir in ji mal û definan (Xinûkî, *Dîwan*, r.11)

Heke mirov li malikên vê besê binêre dikare bêje ku Xinûkî peyamêni wiha daye: Rêzgirtin û îkrama ji seyda re ji bo sôdwergirtinê ferz e. Divê ji bo

⁷ Dubarekirina dersan e. Piştî ku dersek bê stendin feqî bi mebesta li ser dersê hûrbûnê serî li çavkaniyê din dixin, lêkolînê dikin, dixwînin û difikirin. Bnr. (Develioğlu, 2002).

îstifadeyê ûtaet ji seyda re bê kirin. Ïtaet neyê kirin feqî nikare sûdwerbigre. Heke ûtaet neyê kirin wê gavê seydayê feqî, dibe “nefsa nezan”. Eşkere jî veşarî jî hezkirin ji bo seyda divê. Hezkirin ji yê ku ji seyda hez neke re navê. Feydeya ku alim bide ji ya bav mayîndetir e.

2.4.3. Peyamêni di Fesla Mu'amela Hevalan de

Guncawbûna cihê perwerdehiyê ji aliyê sûdwergirtina ji ilmê ve girîng e. Ji bilî başî û xirabiya şertên fizikî, hebûn an tunebûna aramiya cih/mekanê jî bandoreke erêniyan neyînî li perwerdehiyê, rasterast jî li xwendekar dike. Tekiliyêni di navbera xwendekaran de çawa ku bandorê li mejiyê wan dikin herwiha bandorê li derûniya wan jî dikin. Heke cihê perwerdehiyê aram be û têkiliyêni di navbera xwendekaran de baş bin sûdwergirtina ji perwerdehiyê dê di asta herî bilind de be. Xinûkî ji ber vî bala feqîyan kişandiye vê rastiyê û xwestiye ku aramiyê di medreseye û navbera feqîyan de dabîn bike. Xinûkî berevajiyê pergala perwerdehiyê yên nûjen di medreseyê di şûna reqabetê de hurmet, xizmet û hevparastinê peşniyar dike. Wekhevî bingeh e, kes ji kesî ne bilindtir e, her kes li hizûra Xwedê yek tê dîtin.

Xinûkî, di beşa *Fesla Mu'ameleta Hevalan* de ji bo aramiya şexsî û mekanê fîrbûnê (medrese) herwiha ji bo têkiliyêni navbera feqîyan şîret kirine. Çareseriya pirsgirêkîni di navbera feqîyan de bi “xweşborîn” û “xwendina bi meqseda îlahî” formûlîze kiriye û wiha gotiye:

321

Bi hev ra xweş biborînin bi şahî
Bixûnin hûn bi meqşûda Îlahî (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Heke mirov li malikêni vê beşê binêre dikare bêje ku Xinûkî peyamêni wiha daye: Divê feqî bi hev re bi şahî tevbigerin. Armanca xwendinê “gihîştina Xwedê” ye. Hurmeta di navbera feqîyan de dewamîyê dixwaze. Xizmetkirina feqîyan ji hev re rîgezeke bingehîn e. Hevparastin, di navbera feqîyan de gelekî girîng e. Pewîst e ku ji yên pirxwendî re rîz bê girtin. Hemû feqî eskerê Xwedê û xizmetkarê dîwana wî ne. Heke feqî ji hev re nebaş bin ê ji medreseyê û fêkiyêni wê bêpar bimînin. Pevçûna feqîyan sedemê fihêtkirin û zererê ye. Xizmetkirin û ratibanîn⁸ divê zor neyê dîtin. Paqijiya hicrê⁹ divê neyê îhmalkirin. Xwemezindîtin û kubariya bi cil û bergen şerm e.

2.4.4. Peyamêni di Fesla Exlaqê de

⁸ Xwarina feqîyan a ku ji hêla xelkê derdora medreseyê ve tê temînkirin e. Her sibê û êvarê feqîyan ji malekê, xwarina hazır ci bûya ew dianî û bi hev re dixwarin. Her çend ev adet ji bo parastina rûmeta alim û ilmê ji aliyê hin seyda û feqîyan ve neyînî bê dîtin jî di medreseyê Kurdistanê de kevneşopiyek kevin e.

⁹ Seyda di medrese yan mizgeftan de di cihekê ku bi navê “hicre” tê binavkirin de dersan didin. Seyda mîvanen xwe jî li vir pêşwazî dike.

Armanca dînê Îslamê -nemaze ya terîqetan- bi giştî terbiyekirina nefşê ye. Wekî nûnerekî Îslamê yan terîqetê feqî, divê li ser exlaqekî baş û xweşik terbiye bin. Ji ber vê yekê jî tenê ilim ne bes e ji bo feqîyan. Lewra feqî endamên pêşektiya civakê ne û pêwîst e ku ji aliyê helwestêن xwe ve jî bêñ perwerdekirin. Xinûkî herçend ji bo şîret û hişyariyê exlaqî beşa *Fesla Exlaqê* terxan kiribe jî ji ber ku gelekî girîngiyê daye exlaqê di hemû beşan de digel şîretêñ din cih daye şîretêñ exlaqî jî. Ji bo têkiliya şexsî û civakî li ser hin qaîdeyêñ rabûn û rûniştinê rawestiyaye. Ji bo nimûne:

Di nava gund herin meşyek giranî
Li rast û çep nezer ‘eyb e tu zanî (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Muheqqeq pir kenîn û dengbilindî
Munaffî ne ji bona ‘eqlimendî (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Medrese tenê ne cihê dersên eqlî ne, du bask in. Feqî divê bi dersên pozitîf/maddî hişê xwe, bi dersên dînî/manewî jî giyanê xwe bikemilînin. Perwerdehiya exlaq û kesayetê perwerdehiya medreseyê temam dike. Ji bo parastina rûmeta ilmê û mînakbûna ji civatê re ev xal gelekî girîng e. Mirov dikare bêje ku di serî de beşa *Fesla Exlaqê* pişt re jî *Fesla Qedrê Seyda, Fesla Mu ‘amelata Hevalan* ji bo feqîyan rêziknameyeke exlaqî ye.

322

Heke mirov li malikên vê besê binêre dikare bêje ku Xinûkî peyamên wiha daye: Çavê feqîyan divê ne li xwarinê ne jî li cil û bergen be. Mijûlbûna bi por û kincan ne exlaqê feqîyan e. Hişê feqî divê li dersên wî be, ne li xwarinê be. Sohbet û têkilî divê di navbera feqîyan de be û ji bilî feqîyan sohbet û têkilî ne mimkun e. Feqî divê bi sergiranî bimeşe. Nihêrtina li rast û çepê şerm e. Pirkenîn û dengbilindî li kesê aqilmend nayê. Paqijiya derdor divê neyê îhmalkirin. Hebûna qîş û kal li hicrê eyb e.

2.5. Rêgez, Stratejî û Rêbazêñ Hîndekariyê di Menzûmeyê de

Menzûmeya *Gûz û Mewîjê* ji bo feqîyan çawa ku wek rêbereke biçûk a perwerdehî û exlaqê ye herwiha wek mamoste/seydayekî nêrînêñ Şêx Muşerrefê Xinûkî jî di heqê armancêñ qada bîrî û sehekî de hin argumanan pêşkêş dike. Xinûkî ji ber ku merheleyêñ feqî tê de derbas dibin pêk aniye, pêdiviyêñ feqîyan ên qada bîrî û sehekî baş dizane û bi nêrîneke empatîk ders û şîretêñ xwe rêz kiriye.

Bernameya mufredatê ya medreseyê di qada ilmê de digel mercêñ îroyîn kêm bê dîtin jî ev bernâme armanc dike ku xwendekar agahiyan bi awayekî baş bi dest bixin, van agahiyan ji xwe re bikin meleke û ji bo mayîndeyiya wê jî rêbazekê baş dihat şopandin (Çiçek, 2009: 205). Her çiqas di perwerdehiya medreseyê û awayê fêrkirina feqîyan de metodêñ klasîk bêñ bikaranîn jî hin rêgez û rêbazêñ hîndekariyê ku di nav pergala medreseyê de têñ bikaranîn di zanista

perwerdehiyê ya nûjen de jî têñ bikaranîn. Dikare ji aliyê rê û rîbazên hîndekariyê ve ji naveroka menzûmeyê hin xalêñ hevbeş bê derxistin ku hem di pergala perwerdehiya medreseyê û hem jî di zanista perwerdehiyê ya nûjen de tê dîtin.

2.5.1. Rêgezêñ Hîndekariyê

Xinûkî bi rîbazeke pedagojîk dest bi şîretêñ xwe kiriye û ji rêgezêñ ku niha di zanista perwerdehiyê de jî têñ bikaranîn sûd wergirtiye. Xinûkî di menzûmeyê de hem ji hêla polîmkirina mijarê ve hem jî di rê û rîbazên hîndekariyê de rêgeza qedemetiyê (the principle of graduality) bi kar ankiye. Xinûkî balkîşandiye ders û şîretêñ ku pêdivî bi wan heye û bi vî awayî dest bi berhemê kiriye, pişt re bi girîngiya xwendinê, qedirdayîna seyda, muameleya bi hevalan re û bi şîretêñ exlaqî dawî li mijarê ankiye.

Dema çalakiyêñ perwerdehî û hîndekariyê bêñ pêkanîn naveroka dersê ya ku mamoste pêşkêş dike heke mimkun be divê bi qada jiyanê ya ferdî re rasterast têkildar be. Fêrker di mijar û pirsgirêkên ku pêşkêş dikin, di mînakêñ didin û di bijartina bûyeran de beriya her tiştî divê derdora civakî û siruştî yê ku xwendekar tê de dijî bide ber çavan (Aslan û Eker, 2019: 18). Xinûkî hem ji bo navê menzûmeya xwe hem jî ji bo hişyarî û şîretêñ ku kiriye du xurekêñ -gûz û mewîj- ku feqî jê haydar in bi kar ankiye. Xinûkî bi bikaranîna heyberêñ nêz ango herêmî xwestiye ku şîret û hişyarî bi riya nêzîkkirin û şenberkirinê di mejîyê feqîyan de cih bigirin. Li gorî van agahiyan mirov dikare bêje ku Xinûkî rîbaza ji nêz ber bi dûr ve (the near away principle) bi kar ankiye.

323

Ji bo qet‘a xirabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye *Gûz û Mewîj* e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Fêrker di pêvajoya hîndekariyê de tişt, heyber û mînakêñ di heqê mijara dersê de çîqas zêde bi kar bîne şenberkirin di wê pîleyê de bibandor dibe (Aslan û Eker, 2019: 17). Lêkolînêñ berê hatine kirin, nîşan dane ku hawirdorêñ hîndekariyê yên ku taybetmendiyêñ hem razber hem jî şenber bihundirîne, li gorî bikaranîna tenê yek ji vana bibandortir e. Lewra di fêrkirinê de bikaranîna metodêñ şenber, hînbûnê hêsan dikin. Ji bo nimûne, Xinûkî di malika jêrîn de encama guhdarîkirin û bandora şîretêñ xwe bi “şîrê tîj”- ku alavake şenber e- sembolîze kiriye û ji bo “jiholêrakirina xirabiyê” -ku tevgereke razber e- wek çareseriyeke nîşan daye. Xinûkî bi vî şiklî rêgeza ji şenber ber bi razber ve (the concrete to abstract principle) bi kar ankiye.

Ji bo qet‘a xirabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye *Gûz û Mewîj* e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Rêgeza zelalbûnê yek ji rêgezên perwerdehiyê ye û di veguhestina dersê de wekî pira di navbera fêrker û xwendekar de ye. Zimanê fêrker ê ku di pêvajoya hîndekarî û hînbûnê de dê bi kar bîne divê di asta têgihiştina xwendekaran de be. Zimanê vekirî, fêmbar û net dike ku ders ji aliyê girseya armancê (koma xwendekaran) ve bê xunaftin, hînbûna dersê hêsan dike (Aslan û Eker, 2019: 18). Xinûkî şîretên xwe hem bi formeke sade hem jî bi zimanekî vekirî û xwerû vegotkiye. Ji ber vê dikare bê gotin ku rêgeza zelalbûnê (the principle of clarity) li ber çavan girtiye.

Fêrker di jiyana rasteqîn de çiqas cih bide rewşen ku dê ferd rastî wan bê, hînbûna xwendekar ewqas ê watedar bibe. Di nêrîna perwerdehiya nûjen de divê pêvajoya fêrkirinê ji jiyanê ne qutbûyî be, agahî û detsbikarên ku ferd hîn dibe divê karibe bi kar bîne. (Aslan û Eker, 2019: 19). Agahiyên ku Xinûkî di heqê hînbûnê de nemaze şîretên di heqê rabûn û rûniştin û exlaqê de daye ji bo jiyana şexsî û civakî ya feqiyân şîret û rêgezên bingehîn in. Ev xal jî nîşan dide ku Xinûkî rêgeza jîndariyê (the principle of vitality) bi kar ankiye.

Di perwerdehiyê de nirxandina bi tevahî yên hêlên ferd ên ku bênen perwerdekirin girîng e (Aslan û Eker, 2019: 20). Xinûkî di menzûmeyê de tu ciyawazî naxe navbera xwendin û exlaqê. Bi şîret û hişyariyên xwe yên di heqê xwendinê de dixwaze ku “riya fêrbûnê” fêr bike; bi yên rabûn û rûniştinê jî dixwaze ku xwendekarên xwe bigihîne asteke baş a exlaqî. Bi van her duyan jî armanc dike ku feqiyên xwe hem di qada bîrî hem jî di qada sehekî de perwerde bike. Xinûkî bi vê perwerdehiya du bask li gorî rêgeza tevahiyê (the principle of integrity) tevgeriyaye. Ji bo nimûne, Xinûkî di malika jêrîn a yekem de wek rîbazeke fêrbûnê li ser merheleya nivîsinê; di malika duyem de jî li ser rîzikeke civakî rawestiyaye:

Nivîsandin qe nahêlî ku xwenda
Ji ‘ilmê xwe biket yek lefzê winda (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Di nava gund herin meşyek giranî
Li rast û çep nezer ‘eyb e tu zanî (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

2.5.2. Stratejî û Rêbazên Hîndekariyê

Xinûkî di menzûmeya xwe de stratejiya hîndekariyê ya bi riya pêşkêsiyê (teaching strategy through presentation) bi kar ankiye. Tan û Erdogan dibêjin ku: Di perwerdehiyê de ev stratejî dixwaze ku di heqê tevgerên armanc (target behaviors) de agahî, helwest û destbikaran bide bidestxistin. Mebesta van agahiyên ku berê hatine amadekirin, veguhestina xwendekar an koma

xwendekaran e. Bi giştî hîndekariya bi riya pêşkêsiyê di rewşen ku xwendekar, hînkirina agahiyên di heqê têgeh, bûyer û diyardeyan bikesibînin de, tê bikaranîn (Tan û Erdogan, 2004: 55). Ji bo nimûne Xinûkî di malika jêrîn a beşa *Fesla Tehsilê* de rewşa kesê “xwenda” û “nexwenda” bi awayekî berawirdî raxistiye ber çavan û rewşa kesê xwenda wekî “emîr”, encama nexwenda jî bi şibandina “pîvaz” û “sîr”ê şayesandiye.

Kesê xwenda muheqqeq her emîr e

Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Xinûkî di malika jêrîn a beşa *Fesla Exlaqê* de jî ji bo kesê aqilmend tiştên neyînî diyar kiriye:

Muheqqeq pir kenîn û dengbilindî

Munaffî ne ji bona ‘eqlimendî (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Di zanista perwerdehiyê de nêrînên hîndariyê li ser rîbaza xebata takekesî (individual study method) û teknîka pirs û bersivê (question and answer teaching method) radiwestin. Di van nêrînan de tê armanckirin ku xwendekar bi serê xwe mijarekê lêbikole û bi teknîka pirs û bersivê li ser mijaran hûr bibe (Şışman, 2011: 16). Li gorî vê agahiyê em dikarin bêjin ku di menzûmeyê de Xinûkî bi çalakiyên dubarekirin, jiberkirin, mitale, nivîsînê û pişti van çalakiyan jî bi pirsên seyya û bersivên feqî rîbaza xebata takekesî û teknîka pirs û bersivê li ber çav girtiye.

325

Xinûkî menzûmeye xwe di meheke biharê (adar) de li kêleka kaniyekê (Kaniya Tûjhê) nivîsiye û bi feqiyên xwe re jî parve kiriye. Ev agahî di jerenota menzûmeyê de cih digire û malika jêrîn a beşa *Haza Kitabu Gûz û Mewîjê* jî vê agahiyê piştrast dike.

Kelamê min xweş û pur nazidar e

Şirîn e taze ye wek nûbihar e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Diyar e ku Xinûkî mekanê ilmê tenê bi medreseyê ve sînordar nekiriye. Dibe ku bi geştekê di hawîrdoreke siruşî de xwestibe ev şîretên ku wekî rîziknameyekê ne di dil û mîjîyen feqîyan de cih bigire û bandor li wan bike. Ev rîbaz di zanista perwerdehiyê de ji teknîkên hîndekariyê yên çalakiyên derveyî polê (non-class activities) têzanîn û wek metoda geştê (trip method) tê binavkirin. Metoda geştê, serdanêni biplan ên bi mebesta ku xebatêni dibistan û polê bêntemamkirin û xebat watedartir bibin tê tetbiqkirin (Tan û Erdogan, 2004: 88).

Rola mamoste di hîndekariyê de xwedî behreke mezin e û di gihîştina mebestê de ragihandina di navbera mamoste/çavkanî (resource) û xwendekar/wergir (receiver) de girîng e. Heke ev têkilî xurt be peyam ê bi hêsanî û dilxwazî bigihîje wergir. Xurtbûna têkiliyê jî girêdayî hezkirin, ewledardîtin û hêjadîtina fêrker e. Di vê merheleyê de kes, nirxa tiştekî qebûl dike û li hember nirxa ku qebûl dike eleqe û girêdanê nîşan dide (Tan û Erdogan, 2004: 21). Xinûkî bala

feqiyên xwe kişandiye van xalan, ji gotinên xwe re kiriye palpişt û ji bo ku feqî girîngiyê bidin gotinên wî xwestiye ku berî her tiştî li seydayê xwe ewle bin, jê hez bikin û ji bo sûdwegirtinê jê re îtaet bikin. Xinûkî van daxwazên xwe di malikên jêrîn ên beşa *Fesla Qedrê Seyda* de wiha îfade kiriye:

Ji bo seyda muheqqeq ferd e îkram
Kesê ku nake îkram naxwe ïn‘am

Ji seyda ger dixwazî îstifade
Divêtin tu bikî bo ïnqiyad e

Ji seyda ra kesê naket itâ‘e
Qe nabînî di dunya ïntifa‘e (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Şêx Muşerref di heqê “girtina qedrê seyda” de ji gotinên du şexsên girîng ku yek jê kesayeteke dînî û yê din jî dîrokî ye mînak daye. Yek jê Îmamê ‘Elî¹⁰ ye û yê din Skender e.¹¹

Îmamê me ‘Elî dêjî: Efendim
Li her ‘erđê ji bo ustادî ‘ebd im (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Yekî got: ey Sikender bo çi daîm
Dikî teqdîm li ser babê xwe ‘alim (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Ev alimê ku Skender qedrê wî li ser ê bavê xwe girtiye filozof Arîstoteles e. Kralê Makedonyayê Phîlîppos ji bo perwerdehiya kurê xwe Skender, Arîstoteles vedixwîne qesrê (342) û Arîstoteles bi qasî heft salan mamostetiya kurê wî dike (Cevizci, 2011: 362). Piştî atifa gotina Hz. ‘Elî mînakanîna ji Arîstoteles û Skender nîşan dide ku Şêx Muşerref çiqas xwedî asoyeke berfireh e (Baytar, 2012, r. 784). Bi vî şîklî Xinûkî ji metodên hîndekariyê ya zanista perwerdehiyê rîbazâ bûyera mînakê (case method) bi kar aniyê.

Xinûkî ji bo qedrê seyda bi feqiyên xwe bide zanîn gotineke¹² Îmamê ‘Elî (598-661) bi bîr dixe. Ev di analîza metnên edebî yê pexşanî de yek ji “riyên geşepêdana ramanê” ye û wek govan nîşandan (witnessesing) tê binavkirin. Di vî rîbazê de ji bo piştrastkirina fikrekî ji gotina kesekî navdar tê sûdwegirtin.

¹⁰ Ebu'l-Hesen Elî b. Ebî Talib el-Kureşî el-Hasîmî (m. 40/661). Ji Musilmanên pêşîn. Zavayê Hz. Pêxember û xelifeyê çarem. Bnr. (Fiğlalı, 1989: 371-374).

¹¹ Alexandros (b.z.356-323). Kralê Makedonyayê yê ku di dîroka Îslâmê de zêdetir bi şexsîyeta xwe ya efsanewî tê nasîn. Bnr. (Kaya, 2000: 555-557).

¹² “Ê ku herfekî hînê min bike ez ê cil salî xulamtiya wî bikim.”

Xinûkî ji bo girîngiya ilm û alimê rave bike di van malikan de serî li “ciwankariya telmîhê” jî xistiye. Telmîh di nava gotinekê de îşaretkirina qissem, efsane, bûyereke dîrokî herwekî din e (Saraç, 2016: 282). Xinûkî bi riya rîbaza bûyera mînakê, govan nîşandan û telmîhê ramanen xwe yê di heqê têkiliya seyda û feqî de xurt dike. Her çiqas metnên dîdaktîk ji xemên estetîkê dûr bin jî ji bo piştrastkirina ramanan nivîskar/helbestvan carinan serî li hunerên edebî jî dixin. Lîbelê mebest ne huner e.

Bangkirin, di perwerdehiyê de cureyeke balkışandinê (getting attention) ye. Nivîskar an vebêj jî ji ber armancê cur bi cur serî li hunera nîdayê dide. Carinan kelecanâ xwe, carinan hêrsa xwe, carinan kîfxweşîya xwe, carinan daxwaza xwe ya zêde, carinan dilrehmiya xwe û hwd. îfade dike (Adak, 2017: 75). Berhem bi bang/nîdayê dest pê kiriye. Şêx Muşerref bi mebesta îfadekirina girîngiya şîretên ku dê bike vê hunerê bi kar anîye; bi banglêkirinê feqiyên xwe ji armancê ku xwestiye bide bidestxistin haydar kiriye û wiha bang kiriye:

Gelî feqyan gelî feqyan nezer kin
Heçî bêjim bizanin hem ji ber kin (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Dubare (repetition) di hîndekariyê de rîbazeke balkışandinê ye. Xinûkî di malika jêrîn a beşa *Fesla Mu ‘amelata Hevalan* de bi dubareya îfadeya “emanet sed emanet sed emanet” bala feqîyan kişandiye ser girîngiya têkiliya navbera feqîyan û hunera tekrîrê bi kar anîye:

Emanet sed emanet sed emanet
Ji bona hev bikin daîm şîyanet (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

Xinûkî hin ders û şîretên xwe bi sembol û metaforan daye. Gotinên xwe wekî “nûbihar”ê “şîrîn” û “taze”, ji rastkirina xirabiyê re wekî “şûrê tûj”, ji bo feydeyê û çêjê jî wekî “gûz û mewîj” pênase kiriye. Kesê xwenda wekî “emîr”, nexwenda wekî “pîvaz û sîr” bê kîr dîtiye. Ilmê bi “qelem”ê sembolize kiriye, wekî “zêr û zîv” bi nirx dîtiye. Kesê ku ji seyda re îtaet nake, seydayê wî wek “nefsa nezan” rave kiriye. Feqî wekî “eskerê xas ê Îlah”, “xadim û xulamê bargah” dîtine. Xwarinê bi “kevçik”ê nimandiye. Mijûlbûna bi cil û pirçik wekî “exlaqê jinan”; kesê ku mebesta xwendina wî mal û dirav be; metnê wî bi “nan” îfade kiriye.

Encam

Edebiyat di vegûhestina hest û ramanan de navgîneke gelekî guncaw e. Wek cureyeke helbestê, helbesta dîdaktîk ango fîrkarî jî di veguhesîna agahiyêñ zanistî û şîretên exlaqî de roleke girîng dilîze. Piştî ku bizava dîdaktîzmê wekî cureyekî dikeve bin banê edebiyatê, edebiyata klasîk jî para xwe jê wergirtiye û gelek kesayetên dînî yan jî edebî bi vê formê berhem nivîsîne. Yek ji van kesan jî ku di sedsala dawî de jiyaye û berhem daye Şêx Muşerrefê Xinûkî ye. Xinûkî

berhem xwe ya bi navê *Gûz û Mewîjê* bi mebesta “hînkirina rê û rîbazên fîrbûnê” û “rabûn û rûniştin” a feqîyan nivîsiye. Menzûme dema ku hatiye nivîsîn wekî rîzikanameya ders û şîretên exlaqî hatiye pejirandin, jibekirin û di nav medreseyê Kurdistanê de belav bûye.

Berhem ji ber ku nîrînên Xinûkî yên di heqê perwedeöhî û exlaqê de pêşkêş dike hem jî merhele, rê, rîbaz, stratejî û rîgezêñ pergala medreseyê dihundirîne girîng e. Aliyekî din ê balkêş jî ew e ku ev merhele, rê, rîbaz, stratejî û rîgezêñ perwerdehiya medreseyê yên ku Xinûkî wek metodolojî bi kar anîye di zanista perwerdehiyê ya nûjen de jî têñ bikaranîn û xalêñ hevpar radigire.

Xinûkî menzûmeya xwe bi teşeya mesnewiyê nivîsiye. Teşeya mesnewî ji ber taybetmendiyêñ xwe yên ruxsarî û naverokî karê helbestvan hêsan kiriye. Berhem ji ber ku perwerdekirina mijarêñ hîndekarî û exlaqî ji xwe re kiriye armanc ji xema hunerî dûr e. Zimanê berhemê xwerû, vekirî û herêmî ye. Menzûme ji aliyê kêş û serwayê ve serkeftî ye. Menzûme hem ji aliyê ruxsarî hem jî naverokî ve bi pergala edebiyata klasîk hatiye nivîsîn û di vê çarçoveyê tê qebûlkirin.

3. Rêbaza Amadekirina Menzûmeyê

Latînîzeya berhemê di çarçoveya xalêñ jêrîn de hatiye kirin:

328

1. Latînîze û transkirîbsiyon li gorî kopiya destxet a orîjinal a Şêx Muşerrefê Xinûkî hatiye kirin.
2. Latînîzekerîna tîpêñ Erebî li gorî transkirîbsiyona standart a li jêr hatiye kirin.

Tablo 2. Transkirîbsiyona tîpêñ Erebî yên di menzûmeyê de

ê	û	û	û	û	û	û	û	û	û	û
Ğğ	'	Zz	Tt	Dd	Ss	Zz	Hh	Ss	'	

3. Metnê menzûmeyê li gorî sernavêñ beşen destnivîsarê bi rîzê ji 1ê heta 6an hatiye nûmerekirin. Dema ji malikan mînak hatine dayîn ji ber ku malikêñ berhemê hindik in (39 malik) tenê navê helbestvan û berhemê di nav kevanekê de hatiye nîşandan. Ji bo mînak:

Ji wê behra ku jê rihtî bi qencan

Bike îhsan ji bo me yek du fincan (Xinûkî, *Gûz û Mewîj*)

4. Ji ber ku berhem mesnewî ye û hemû beş bi heman weznê hatine nivîsîn qalibê erûzê tenê di destpêka berhemê de hatiye bicihkirin.
5. Hevokêñ Erebî îtalîk hatine dayîn û wateyêñ wan di jêrenotan de cih girtine.

4. Metnê Gûz û Mewîj

4.1. Haزا Kîtabu Gûz û Mewîj¹³

[Mefa’î lun Mefa’î lun fe’ulun]

Bîsmîllahî'r-Râhmanî'r-Râhîm

- ¹ Gelî feqyan gelî feqyan nezer ken
Heçî bêjim bizanin hem ji ber ken
- ² Çikû ez bo we tehqîgen evîn im
Muhibbek şadiq im hem ȝemrevîn im
- ³ Kelamê min xwes̄ û pur nazidar e
Şirîn e taze ye wek nûbihar e
- ⁴ Ji bo qet‘a xirabî şîrê tîj e
Wekî navê xwe ye gûz û mewîj e

329

4.2. Feşla Tehşîlê

- ¹ Bixûnin hûn neken teqsîr û sistî
Emanet se‘y û tehşîl û durustî
- ² Durustî lefzekî kurt û dirêj e
Kesê ku ew durust nabî qirêj e
- ³ Bixûnin hûn di havîn û zivistan
Nebî çê bî ji we yek roj(i) westan
- ⁴ Kesê xwenda muheqqeq her emîr e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e
- ⁵ Bi diqqet hûn biken daîm miştale
Miştale malekî qet bêzewal e

¹³ Wate: Ev kitêba *Gûz û Mewîjê* ye.

- ⁶ Ji metnan qet nebî lefzek ji bîr ken
Xwe destvala we bê mal û feqîr ken
- ⁷ Nivîsandin qe nahêlî ku xwenda
Ji ‘ilmê xwe biket yek lefzê winda
- ⁸ Ji ‘ilmê ra qelem laşekk e nîv e
Ji bona her kesî xet zêr û zîv e

4.3. Feşla Qedrê Seyda

- ¹ Ji bo seyda muheqqeq ferd e îkram
Kesê ku nake îkram naxwe ïn‘am
- ² Ji seyda ger dixwazî ïstifade
Divêtin tu bikî bo ïnqiyad e
- ³ Ji seyda ra kesê naket ita‘e
Qe nabînî di dunya ïntifa‘e
- ⁴ Eger jê ra muṭî‘ nabî bizane
Ku seydayê te ew nefsa nezan e
- ⁵ Ji bo wî ژahir û batin evîn be
Kesê ku ew nevê jê ra nevîn be
- ⁶ Îmamê me ‘Elî dêjî: Efendim
Li her ‘erđê ji bo ustادî ‘ebd im
- ⁷ Yekî got: ey Sikender bo çi daîm
Dikî teqdîm li ser babê xwe ‘alim
- ⁸ Cewab da: Faida babê fena ye
Welakin faida ‘alim beqa ye

330

4.4. Feşla Mu‘ameleta Hevalan

- ¹ Bi hev ra xweş biborînin bi şahî
Bixûnin hûn bi meqşûda Îlahî
- ² Bi ھurmet bin ji bona hev dewamî

Hemî pêk ra ji hev ra ken ǵulamî

- ³ Emanet şed emanet şed emanet
Ji bona hev biken daîm şıyanet
- ⁴ Xuşûşen yê ku lefzek zêde xwendî
Hemî hev ra ji bo bêjin: Efendî
- ⁵ Hemî hûn ‘eskerê xaş ê Îlah in
Gulam û xadimê wî barigah in
- ⁶ Eger ku hûn ji bona hev ne baş bin
Ji dergeh dê li paş bin bê me‘as bin
- ⁷ Nebî carek di dunyaê ku şer ken
Heta saqin! Fihêtkar û ȝerer ken
- ⁸ Nebêjin: Ratiba min zêde dûr e
Weya ev xizmeta hanê bi ȝor e
- ⁹ Nikarim ez hero ȝucrê bimalim
Li mala xwe ‘ezîz û hem delal im
- ¹⁰ Kubar im min ji şalê xwe fihêt e
Binêre işlikê min şibhê pêt e

331

4.5. Feşla Exlaq

- ¹ Nebî çavê we daîm bî li kevçik
Weya şalê hêşîn û ya ne pirçik
- ² Cil û pirçik ji exlaqê jinan e
Biha naket kesê metnê wî nan e
- ³ Ji bo feqyan civat û hem ‘elaîq
Digel ȝeyrî feqan qeṭ nîne laîq
- ⁴ Di nava gund herin meşyek giranî

Li rast û çep nezer ‘eyb e tu zanî

⁵ Muheqqeç pir kenîn û dengbilindî
Munâfi ne ji bona ‘eqlimendî

⁶ Cihan paqîj biken çendî bikarin
Di hucran qîrş û qal wek ‘eyb û ‘ar in

4.6. Xatîme

¹ Îlahî tu min û feqyan Îlahî
Himayet ke ji ef’alê menahî

² Me şîrîn key bi wan ewşafê şîrîn
Gelek muhtac û ne’lac û feqîr ïn

³ Ji wê behra ku jê rihtî bi qencan
Bike îhsan ji bo me yek du fincan

332

Çavkanî

- Abdülhadioglu, A. (2013). Arap Edebiyatında Didaktik Şiir. Yayınlannamamış Doktara Tezi. Erzurum: Atatürk Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü, Doğu Dilleri ve Edebiyatları Anabilim Dalı.
- Adak, A. (2014). Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2019). Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, A. (2017). Belaxet (Rewanbêjî). Pirtûka Dersê ya Çapnebûyî. Mêrdîn: Zanîngeha
- Mardîn Artukluyê. Enstîtûya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî.
- Aslan, A. û Eker, C. (2019). Öğretimin Plânlanması ve Genel Öğretim İlkeleri. Ankara: Nobel Akademi Yayıncılık.
- Aykaç, Y. (2015). Dîwana Hezîn. Teza Lisansa Bilind a Çapnebûyî. Çewlik: Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanê Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî.
- Başar, H. (2004). Sınıf Yönetimi. Ankara: Anı Yayıncılık.
- Baytar, Y. (2012) “Şeyh Müşerref’in Hayatı, Eserleri ve Eğitim-Öğretim ile İlgili Görüşleri”. Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler, Uluslararası Sempozyum Muş, 771-795.
- Cevizci, A. (2011). İlkçağ Felsefe Tarihi. Bursa: Asa Kitabevi.

- Cûdî, A. (2008). Edîbê Mezin Şêx Muşerrefê Xunûkî Çû Rehmeta Xwedê. Nûbihar. h:104. 19-21.
- Çiçek, M. H. (2009). Şark Medreselerinin Serencâmi. İstanbul: Beyân Yayınları.
- Develioğlu, F. Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat. Ankara: Aydin Kitabevi, 19 Baskı, 2002.
- Dilaçar, A. (1995). Kutadgu Bilig İncelemesi. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Doskî, T. Î. û Sadînî, M. X. (2013). Şêx Muşerrefê Xunokî. Nûpelda. h:14. 9-19.
- Fığlalı, E. R. (1989). "Ali". TDVİA. (c.2, 371-374).
- Fesaî, M. R. (1960/1380). Enwa'ê Şî'rê Farisî. Sîraz: Intîşaretê Novîd.
- Hezîn, M. H. (2011). Guldan. Stenbol: Nûbihar.
- Încıdağı, A. S. (2015). Mevlâna Mesnevî'sinde Yer Alan Bitki ve Meyvelerin Tasavvuf Dünyasındaki Sembolik Anlamları. Basılmamış Yüksek Lisans Tezi. Konya: Selçuk Üniversitesi, Mevlâna Araştırmaları Enstitüsü, Mevlâna ve Melevilik Araştırmaları Anabilim Dalı.
- Karaismailoğlu, A. (2002). "Kelile ve Dimne". TDVİA. (c.25, 210-212).
- Kaya, M. (2000). "İskender". TDVİA, (c.22, 555-557).
- Oral, B. (Ed.). (2011). Öğrenme ve Öğretme Kuram ve Yaklaşımları. Ankara: Pegem Akademi Yayınları.
- Pala, İ. (2014). Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü, İstanbul: Kapı Yayınları.
- Pala, İ. (2006). "Nasihatname". TDVİA. (c.32, 409-410).
- Pertev, R. (2008). Zarok û Çîrok, Stenbol: Weşanên Dozê.
- Saraç, M. A. Y. (2015). Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye. İstanbul: Gökkube Yayınları.
- Saraç, M. A. Y. (2016). Klasik Edebiyat Bilgisi: Belâgat. İstanbul: Gökkube Yayınları.
- Sönmez, N. (2018). Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî (Metn û Lîkolîn). Diyarbekir: Seyda Yayınları.
- Şâfiî, M. İ. (1984). Divan (Zarzûr Naim). Beyrut: Dâr el-Kutub el-'Ilmiyye.
- Şışman, M. (2011). Eğitim Bilimine Giriş. Ankara: Pegem Yayıncılık.
- Tan, Ş. û Erdogan, A. (2004). Öğretimi Planlama ve Değerlendirme. Ankara: Pegem Yayıncılık.
- Tosun, N. (2004). Tasavvuf Kültüründe Meyve. Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi, Sayı:13, Yıl:5, 289-300. Erişim Tarihi: 29.08.2020, http://www.tasavvufdergisi.net/Makaleler/1818072996_13_18%20necdet%20otosun.pdf
- Xanî, E. (1986). Nûbar (werger ji tîpêñ Erebî: Z. Kaya). Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- Xinûkî, Ş. M. Dîwan (Destxeta Mele Usman). Berhema Çapnebûyî.
- Yıldırım, K. (2008). Eqîdeya Îmanê (Analiz ve Şerh). Stenbol: Weşanên Avesta.

Pêvek:

هَذِهِ كِتابُ كُوْرُوْرَة		لِسْنَةِ بِرْنَدِ الرِّجْلِ الْجَنْوِيِّ
جَحْوَرْتَمْ بَرْ سَهْمَ زَبَرْ كَرْ	جَحْوَرْتَمْ بَرْ سَهْمَ زَبَرْ كَرْ	كَانْ عَيْانَ كَلْيَ تَفَنْ دَطَرْ كَرْ
شَبَرْ كَرْ تَارْ كَهْ فَلَدْ لَيْلَانْ	شَبَرْ كَرْ تَارْ كَهْ فَلَدْ لَيْلَانْ	كَلَادْ لَسْ خَشْ دَرْ بَرْ تَارْ دَارْ
فَصَلَالِ الْخَصِيلِ		
أَمَاتْ سَعْ وَعَصِيلْ لَيْسَى	دَرْ سَعْ لَعَكْ لَكَتْ دَرْ سَعْ	لَعْوَنْ هَوْنْ تَلْكَ قَصِيرْ جَسْتَنْ
خَوْبَدْ هَرْ كَوْ بَشَارْ سَيْدَهْ	دَدَتْ هَوْنْ بَكَنْ دَجَبَدَهْ	كَبِرْ بَدَلْخَوْهْ أَمِيرْ
خَوْتَ لَلَّادِيَنْ لَلَّاهْ كَرْ كَنْ	خَوْتَ لَلَّادِيَنْ لَلَّاهْ كَرْ كَنْ	رَسْتَارْ قَطَانْيَيْ أَخْلَانْ زَيْرْ كَنْ
خَعَامْ رَاقْلَمْ لَانْكَ لَيْفَ	رَنْمَا هَرْ كَجَرْ حَطَرْ دَرْ دَرْ	
فَصَلَالِ فَنْدَسَنْدَادِ		
كَبِيْ كَوْكَكْ كَلْكَارْ خَارْ لَيْسَى دَهْ	كَبِيْ كَوْكَكْ كَلْكَارْ خَارْ لَيْسَى دَهْ	زَغْرِسِنْ لَحْتَقْ قَقْ كَلْكَارْ
كَوْسَهْ دَهْ لَيْسَى دَهْ	أَكْرَزْ بَرْ مَطْنَيْنْ لَبْ بَرْ	رَسْنَدِيْنْ لَكْبَرْ لَكْ
هَزَرْ دَسْ زَنْوَنْ دَعْنَوْنْ	إِسَامِمَهْ عَابِيْنْ بَزَدْ أَقْنَوْنْ	زَنْ دَفَظَاهِنْ نَالِنْ أَنْبَنْ بَهْ
وَكَنْ فَالْدَادِ بَعْتَ بَهْ	وَقَنْ قَعْنَمْ لَسْلَيْنْ خَيْلَمْ	لَلَّاكِ كَفْ لَكَكْ دَيْرْجَ دَلْمَ
فَصَلَالِ مَعَالِلَةِ هَفَنْ لَانْ		
حَرْ كَلْكَارْ تَعْرَكْ لَرْ كَلْكَارْ	حَرْ كَلْكَارْ تَعْرَكْ لَرْ كَلْكَارْ	بَقْرَخُونْ بَعْرَيْنْ شَاهِنْ
حَسْنَهْ مَنْ بَقْلَوْنَ الْهَنْ	زَبُونْ أَهْفَكْ كَنْ دَلْمَيْنَ	أَمَاتْ سَهْدَهْ أَمَاتْ سَهْدَهْ أَمَاتْ
حَسْنَهْ كَيْ كَلْكَلْكَارْ بَهْ كَوْنَهْ	غَلَمْرَوْهَامْ دَهْ مَارْ كَاهِنْ	لَعْرَهْ دَهْ كَدَلْخَاسْ لَيْلَنْ
أَكْرَكْ كَوْنَهْ تَرْنَهْ كَهْ كَاهِنْ	خَنْ لَاهِنْ هَنْكَارْ كَرْ كَنْ	لَيْلَاهِنْ دَهْ دَهْ، كَوْسَرْ كَنْ
وَقَافْ جَهَنْتَهْ هَادْ دَهْ دَهْ	يَالَّا هَوْعَسْرَهْ دَهْ دَهْ	لَكَاهِهْ آزَهْ، حَرْ كَسَا لَمْ
سَهْيَهْ إِشْلَيْنْ بَرْ تَارْ حَوْفَهْ	فَصَلَالِ أَخْلَاقِ	
بَهْ أَكْهَهْ بَهْ بَهْ بَهْ بَهْ	قَنْ أَلَالِهِنْ وَيَانْ بَرْ جَنْكَ	تَهْجَافْ وَهَرْ رَامْ لَكَهِنْ
بَهْ دَهْ دَهْ دَهْ دَهْ	وَنَافَكَنْ دَهْ دَهْ بَرْ كَرْ	زَغْرِقَانْ جَهَاتْ هَمْ مَلَأْ بَقْ
وَهَرْ دَهْ دَهْ دَهْ دَهْ	جَهَانْهَهْ لَهْ كَيْ كَهْ كَارْ	مَعْقَرْ كَرْ كَنْ دَنْكَ دَلْيَهْ
خَاتَمَةُ		
حَارِتَهْ كَرْ زَاعِلَهْ مَهْ	مَهْ شَبَرْ بَرْ كَوْلَوْنَ كَوْلَوْنَ	الْهَمْ بَعْنَوْقَيْنَ إِلْعَرْ
لَيْسَهْ كَوْلَوْنَ كَوْلَوْنَ	لَسَلَهْ دَهْمَ سَلَامْ مَكْلَهْ كَهْ	زَهْ دَهْ بَحْلَهْ كَوْلَهْ بَرْ بَرْ قَعْلَهْ

Kopiya metnê Gûz û Mewîjê ya ku Şêx Muşerrefê Xinûkî bi destxeta nivîsiye

The Journal of Mesopotamian Studies

(JMS)

Yayın İlkeleri

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü tarafından çıkarılan JMS (The Journal of Mesopotamian Studies), Kürt, Arap ve Süryani dili kültürü ve edebiyatları alanlarındaki bilimsel nitelikli çalışmalarla yer veren hakemli bir dergidir. Kasım (Şubat) ve Yaz (Ağustos) sayıları olmak üzere yılda iki defa yayınlanır. Yayınlanacak yazırlarda bilimsel araştırma ölçütlerine uygunluk, alana bir yenilik getirme ve başka yerde yayınlanmamış olma şartı aranır. Bilimsel bir toplantıda sunulmuş bildiriler, yayınlanmamış olmak şartıyla kabul edilebilir.

Yazırların Değerlendirilmesi

- Dergimize gönderilen yazılar, öncelikli olarak yayın kuruluna dergi ilkelerine uygunluk açısından incelenir. İlkelerde uygun bulunanlar, iki hakeme gönderilir. Yazarlar, hakemlerin önerilerini dikkate alıp gerekli düzeltmeleri yaparlar; fakat katılmadıkları noktalara itiraz etme hakkına sahiptirler.
- Gönderilen telif makaleler, Editör Kurulu tarafından incelendikten sonra değerlendirilmek üzere “kök hakem” yöntemiyle konunun uzmanı iki hakeme gönderilir. İki hakemin görüş ayrılığı durumunda, üçüncü bir hakemin görüşüne başvurulur. Makale, en az iki hakemden olumlu rapor gelmesi halinde yayınlanır. Hakem raporları yazaraya gönderilecek karar bildirilir.
- Hakemlerden biri veya her ikisi, “düzeltmelerden sonra yayınlanabilir” görüşü belirtirse, gerekli düzeltmelerin yapılması için makale yazarına gönderilir. Düzeltme yapıldıktan sonra hakemlerin uyarılarının dikkate alınıp alınmadığı hakem veya Editör Kurulu tarafından değerlendirilir. Ayrıca yazarların, hakemler tarafından belirtilen görüşlere itiraz etme hakkı bulunmaktadır. Yapılan itirazlar editör kurulu tarafından görüşülebilir uygun bir karar alınır.
- Yayınlanmasına karar verilen yazılar, sayfa düzenlemesi yapıldıktan sonra pdf formatında yazarlara gönderilir. Yazar son okumayı yapar ve gerekli düzeltmeleri metin üzerinde işaretleyerek dergiye geri gönderir.
- Yayınlanmayan yazılar iade edilmez ve yazılarındaki görüşlerin yasal sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Yayınlanan yazılar için yazardan dergiye veya dergiden yazarla herhangi bir ücret ödenmez.
- Yayın aşamasında yazılar üzerinde esasa yönelik olmayan küçük düzeltmeler Editör Kurulu tarafından yapılabilir.
- Yayınlanan yazıların yayın hakları MAÜ Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü'ne devredilmiş sayılır. Bu devir, sanal ortamı da kapsar.
- Makale gönderimi ve değerlendirme süreci Dergipark sistemi üzerinden yürütülür.
- Makaleler değerlendirme sürecine alınmadan önce iThentica intihal programı kullanılarak benzerlik analizine tabii tutulur.

Yayın Dili

- JMS'nin yayın dili Türkçe, Kürtçe, Arapça, İngilizce ve Süryanicedir. Ancak her sayıda, dergide yer alan çalışmaların en az yarısının Kürtçe ve onun çeşitli lehçelerinde yazılmış olması ilke olarak benimsenmiştir. Dergiye gönderilecek yazıların akademik dil kullanımıyla ilgili her türlü kusurdan arınmış olması gereklidir.

Yazım Kuralları ve Sayfa Düzeni

- Yazilar A4 boyutunda kâğıda, MS Word veya uyumlu programlarla yazılmalıdır. Yazı karakteri olarak Times New Roman kullanılmalıdır. Yazilar 12 punto ve 1.5 satır aralığıyla yazılmalı, sayfalar numaralandırılmalıdır. Makalelerin uzunluğu en fazla 9.000 sözcük olmalıdır. Özel yazı karakterleri kullanılmamalı, transkripsiyon işaretleri varsa bununla ilgili dokumanlar ullaştırılmalıdır.
- Yazarın adı, soyadı, unvanı, görev yaptığı kurum, ORCID numarası ve e-posta adresi mutlaka belirtilmelidir.
- Makalenin başlığı içerikle uyumlu olup koyu harflerle yazılmalı ve 15 sözcüğü geçmemelidir.
- Makalenin başında, en fazla 150 ile 200 sözcükten oluşan bir öz yer almmalıdır. Türkçe dışındaki dillerde yazılan makalelerde öz makalenin orijinal dilinin yanı sıra Türkçe ve İngilizce olarak da yazılmalıdır. İngilizce öz kısmında makalenin ismine de yer verilmelidir. Özlerin altında genelde özele doğru sıralanmış 4 ila 6 sözcükten oluşan anahtar sözcükler bulunmalıdır.
- Başlıklar koyu harflerle yazılmalıdır. Uzun yazınlarda ara başlıkların kullanılması okuyucu açısından yararlıdır. Ana başlıkların, 1., 2., ara başlıklarınrsa, 1.1., 1.2., 2.1., 2.2 şeklinde numaralandırılması tavsiye edilir. Ana ve ara başlıkların tümü (ana bölümler, kaynaklar ve ekler) koyu harflerle yazılmalıdır.
- Metin içindeki vurgulanması gereken ifadeler, “tırnak içinde” gösterilir, eğik veya koyu karakter kullanılmaz. Hem “tırnak içinde” hem eğik veya hem koyu hem eğik yazmak gibi çifte vurgulama yapılmaz.
- Bölüm ve paragraf başlarında girinti uygulanmaz.
- Yazılarda kullanılan çizim, grafik, resim ve benzeri malzemeler JPEG ya da GIF formatında olmalıdır. Görsel malzeme ve ekler gerektiğinde e-posta yoluyla ayrıca ullaştırılmalıdır.

Kaynak Gösterimi

- Alıntı yapma ve kaynak göstermede APA yöntemi kabul edilmektedir.
- Dipnot ve kaynakların yazımı konusunda, yöntem bakımından kendi içinde tutarlılık şarttır. Uzun yapıt (kitap, dergi, gazete vb.) adları eğik, kısa yapıt (makale, öykü, şiir vb.) adları ise “tırnak içinde” yazılır. Ayrıca dipnotların yalnızca metne alınamayan ek bilgiler için kullanılması önerilir:
- Bir yapıtın derleyeni, çevireni, yayına hazırlayanı, editörü varsa künnyede mutlaka gösterilmelidir.
- Elektronik ortamda metinlerin kaynak olarak gösterilmesinde, yazarı, başlığı ve yayın tarihi belirtilmiş olanlar kullanılır. Ayrıca künnye bilgilerinde parantez içinde erişim tarihi belirtilmelidir.
- Ulaşılabilir kaynaklarda ikincil kaynak kullanımından kaçınılmalıdır.
- Atif yapılmayan çalışmalarına Kaynaklar kısmında kesinlikle yer verilmemelidir.
- Kaynaklar metnin sonunda, yazarların soyadına göre alfabetik olarak yazılmalıdır. Eserlerin yayinevleri açık şekilde ve makalelerin bulunduğu sayfa aralkları belirtilmelidir.
- Latin harfleri dışındaki alfabelerle yazılmış makalelerde Latin harfleriyle yazılmış başlık, özet, anahtar kelimeler, ve kaynakçaya (referanslar) yer verilmelidir.

The Journal of Mesopotamian Studies

(JMS)

Publication Principles

The Journal of Mesopotamia Studies (JMS) is publication of The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. The JMS is a peer-reviewed journal which gives places to scientific researches on Kurdish, Arabic and Syriac culture, language and literature. It is published semi-annually (Winter and Summer Issues). The articles to be published should bear criteria of scientific researches, be innovative, and also should not be published anywhere else before. If an article has been presented in a scientific meeting, it will be accepted on the condition that it has not been published anywhere before.

The Evaluation of Articles

- Articles submitted for publication are firstly examined by editorial board in accordance with the publication principles of the journal. The endorsed ones are sent to two reviewers. The authors corrected the article according to the notes by reviewers; however they have right to object to the points where they do not agree with.
- Articles submitted for publication are sent to two experts of the field via method of "blind review" after they examined by Editorial Board. In the case of split in opinion of these two reviewers, the article is sent to another reviewer. The article is published if at least two reviewers express positive opinion. The reports by reviewers are sent to the authors to pronounce the evaluation result.
- If one or both reviewers express "it could be published after certain revisions", the article is sent to the author for the required revisions. After revisions are done, they are checked by reviewers or the Editorial Board to evaluate whether they are done in accordance with the remarks. Besides, the authors have right to object to the reviewers' opinions. The objections are evaluated and resulted by the editorial board.
- The articles that decided to be published are sent to the author in PDF formatted after page adjustment. The author makes the last reading and shows necessary revisions on the text and sends it back.
- The unpublished articles are not returned back to the rightful owner, furthermore the authors are responsible for the opinions of the articles.
- The journal does not demand any fees to publish their articles, and likewise does not pay any fees for publishing articles.
- The Editorial Board may make small adjustments those are not on the main stage.
- It is accepted that the copyright of the published articles are transferred to The Institute of Living Language of Mardin Artuklu University. This transfer includes virtual platforms.
- Article submission and evaluation process is conducted on Dergipark system.
- Before Evaluation process starts, the articles are analyzed via iThentica plagiarism program.

Language(s) of Publication

- The JMS gives places to articles in Turkish, Kurdish, Arabic, English and Syriac. However, it accepted as a principle that at least half of the studies in the journal should be in Kurdish and its various dialects. The articles sent to the journal must be free from all kinds of defects related to the use of academic language.

Writing Rules and Page Layout

- The articles must be written on MS Word or compatible programs. Times New Roman should be used as typeface. The articles should be written in 12 font size in 1.5 ink line

spacing and the pages should bear numbers. The articles should be maximum 9,000 words. The custom typefaces should not be used and if there are transcription signs, their documents should be sent with the article.

- The name, surname, title, place of work, ORCID number and e-mail address of the author(s) must be stated.
- The title of the article must be in accordance with the content and written in bold face, and also must not be longer than 15 words.
- There must be an abstract of maximum 150 to 200 words at the start of the article. For the articles written in languages other than Turkish, the abstract must be written both in the original language of the article and in English. The title of the article must be stated before the abstract as well. There must be maximum 4 to 6 key words that rank from general to specific at the bottom of the abstract..
- The title must be written in bold face. There should be intermediate titles in the long articles. It is recommended that the main titles numbered as 1., 2., and intermediate titles as 1.1, 1.2., 2.1., 2.2. All the main and intermediate titles (main sections, sources and appendices) should be written in bold face.
- Expressions highlighted in the text, must be «in quotes», bold or italic faces must not be used. There must not be double highlighting as «in quotes» and bold or italic.
- There must not be intents at the start of section and paragraphs.
- Illustrations, graphics, images and other materials those used in text must be in JPEG or GIF format. Visual material and attachments must be delivered also via e-mail if required.

References

- APA is accepted for citation and references.
- Methodical consistency is essential for writing the footnotes and sources. Names of long works (books, magazines, newspapers etc.) should be written in italic face, names of short works (articles, stories, poems and so on) «in quotes». Also, it is recommended that to use footnotes only for the additional information that cannot be given in the text.
- The compiler, translator, preparer for publication, editor must be shown in the tag if exist.
- In case of the citation of the text of electronic media, the name of author, title and date of publication which are specified are used. The date of access should also be noted in parentheses in catalog information.
- The secondary sources should be avoided if the primary resources are available.
- The works those have not been cited must not be shown in the sources.
- The sources should be given at the end of the text in alphabetical order. The publishing houses should be given clearly and the page ranges of the articles should be stated.
- Articles written in any alphabets other than Latin alphabet should include the title, abstract, keywords, and references written in Latin.

